



Weşana
ENSTÎTUYA KURDÎ YA
AMEDÊ
Kovara Dumehane
Hejmar - 23
Sermawez - Berfanbar 2008

Xwedî û Berpirsiyariya Nivîsaran:
Semra OZBEY

Editor:
Enise Şirin ÇAGER - Azad ZAL

Sererastkirin:
Semra OZBEY - Serwet DENİZ

Mizanpaj û Berg
Enstituya Kurdi ya Amedê

Wêneyê Berga Pêşin:
Mahmud Baksi

Wêneyê Berga Paşin:
Ahmet Bilge

Şewirmendê Hiqûqê:
Av. Muharrem Erbey

Çapxane:
Berdan Matbaası:
Davutpaşa Cd. Güven Sanayi Sitesi
C Blok No: 239 **Topkapı/İSTANBUL**
Tlf: 0 212 613 12 11

Navnîşan:
Kalem Sk. No: 32 Huzurevleri
Kayapınar/DIYARBAKIR

Tlf:
(0412) 237 43 16

E-Mail:
kovaraw@yahoo.com
kovarawe@hotmail.com

WEB:
www.kovaraw.com

Şertên Abonetiyê:
Nava Welat, salek: 25 YTL
Welatên Dereke, salek: 70 EURO

Banqe & Nimroya Hesabê:
Semra OZBEY
Türkiye İş Bankası 8300 Diyarbakir
YTL: 8300 195 27 89
EURO: 8300 071 16 47
USD: 8300 071 16 52

Nimroya Hesabê PTT'ê:
Semra Ozbey - 5426215

■ Nivîsên ku ji bo weşanê
ji kovarê re tên şandin,
li xwediyên wan nayên
vegerandin.

■ Her nivîskar ji nivîsa
xwe berpirsiyar e.

NAVEROK

■ Ji Edîtor.....	2
■ Çima felsefe / <i>Feratê DENGİZİ</i>	3
■ Di zemanekî de zemanekî dinê ye Marcel Proust / <i>Fewzî BÎLGE</i> ...	6
■ Zimanê bihuştê / <i>Jonathan CARROLL</i>	8
■ Qedexe qet naqedin / <i>Yilmaz GUNEY</i>	11
■ Hatûbatên sêdîlî / <i>Omer DILSOZ</i>	13
■ Çûyîn / <i>Dilawer ZERAQ</i>	15
■ Here / <i>Selmet GULER</i>	16
■ Çiroka te û wî / <i>Dilxwaz HERDEM</i>	17
■ Pênc kurteçîrok / <i>Evdile KOÇER</i>	18
■ Mirin / <i>Şevger ÇIYA</i>	19
■ Min nizanibû ku li vê dinyayê jî bihuşt heye / <i>Behlûl ZELAL</i>	23
■ Wextên xewneroj weşartî / <i>Şivan Ar.</i>	26
■ Şikefta Xwekuştinê / <i>Aram GERNAS</i>	27
■ Ferhenga koçeriyê - I - / <i>Bahadîn ROBAR</i>	30
■ Stevie Smith / <i>Kawa NEMIR</i>	67
■ Sibe... / <i>Arjen ARÎ</i>	73
■ Bilbil divê gulê / <i>Selahattîn ÇAM</i>	74
■ Nizanim çima / <i>Îlhamî Ozer</i>	75
■ Kêmbêr / <i>Gulizer</i>	76
■ Dayikên delal / <i>Sîpan Xîzan</i>	77
■ Çiroka gur û rovi / Berhevkar: Zozan BUDAK	78
■ Mehme Eliyê Bedlîsî û “Gulê Marûmê” / <i>Hilmî AKYOL</i>	47

Dosye:

Ji Kela Siphîyê heta Stockholmê Axîneke ji Kezebê:
Lawikê Xerzî Mahmut Baksi / 34

■ Mahmut Baksi: Nexşeya jiyana kurdewarî / <i>Salihê KEVIRBIRÎ</i>	36
■ Mahmut Baksi û sê romanên cuda / <i>Azad ZAL</i>	39
■ Du xalên giring: Klasik û nû û afirineriyêke çawa? / <i>Yaqob Tîlermenî</i>	45
■ Sohbetên dostaniyê û Mahmut Baksi / <i>Gabar Çiyan</i>	48
■ “Evîna welat di dilê min de ye” / <i>Hevpeyvîn: Gabar Çiyan</i>	51
■ Jiyana bi teqereq, mirinek e bédeng / <i>Helîm Yûsiv</i>	56
■ Me bi kûraniya evîna te zanibû... / <i>Kakşar Oremar</i>	57
■ Têkoşer, dildar û xebatkarekî azadiyê: M. Baksi / <i>A. Çeko Jiyan</i>	61
■ Axx! Axî û ax û ax / <i>Serwet DENİZ</i>	63
■ Pirtûkên Mahmut Baksi / <i>Kitêbxaneyê Kurdî</i>	65

Ji edîtor...

Xwendevanên hêja û delal,

Bi destpêka payîzê re wekî ku we şopand û bi baweriya me ku niha gelek ji we jî beşdar bûne; liv û tevgerên ji bo ziman wek pêlekê bi ser rojevê de girtin. Vê yekê dilê tevahiya kurdîhezan xweş kir û ew hêviya ku bi girtina qursan re şikestibû ji nû ve vejiya û baweriya bi TZP Kurdî geş û gurtir bû.

Gelî xwendevanan,

Ji bo gihîştina armancê û bidestxistina derfetên nû ji bo zimanê kurdî, xebatên berfirehtir û xurtir divên. Bêguman di vê pêvajoyê de bar dikeve ser milê her kurdîhezî/ê. Her yek ji me dikare tiştêkî bike. Kesekî/e ku bibêje *“tiştê ku ez bikim tune ye”* nîn e. Em hêvîdar in wê her kurdîhez bi vê berpirsiyariyê tevbigere û em ê di kar û barên xwe de pêşdetir herin...

Wekî her hejmarê me dîsa ji bo dosyeyeke bi mijareke taybet cih di navbera rûpelên Wyê de veqetand. Ji bo vê hejmarê dosyeya bi navê “Ji kela Siphîyê heta Stockholmê axîneke ji kezebê: Lawîkê Xerzî Mahmut Baksi” ji aliyê Enise Şîrîn Çager û Salihê Kevîrbirî ve hate amadekirin. Salihê KEVIRBIRÎ bi nivîsa xwe ya *“Mahmut Baksi: Nexşeya jiyana kurdewarî”*; Azad ZAL bi *“Mahmut Baksi û sê romanên cuda; ‘Hêlîn’, ‘Gundikê Dono’, ‘Serhildana Mala Eliyê Ünîs’*”; Yaqob TILERMENÎ bi *“Du xalên girîng: Klasîk û nû û afirîneriyêke çawa?”*; Gabar ÇIYAN bi nirxandin û hevpeyvîna xwe ya bi navê *“Evîna welat di dilê min de ye”* ya ku bi Mahmut Baksi re kiriye; Helim YÜSÛV bi *“Jiyana bi teqereq, mirinek e bêdeng”*; Kakşar OREMAR bi *“Me bi kûraniya evîna te zanibû...”*; Amed Çeko JÎYAN bi *“Têkoşer, dildar û xebatkarekî azadiyê: Mahmut Baksi”* û Serwet DENÎZ ji bi *“Axx! Axî û ax û ax”* li ser jiyana û berhemên Lawîkê Xerzî dîtî û nirxandinên xwe nivisandine. Hêviya me ew e ku salvegera dilovaniya jiyanez, rewşenbîr, romanûs, siyasatmedar û rojnamegerê me yê hêja Mahmut Baksi bibe bersîveke çanda xwedilêderketinê...

Ji derveyê dosyeyê nivîskar û helbestvanên me bi berhemên xwe yê giranbûha rûpelên kovara we xemilandine.

Xwendevanên hêja,

Di vê hejmarê de me rêbazeke nû pêk anî. Me ji bo helbestê wekî lijneya şêwrê 3 kesên nirxandêr diyar kir. Ji bo ku em zêdetir aliyê helbestê xurt bikin me helbestên ku ji bo kovarê hatibûn radestî lijneyê kir. Li gorî nirxandina lijneyê, me helbest hilbijartin û di vê hejmarê de ew weşandin. Bi vê rêbazê ew ê kovara me xurtir û dewlemendtir bibe. Me di vê hejmarê de dest pê kir; bi xêr em ê lijneyên bi vî rengî ji bo çîrok, pexşan û beşên din jî ava bikin û bi awayekî rûgeştir, baştir derên pêşberî xwendevanên xwe yê hêja û delal... Ji bo nirxandin û keda wan em ji rêzdar Arjen Arî, Omer Dilsoz û Mamoste Taqyedîn re sipasiyên xwe pêşkêş dikin.

Di hejmara pêşiya me de mijara doseya me **“Raz û sembolên wêjeya kurdî ya devkî û hişmendiya civakî”** ye. Em hêvîdar in ku kesên pêwendîdarê vê mijarê ew ê bi nirxandin, lêkolîn û pexşanên xwe piştgiriya bidin me.... Her wiha ji bo hejmarên din em dixwazin mijarên wek *“Mihriçanê herêmi yê kevneşopî”*, *“Feqiyê Teyran û wêjeya Kurdî”* bigirin dest. Ên ku xebatên wan hene û dixwazin bixebitin, berhemên xwe bi me re parve bikin em ê kêfxweş bibin. Ji bo kesên ku dinivîsin netengijîn û bi rihetî bixebitin wek daxuyaniyekê em ji niha ve kesên têkildar agahdar dikin.

Heta hejmareke din bimînin di xweşiyê de....

Çima felsefe

Feratê DENGİZÎ

Her çiqas felsefe tê wateya heskirina zanînê; tê wateya fêhmkirin, şirovekirin û naskirina cîhanê, ya afirînê, ya Xwezayê û heya bigihê ya gerdûnê jî.

Ku em têgiheke xwezayî yan jî civakî, yan jî diyardeyekê nas nekin, fêhm nekin nikarin di derheqê wê de bibin xwedî fikir û raman. Diyarkirin, naskirin jî tê wateya gava yekemîn a fêhmkirinê. Paşê em li ser civirîn, guherîn û herwiha li ser şêwe û domdariya wê difikirin.

A va ye felsefe bi wateya xwe ya fireh û temam, em dikarin bibêjin zanista pirsan, bersivan û lêgerîna bersivan e. Û bi pêş de em dikarin bifikirin ku felsefe zanista stratejîk û zanistên dinê jî zanistên takîkî ne. Yanî felsefe zanista zanistan e, maka zanistan e. Zanistên fenî; fîzîk, kîmya, zîndewerzanî (Biyolojî), matematîk, esmangerî (astronomî) û hw. yên şênberî û zanistên civakî beşên jêrî felsefeyê tene hesibandin. Ku mirov peresana (evrîm) ramanê, yanî gavên pêşve hatina ramanê dide ber çavan, mirov dibîne ku çawa ev zanist derketine holê. Fêhmkirin û têgihiştina bûyerekê (olgu) fêhmkirin û têgihiştina felsefeya wê ye. Ku felsefeya tişt, an jî bûyerê hate fêhmkirin tehlîl û dahûrandina wê her wiha fêhmkirina kîtekit û yekîniyên bin wê û têgihiştina wesleyên wê hêsan dibe û bingeha wê



xweş tê fêhmkirin û têgihiştin. Bêşik vê gavê û bi hêsanî mirovahî nehatiye vê rewşa fêhmkirin û têgihiştinê.

Me gotibû felsefe zanista pirsan e, zanista lêgerîna rastiyê ya rasteqînê ye. Em gavên fêhmkirina bûyerekê veçirinin, bi-vejenin. Bi mînakê ramandin belkî rihe-tir û hêsantir be. Mînak; em bixwazin ku em 'dewlet'ê fêhm bikin. Pêşiyê pênase divê. Pirsê pêşîn wê 'dewlet çi ye?' be. Bersiva pirsê "**ÇI? ÇI YE?**" pênase ye, yanî tarîf e. Bi vê re pênaseyên cur be cur dertên pêşiya me. Yan "Navgîna zordariya çinekê li ser a dinê" yan "Lihevrastrkirina mirêsdar a ku neteweyekê li ser lingan di-sekinîne" yan jî "Saziyeke civakî ya herî pêşketî ya jêner" û herwiha... Gelo kîjan ji van pênaseyan rast e? Ev pirs îcar pirsên "**ÇIMA? JI BO ÇI?**" bi xwe re tîne. Vê carê em dikevin pey sedeman, em dixwazin sedeman fêhm bikin. Û em berê xwe didin naveka têgihê, cewhera wê. vê têgihê fireh dike û pêşde em li bersiva "**ÇAWA?**" digerin. Dewleteke çawa? Dew-

leta herî qenc çawa ye? Ev pirs jî berê me didin şeweyê û em xwe di nav têkiliya şeweyê û navekê de dibînin. Em ê hewl bidin ku şeweyê fêhm bikin. Di nava berxwedana fêhmkirina bûyinê, bûyerê de gav bi gav em pêşde diherin. Dawiya dawîn em ê bibêjin wê dahatûya dewletê, pêşeroja wê çawa be? **WÊ ÇI BIBE?** Gava sêwirandina dahatûyê û gava pêşveçûnê ya gihandinê dertê pêşberî me. Bi bersiva, wê dahatûya dewletê çî bibe, çawa bibe fêhmkirina tevayê têgihê, têgihîştin di ramana me de têdigihê.

Bi kinayî em dikarin vê bibêjin: Fêhmkirina bûyerekê bi çar gavan e,

Pênase; bi bersiva pirsê ÇI?

Sedem û herwiha navek; bi bersiva ÇIMA? JI BO ÇI?

Şeweyê; bi bersiva ÇAWA?

Pêkhatin, pêşveçûn, sêwirîn û dahatû; bi bersiva “WÊ ÇI BIBE?” dertên holê û bûyer tê fêhmkirin. Hilbet divê ev bersiv li gorî şert û mercan, tîr û tije û li gorî zanistê bin û mirov tîr bikin. Ev li gorî rewşa mirovan jî diguhere û dibe ku şaş û lawaz be jî, lêgerîn û şeweya têrbûna mirovî esas e. Dema ku em vê li têgih(bûyer)a dewletê bar bikin; em digihên têgiheke rasteqînî ya şênber û civakî.

Em ê bibînin ku bersiv dikeve warê zanista civakî û her wiha em ê bigihên rastiyeke şênber a berfireh ku civaknasî û dîrok jî bi bersiva vê pirsê re mijûl bûye. Fêhmkirin û pêşveçûna gav bi gav û jî hêsanî ber bi dijiyarîyê ve dike ku mirov têgihên herî dijiwar, tîkel û tevlihev jî fêr bibe. Bûyera ‘gelo kîjan bersiv rast e’ jî berê mirov dide rêbaza ramana felsefî. Yeke dinê jî, rêbaza; çavdêrî, ceribandîn, sepaandin û peyitandin jî zanîn û têgihîştina me xurt dike û ku divêti hebe encama ku mirov gihaştîyê divenêrîne û bi ducariyan mirov rastiyeke zelaltir dibîne. Bi minakan jî mirov piştgiyîyê dide zanîn û zanînen xwe.

Hînbûn, hayîdarbûn û bîrbirin mirov dixwe nava hilberînê û mirov xwe û zanînen tim û tim jî nûv de û dîsa jî nûv de ber bi hilberînê û stewandinê, kemilandinê ve dibe. Nexasim ruhê vekolînî û lêgerînî, şika zanistî û miraş di warê zanînen de mirov dewlemend dike, dike xwedî tecrûbe. Mînak; wexta ku mirovan “genim” nas kirin, dîtî ku jî bo gihaştina wî av, ax û hewa divêti e, her wiha tov jî... Hîni şeweya wî, xweseriya wî û her wiha hîni girêdana di nav şeweyê û xweseriya wî de bûn. Wek ku ‘xwe’ya wî ‘xwê’ya wî fêhm kirin. Ji bo ku jî nûv de genim hilberînin ax û hewa her tim hebû, amade bû lê av mesele bû, pîrsgirêka avê hebû. Ava jî bo genim li ser barîna baranê bû û ev jî ne bi pergala bû, dima li ser lêhatinê, ketberê. Wê wextê jî bo vê bala xwe dan çem, robar û şetan. Ji bo ku fêdê jî vê avê bibînin û genim û her wiha zad av bidin berê wan ket bendavan; sikir, cuh, cuhok, miskar, xet ketin rojeva wan. Êdî pergala avdanê motaciyeke sereke bû û mirovan ev çêkirin. Vêna bi xwe re cotkarî û her wiha zanebûna di derheqê zad de anî. Van zanehiyan pêşveçûna endezyariyê, ya pîvanê, ya matematîkê, ya fîzîkê, ya kîmyayê û ya zîndewerzaniyê û hwd. derxist holê. Ev rewşa hilberîn, pêşveçûn û gi-handinê bû.

Pîrs û lêgerîna bersivên pîrsan bi xwe re pêşveçûnên derasayî anîne. Bûyerên şênber afirandine. Raman jî razberiyê daxistine şênberiyê. Ev jî bi mirov dide fêhmkirin ku em motacî felsefeyê ne.

Ku mirov berê xwe dide zanînen, miraqa hînbûnê ev jî bi xwe re pêşveçûna zanistî derdixe holê. Wexta ku bûyerek tê fêhmkirin û mirov ku dixwaze wê jî nûv de hilberîne, pêk bîne mirov jî bînesaziya wê dest pê dike û pêvajoya vê hilberînê wiha dest pê dike. Bêşik di civakê de, di zanistê de rewşa van bûyeran cuda cuda ye û girêdayî hebûn, pêşveçûn û guherîna pîrsînî (evrîm) ye, “ducarbûn” na lê jî nûv de pêkhatin çêdibe. Careke din ku em berê xwe bidin minakekê; em li rewşa ‘dîms’ê

binêrin. Pênasiya wê, şêwe û xweseriya wê, çekirina wê, xebitîna wê û di her dahatûyê de ji nûv de hilberîna wê wek ku me berê jî diyar kiribû; girêdayî van sefheyên

-Çi ye?

- Sedemên çêbûna wê **çi** ne?

- Tişteki **çawa** ye?

- Ji nûv de mirov dikare hilberîna yan na? Ramanêke giştî û beşên wê tîne holê.

Binyata kîmyewî ya dimsê çi ye, ji çi çêdibe berê mirov dide tirî. Ku mirov berê xwe bide binyata tirî îcar mirov li xuyanga wî, li guherîna wî yanî li tevger û binyata wî ya fîzîkî dikole. Ev me dibe ber deriyê dendîka tirî û serê giloka pirsan vedibe û em û mîw, dêlî, xerzik, rez, hilberîna tirî û veguherîna wî rû bi rû dimînin. Îcar li vira zanistiya zîndewerzanî dikeve dewreyê. Û axa ku ji tirî re qenc e û avhewa erdnîgariyê, ji kengî ve tê hilberandin ji dîrokê ber bi mirov ve tîne. Û zanînen din yên kenarî lêkolînê fireh dikin. Xuya dibe ku pîrseke li ser tişteki û bersiva wê ya bi zaneyî çawa lêkolîn û lêgerîneke berfireh û zanayiyên kûr derdixe holê. Di vê wateyê de zanistiya pîrsiyarî; felsefe maka zanistan e. Belkî tiştên felsefîk danayên qada kardarî û di pêşî de weke ku pîroleyî ne û ramana razberî ne jî lê rastî ne wiha ye. Zanistên pesandani yên kardarî (pratîkî) şênberkirina felsefeyê bixwe ne.

Di encamê de em tîne ser vê bûyerê; darring (made) û hişmendiya ku wê fêhm bike; yanî raman, fikir... Raman, bi her awayê xwe yê geşbûyî bi mirov re heye, di mejiyê wî de. Mirov, yekane heyîn e ku di

hişmendiya hebûnê û herhebûnê de ye, yekane candarê ku vê fêhm dike ye. Civîrîn û geşbûna wî ya peresînî jî mijareke din e.

Dema ku bi mirov re raman pêş ve çû û cîhan şirove kir û pê ve pîrsa wê/wî ya pêşîn ev bû; cîhan (dinya) çi ye? Ji aliyê kê ve, çima û çawa hatiye afirandin? Xweseriya, 'xwê-xwe'ya pêkhatina wê çi ye? Dinya ji kîjan madeyê pêk hatiye? Ev pîrsa felsefeyê ya pêşîn e û bersiva vê jî; dualiya made-ruh, hebûn-raman, xwezahişmendî aniye rojevê. Zanyarên xwezayê pêşiyê bi vê pîrsê re lebikîne. Hêzên xwezayê; sêr, efsûn, mît, ol û her wiha zanistî wiha za, peresî, pêş ve çû û geş bû.

Nexwe, çima felsefe?

Bersiva vê pîrsê fêhmkirin û şirovekirina cîhanê, ya gerdûnê û hebûnê ye. Danyê pêşîn made ye yan ruh? An jî tişteki dinê heye gelo? Bersiva vê pîrsê jî feraseta me ya felsefî, felsefeya ku em pê bawer in a ku em tîgihiştina xwe li ser ava dîkin datîne holê. Hilbet her tişt berfireh e.

Her wiha, gelo kîjan felsefe rast e? Divê em li ser vê pîrsê hûr bibin. Herê, kîjan felsefe? Afirînkariya kî ye, çi ye?

Her çiqas tîkel û tevlihev xweya be jî felsefe zaneyîyeke rojane û zaneyîyeke jiyaniye, "Heskirina ji zanîne" ye.

(Pûşper 1999)

Berhemeke hunerî bi qasî ku dema tê de afirîye vedibêje, kêma zêde divê hinekî xwe jî vebêje. Di berhemekê de ya dike ku hunermend di mijara xwe de vegotîneke nuh bibîne yek jê jî netêrbûn e. Gava

Di zemanekî de zemanekî dinê ye Marcel Proust

Fewzi BÎLGE

hunermendek xwe tenê berbisyarê mijarekê vebêje bidîtaya wê demê wê gelek berhem ji vegotinên ansîklopedîkî nebihuriyana. Di afirandina berhemekê de divê pisîkolojiya wê dema tê de ye hebe. Berhemên ku afirîne li gor wê pisîkolojiyê formên cuda distînin.

Ger mirov ji wan demên civakê yên cuda mînakê bide, li gor pênasa wê demê şeweyek jî bi form dibe. Lê gava ku di şeweyekê de em rastî berhemekê ku ji derveyî wê dema tê de afiriye rast werin, wê demê ew berhem misyoneke din hildigire. Ji vê mînakê qest M. Proust e. (Berhema M. Proust a “Li dû zemanekî wenda” ye.) Ev roman xwe bi qasî ji dema xwe xurt kiriye ewqas jî ji demên berî xwe sûd wergirtiye.

Di hunerê de bi saya vegotinên cuda, mijarek ji teref hunermendên cuda, cuda ve hatine vegotin. Ev vegotinên cuda bûne sedema afirandinên hunerî yên cuda û vê guhertinê jî kiriye ku xwîner, guhdarvan an jî bîner aciz nebin. Ji ber vê jî ihtîmala berhemekê hunerî bişibe yeka din bi qasî ihtîmala mirovan ku yekeyek bişibin hevdu ye. Ev jî dibe sedema ku huner; bi têgiha bêdawîbûnê re hevta bibe.

Guhertinên civakî yên mezin her dem bûne sedema guhertinên hunerî yên

mezin jî û huner çiqas nêzî siruştê xuya bibe jî, dijberê wê guhertinên xwe yên herî mezin jî li hember siruştê kar kiriye.

Gelek hunermendî bi gelek celebên cuda “dar” ji xwe re kirine mijar. Lê bi çî şeweyê hatibe vegotin –wênanandin an şayeskirin- a girîng ew diisa dar e. Ew dar jî sînore darekê dernakeve û diisa weke darekê hatiye binavkirin.

Berovajiyê vê mînakê forma darê; ger îcar gindorek mînak bê dayîn, wê çaxê dijberbûna hunerê ya li hember siruştê wê çêtir were fahmkirin. “Gindor” formeke ku guhertinên mezin ranake ye. Ger zêde deforme bibe wê jî gindorbûnê de bikeve. Gindor jî ber forma xwe ya girover bûye gindor, ger gindorek çarqozî bibe wê bibe tiştêkî din. Ango ew êdî ne gindor e. Li ser pratîkirina jiyanê jî ji xwe ez bawer nakim ku tu kes xwe li tiştêkî werê rakişîne. Lê di dewsa gindoran (tekêl) dikare bask werin bikaranîn. Bask bo jiyanê mirovan rihetir bike ji xwe ketiye nava jiyanê mirovan, lê tekêlên çarqozî wê jiyanê çar qat zehmetir bikin.

Di wêjeyê de vegotin jî tiştêkî weke vê mînakê ye. Ango kî dikare bêje vegotin an jî şayesên M. Proust weke yên Î. S. Turgenyev in. Heger me di şûna vê mînakê de otoportreyên Albrecht Durer û yên Wan Gogh bida ber hev wê cudabûna wan pir êşkere xuya bibûya û ji xwe ev ne tiştêkî ji derveyî diyalektîkê ye. Lê mînakê M. Proust û Turgenyev ji derveyî vê diyalektîkê dimînin.

Şayesên M. Proust mirov dibêje qey ji zemanekî din şemitîne vî zemanî. Mirov dibêje qey bizaveke kevn, xwe di bizaveka nuh de vejandiye. -Ji xwe ger hunermendek girîngiyê bide bîr, nava xwe û siruştê mirov bi hêsanî dikare wî/ê kesî/ê weke romantîkekî/ê bihesibîne.- Di zemanê me de mirov ji berhemekê nûjen hêvî nake ku şayes ew qas pir û dirêj bin. Mirovên di zemanê me de dijîn bi saya M. Proust dîtine ku di berhemekê nûjen de şayes ew qas pir hatine bikaranîn.

Berhema M. Proust a “Li dû zemanekî wenda” mirov dibêje qey ji zemanekî din şemitiye zemanê me. -An jî di zemanekî de zemanekî dinê ye.-

Di vegotinên de şayesên ew qasa dirêj bikaranîna M. Proust rîskek e. Proust ev rîsk daye ber çavê xwe ango xwe rîske kiriye û bi ser jî ketiye.

Proust berhema xwe çiqas baş hûna be jî, ji ber taybetmendiyên dema me rexnegir, nivîskar an jî şopgerên hunerê ne tê de dibe ku kes tehemulî xwendina berhemên wî neke. Ji ber wê jî mirov dikare bêje M. Proust nivîskarekî entelektuelan e.

Proust di berhema xwe de ji bilî başdanîna şayes, tevn, mijar û di mijarê de jî sosyolojî, aboriya civakê û hwd. Huner bi xwe jî di hundirê civakê de pir baş mehandiye.

Berî M. Proust gelek nivîskarên baş him yên nûjen him jî yên klasîk di berhemên xwe de huner weke sembolan bi kar anîne ku yek ji wan jî Oscar Wilde ye.

Di berhema Oscar Wilde ya bi navê “Portreya Dorian Grey” de mirovek şanoger yek jî wênesaz heye û di vê berhemê de bi xêra van qarekteran huner simbolîze bûye. Lê di berhema M. Proust de ji bilî qarekterê ku dixwaze bibe nivîskar huner di nava civakê de jî pir baş bi cih kiriye. Ev jî têgiha hunerê ji taybetmendiya kesekî derdixe dixe nava taybetmendiyan civakekê.

Di berhemên M. Proust de şayes girîng û balkêş in. Proust şayesên xwe ew qas vezelandiye tu nemaye mijar wenda bibe, an jî mirov dikare bêje mijar di siya şayesên wî de mane. Lê dîsa jî mijar hejar nebûye.

M. Proust di vegotinên xwe de bûyerên piçûk bi bûyerên pir mezintir re hevta kiriye û werê daniye ber hevdu: “...traje-



diyên li dawîka (paşxaneyê) mutbexa navmaliya wan Françoise tê jiyîn û şah û şahbanûyên di ser vitrayên dêran ku henûn, melûl melûl destên xwe danîne ser hevdu ku piştî dema xedariyên wan, xwînrijiyên wan her ku dîrok tê lêkolîn kirin eşkere dibe...” Bi vê rêgezê qewimînên mezin jî bi haweyekî hêsan ji xwendevan re vedibêje.

Ji bilî van hêlên berhema Proust mirov dikare bêje romana wî nivîbiyografîkê jî. Ev hêla wê jî kiriye ku Proust ji bilî civak, zeman û hunerê xwe jî di nav de vebêje.

(07.10.2008)

Dema wî ew dît dest bi bazdanê kir. Mecbûr bû. Dibe ku hûn rûyekî wisa di emrê xwe de du caran bibînin. Heke hûn li pey nekevin, hûn bêgav dimînin. Bêgav dimînin ku di derengiya şevê de di neynikekê de bi meraqa gelo ew jin dê jineke çawa bûya, li xwe mêze bikin. Gelo

Zimanê bihuştê

Jonathan CARROLL



wê çi biqewimiya ku ez bi têra xwe wêrek bûma ku xwe bidim nasîn? Dibe ku ew li min bibîşiriya û bi vexwarina qehweyekê razî bibûya. Belkî birastî jî mîna ku xuya dikir, ew yeke ecêb bû. Belkî yeke sar bû. Belkî yeke germik bû. Belkî *her tiştê di jiyana min de* kêliya ku me hev û din dît biguheriya û ez ê îro bi kilometreyan dûrî vir, li cihekî baştir ku ez nikarim xeyal jî bikim, bûma.

Lê piraniya mêran ji ber ku jin wan ditirsînin nadin pey. Tu tişt qasî jinên xwedî awirên tûj mêrekî natirsîne. Ew dizane ku ew hewceyî wî rûyî bibe, ew ê her tiştî bike, wê dayika xwe jî bide ber ar. Bi rastî jin hê jî baweriya xwe pê naynin an jî fêm nakin ku kî dibe ew dizane, ew dikarin mêrekî bêzar û zirav bikin û wî bi awayekî xedar felc bihêlin. Carinan ew yek digihîje radeya dînitîyê jî. Bi rastî, jin dikarin bi nêrînekê mêrekî bi her tiştî wî ve serobino bikin.

Ettrich cara ewil ji bo kar li Warşowayê bû. Warşowa baş bû. Polonya baş bû. Wî hez ji kelecana û coşa poliyana dikir; rewşa wan ku ji bo tiştên dixwastin ji dil û can dixebitîn, hez dikir. Lê tiştê ku wî herî zêde hez dikir jî jin bûn. Jinên polî pir

spehî bûn û Vincent Ettrich mêrekî bextewar bû dema ku jin li dora wî hebûn.

Lê wê ji bîr bikin. Ji bilî kêliya ku ew nêzî Holiday Innê ji bo guherîna çiraya trafikê disekinî, her tiştî jî bîr bikin. Wî bê hemdê xwe li tramwaya diborî, mêze kir û wî ew li rûniştoka kêleka şivakê dît. Çavên wan qasî çend çirkeyan li hev nêrîn û piştê ew çû. Ez dê wexta xwe bi danasîna wê tune nebin hûn wê jixwe dizanin. Ew pêleke medûcezîrî bû ku Ettrich jixwe dide ber xwe dema ku rûyê wê bi tevahî li mêjiyê wî hatibû bicihkirin. Xêra Xwedê ku ew tenê bû. Dê çiqas şerm bûya ku yek li ba yekî navsal û kincên xweş lixwekirî bûya dema ku wî li pey tramwayekê baz bida û kincên xwe ji ser xwe bikirina. Ettrichê hîn jî serxwe, dîlkêş û zehf daxwazkar berî demeke kurt ji jinekê re gotibû ku tercîhkirina navbera mêrekî ciwan û wî de weke tercîhkirina navbera repbûniyeke qasî çar saetan û sohbetêke xweş qasî çar saetan piştî bahevketinekê ye.

Heta ku tramway li rawesteka din sekinî, hindik mabû ku Ladasên lezgîn du caran li Ettrich biqelibin û

helkehelkeke xedar pê ketibû. Lê tramway disekinî, ew bi qîreqîrekê disekinî û her wiha ew dê bigihîsta tramwayê.

Carekê jî ew nefikirî ka dema ew gihîşt wê derê wî yê çî bigota. An jî nefikirî ka dema ew gihîşt dê çî bibe. Dema wê bi çavên gumanbar li min nihêrî, wê bi meraq bipirse, “Gelo ew mêrikê bi helkehelkê ketî û li ser min mîna çûkeke mezin û xwedayî xuya dike çî quzilqurtê dike?”

Û ez zimanê polî nizamim. Piraniya mirovên vir îngilîzî nizanin, ji lew re ew jî belkî nizane. Bêyî ku peyvan bizanibim ez ê çawa bêjim ku di tevahiya jiyana xwe de ez li wê digeriyam û min ew jî heta berî penc deqeyan nizanibû? Ez ê çawa ji wê re her tiştî bibêjim wexta ku ez ê nikaribim tu tiştî jê re bibêjim? Rûyê meriv zimanzanekî gelek xirab e. Di bişîrînekê de çend peyv hene? Her wiha, bişîrînên rast û derew hene. Hinek ji we re derî vedikin, hinek jî nakin. Hûn çî dikin dema pêdiviya we bi zimanê bihuştê dibe lê hemû tiştên we dest û çavên we ne?

Nikaribû xema wê jî bike. Derî vebûn. Meriv hilkişîn û dakişîn. Dema ku ji pêlikan hilkişî ji nişka ve hate bîrê ku bilêta wî tune bû. Bilêt tune bû, ziman tune bû û tew nizanibû wê çawa bikira? Lê rûyekî weke yê wê hêjayî her alozî û şermîniyê ye. Tenê ber bi wê ve bimeşe û dia bike ku Xwedê bi te re be. Ber bi wê ve bimeşe û...

Ew ber bi wê ve meşiya. Zimanê wî di devê wî de gihîşt mezinahiya kundirekî. Destên wî bi ser kulemekan ve hişk dihatin guvaştin. Wê di şivakê re li derve dinêrî. Tenê piştî demeke ku bi wî qasî sed salan hat wê serê xwe yê zor ciwan bi aliyê wî ve zivirand.

“Bibexşîne- lê-divê-ez-bi-we-re-bi-axi-vim!” Wî weke her geştyarê amerîkî xeletiya ku ew dibên qey heke tu hêdika û

bi dengekî berz îngilîzî biaxivî hemû biyanî dikarin tiştê tu dibêjî fêm bikin, kir. Lê awirên çavên wê digotin ku ew xelet e. Çavên wê yên xweşik û bi kûrahiya deh mîlan qasî yên qumqumokekê bê eleqe bûn. Ew qet bi wî re ne eleqedar bû; bi tu awayî û tu rojan.

Loma wî zimanê almanî yê nebaş û bi xirecir ceriband, “Min tu li vir di tramwayê de dîtibûyî.... imm...” Nêrînên wê sar bûn. Jina hêjayî emrekî niha weke lekeyeke teze li ser kinckî nû li wî mêze dikir. Hêvîşkestî, wî ji bo ku tişteki bike serê xwe diêşand, ji bo ku bibêje, diviya wî xwe bigihanda wê. Lê tu tişt nehat bîra wî. Dilşikestî, dema jinik axivî hindik mabû ku ew rûyê xwe heta bi hetayê jê bizivirîne.

Bi dengekî ku tu mêran nikaribû ji bîr bike, bi îngilîziyeke tekûz a britanî wê got, “tu çima ketî şopa min Vincent? Têkilî bi dawî bû. Heta ku hiş ji serê min çû, em li ser vê yekê axivîn. Te tercîha xwe kir û ez jî pê razî me. Bes, berde ez niha biçim! Bi vî awayî dawiyê lê neyne.” Bişîrîna wê tijî ew qas hestiyarî û dilşikestinî bû ku wî got qey wê pê bihele.

Wî çavên xwe qirpandin û awirên tûj berdanê. “Em, ihh, hev û din nas dikin?”

Wê jî awirên xwe tûj kirin. “Erê, em hev û din nas dikin! Em bi hev re kêm zêde bi qasî sê salan jiyân!”

Ettrich zewicî bû û li Seattle dijiya. Bîst sal bi heman jin, sê zarok û kûçikekî re. Ew qet bi tu kesên din re nejiyabû.

“Navê... Navê te çî ye?”

Wey, Kêfa wê bi vê nehat! Rûyê wê ji kulmekê hişkî ketibû hev. Wê çavên xwe kurkusandin heta ku hema hema hatine girtin. Dema ew axivî dengê wê bû pêtiavêja hêrs û keserê. “Pir kenawer e, Vincent! Tu dipeyî ku ez bikenim? Tu dixwazî min bêhtir biêşînî? Niha jî em mîna ku hev û din nas nakin tevdigerin? Ew bi vî awayî tê kirin? Ez nizamim ji ber

ku yê dil kir ku berde tu bûyî!" Bi rabûna ser piyan, ew xwedî bejn û baleke bedew bû; ew her tiştê ku heta niha wî xeyal kiribû. "Ma divê mîna ku ez der heqê Kitty û Seattle û Audiya te ya sor de tiştêkî nizanim tevbigirim? Hê? Divê ez wekî birêz Ettrich gazî te bikim? Divê ez mîna ku nizanim tu dema hevşabûnê de lêvên xwe gez dikî û carinan nikarî rêk û pêk bêhna xwe hilgiri, tevbigirim? Lê tansiyona te ya zêde? Tansiyona te herî dawî çi bû ew ji tê bîra min, Vincent. Ew 180/90 bû, ne wisa? Ji ber ku min ji te pir *hez kir* ew tişt tên bîra min. Lê tu evîna min naxwazî. Tu wê jiyana mîrat a li Seattlê ku tê de Kitty û trembêla te ya sor hene, dixwazî. Ma tansiyona te ne 180/90 bû?"

Erê! Ew tişt gişt rast bûn! Ettrich gavek bi şûnde avêt ji ber ku ew mat û metel mabû û ji ber ku pêdiviya wî bi mesafeyê di navbera xwe û xwedawendê de hebû. Ew bi xwe bawer bû ku berî niha wî ew tu caran nedîtibû. Lê nexwe ew çawa Kitty, Audiya wî û tansiyona wî ya zêde dizane? Ew çawa tiştên wiha hûrik û şexsî dizane? Çawa dizane ku ew lêvên xwe gez dike?

Derî hate girtin û tramwayê dişa dest bi çûnê kir. Ev giş di du deqeyan de pêk hatibûn. Mirovan zîq lê dinêriyan. Niha ew li vir heta rawesteka din ketibû dafika wê.

"Tu çawa van tiştan dizanî?"

Bi hêrseke têr û tijî serê xwe hejand. Ew tiştêkî xweşik bû. "Ez çawa dizanim? Çimkî, qasî sê salan her ku tu hatî Warşowayê, tu li ba min mayî. Em mîna ku hevserên rast bûn tevgeriyan. Lê ez êdî nikarim wisa tevbigirim, Vincent! Ez

jiyanekê dixwazim lê tu yê wê nedî min. Lewre divê ez li ba yekî din li wê bigirim."

Wî êdî nikaribû tehemûlî vê rewşê bike. "*Lê berî niha ez tu caran li te rast nehatime!*"

Lêvên wê yên mezin û nermik rakêşin û dişa nerm bûn. Ji bo ku tiştêkî bêje li dora xwe mêze kir û sekinî. Bi awayekî ku tu kesî nikaribû bibîne nêzikî wî bû û destên xwe xistin nava lingên wî. "Ez ji nîşana te ya biçûk a zayînê ku li vir jêr e, hez dikim. Min ew her tim weke raza me dît. Ez dê bêriya wê bikim."

Tramway hêdî bû û di dawiyê de jî sekinî. Ew dûrî wî ket. "Ji kerema xwe min tenê bihêle, Vincent. Qet nebe tu ji bo vê deyndarê min î."

Wî ,bêdeng, daketina wê ji pêlikên tîk ên metal temaşe kir; ew bêtî ku carekê bi şûnde binêre bi lez meşî û bi dûr ket. Devê wî vekirî ma. Wî ferq kir ku ji destavêtina wê repbûniyek lê çêbûye. Berjêr mêze kir û derbarê nîşana zayînê de fikirî. Wê tim ew dabû fedikirin. Wî zûka berjor mêze kir. Wê çawa ew dizanibû?

Wê qapûtekî keskeşin li xwe kiribû. Dema ew di avahiyeke ku wî berî wê çaxê qet nedîtibû de winda bû, qapûtê wê, bedena wê cara dawîn bi ber çavên wî ket.

(Wergera ji Îngilizî: DiYaKo)

knowtake@gmail.com

Bê çavên min dibiriqandin. Dest û rûyê min di nav tozê de bûn. Min dixwest ku biçim îstasyonê. Min xwe avêt baxçeyê li pişt Barê Kurtuluşê. Bê kedî bû. Çêre heta çokê dirêj bûbû. Pelên hişk ên çamê li ser porê min diketin. Rûniştim. Bê

Qedexe qet naqedin

Yilmaz GUNAY

hemû hêviyên min ji min biribûn.

Baweriyên min ne wekî berê ne. Ev neh meh e ez bêkar im. Ji ber tiştêkî vala ji kar hatibûm avêtin.

-Hey! Got yekî. Ketina vir qedexe ye.

Ez li deng vegeyriyam. Ji bo diltengiya xwe bavêjim min bi qirîn got:

-Ji bo çi qedexe ye.

Dengê mêrik sist bû, çikiya.

-Ez ji ku zanim, got bi tirsonekî.

Dûre du sê caran li derdora xwe nêrî. Axîn kişand. Bêhn veda. Serê xwe bi ber xwe ve tewand. Şalê xwe danî ser çoka xwe. Dest bi dirûtina cihên qetiyayî kir. Dilê min pê êşiya. Min ji xwe şerm kir, ji ber xwe ve got;

-Pûşt! Sûcê vî mêrikî çi ye?

Min perçeyek pelê çamê xiste ber diranê xwe. Rabûm û min li mêrikî nêrî. Bi rî bû. Min got;

-Li qisûrê nenêre xalo. Bîskeke berê min dengê xwe ji te re bilind kir.

Bi nêrîneke cuda li rûyê min mêze kir. Ez biçûk xistim. Bijangên wî ketibûn, çavên xwe kuskusandin.

- Ji min re gotin, qedexe ye lawê min.

Ez jî ji bo ziktêrkirinê dixebitim.

Di nava min de kelecaneke peyda bû. Cîgerên min cihên xwe diguhertin. Ez jê pê ve li wir nesekinîm. Ev qedexe dê qet xilas nebin. Li pişt qedexeyan dê mêrikek bikeniya û em ê di nav van qedexeyan de biheliyana û biçûna. Hezkirina min qedexe... Axaftina min qedexe... Nivîsandina min qedexe... Emrê me teva dê wiha biçûya. Qedexe dê qet xilas nebin. Min dest bi gezkirina pêçikên xwe kir. Bi xwê bûn. Min dev ji pêçikan berda.

Ez ê bigiriyama. Min bi xwe ji xwe şerm dikir. Di nav jiyanêke bêtêrî de min hemû rêyên xwe winda kirine. Tu tiştê min ê ku xwe bispêrimê tune ne. Diviyabû min tiştê di dilê xwe bisekinanda. Pêdiviya min bi şewqekê hebû ku nêrînen min ên di tarîtiyê de asêbûyî bîn ronîkirin. Li vî welatî tiştekekî wiha nayê firotin ku tu herî bistînî. Ji bo ku jana hundirê xwe ji bir bikim fikra jêkirina guhên xwe li min peyda bû. Ji nişka ve min destê xwe avête berîka xwe û kêrek derxist. Min ew bire guhê xwe, pê ve çewisand. Serê min zong da. Cîgerên min hatine cihên xwe yên berê. Dûre di guhên min de germahiyek... Serê min kete aliyê guhê min ê jêkirî. Xwîn jê dihat. Min got;

-Xwîn.

Zipîsor. Çawa be bav û kalên me bi xwînê ev ax av dane. Bila hinek jî xwîna min biherike ser axê. Ji patika min germahiyek hate jêr. Min navê evîna xwe li ser axê bi xwînê nivîsand. Dûre ez fikirim ku ev bi min re li hev jî nake. Lê ez jî navê wê dinivîsim. Ger bidîta dê bikeniya. Ji nişka ve min piyê xwe tevlî xwînê kir, erd paqij kir. Min li deriyê malekê da. Jinikek derket û got;

-Way be, tu çi digerî li vir?

Bi nêrîneke nod dereceyî (zîq) li min nêrî, piştê derî li rûyê min girt. Xwînê pîl-pîlok boyax kiribû. Derî dîsa vebû. Jinikê got:

-Xwîn!

Min got:

-Tu dikarî hinek potik bidî min? Binêre ez ji serî ve aşiqê te bûm.

Wekî ku tif bike li rûyê min nêrî. Derî vekir. Got:

-Hadê here. Potik tune ye.

Min kir ku bikenim. Min destê xwe avête terhiya porê wê. Serê wê hejiya. Porê wê belawela bû. Min got:

-Ez dikarim te bikujim.

Rengê wê guherî. Ez keniam. Ji tirsonekiya wê re keniam. Ez kêfxweş bûm ku ne tirsonek im. Jinikê li xwîna li ser pîlpîlokan mêze kir.

Guhên min bi terhiya wê pêçayî bû. Her kesên ku diçûn û dihatin lê mêze dikirin. Terhî zipîsor bûbû. Mirovên ku min ji bo wan mirin dabû ber çavên xwe alîkarî bi min nedikirin. Min xwe avêt yeke-min otobêsê. Bêhna benzîne dihat. Ji her tiştê vî bajarî bêhneke cihê tê. Ez ê vereşiyama. Lê belê vereşîn di otobêsê de qedexeyê ye. Ez li tiştên ku bê qedexeyê karibim bikim, fikirîm. Lê min lê nêrî dawîya her tiştî li qedexeyê dertê. Qedexeyê qet xilas nebin. Bi hezaran mirov ji bo qedexeyên ku bo çî ne, nizanin dê bimirin. Piştî miriyan jî dê bêjin leheng in. Her qedexeyê lehengekî/ê biafiranda. Min xwe ji otobêsê avêt û min dest bi bazdanê kir. Dema gihîştim pira kevir helkehelk bi min ketibû. Min li ezman nêrî. Jiyîn tişteki xweş bû, lê belê ji dêvla ku mirov di nav van qedexeyan de bijî azadî baştir e. Ez vegeyriyam li min mirovan temaşe kir. Karên xwe yên her roj dikirin.

Min got:

-Hey!. Ez ê xwe bavaêjim avê.

Bazdan. Gotin:

-Bi masîkî xwe bavêjeç

Min çakêt ji xwe kir. Min da yekî, stand, li çakêt nêrî û keniya. Gomlek jî yekî dîtir stend. Dor hatibû derpî.

Min got:

- Ha ji te re. Bila ev jî yê te be.

Mêrik bi delalî li rûyê min nêrî û got:

-Derpiyê min heye. Bide yên ku derpiyên wan tune ye.

Yekî destê xwe dirêj kir. Got:

-Bide min. Derpiyê min tune ye.

Min ew dayê. Min careke din li dar û ezmanan nêrî. Jiyîn delal bû.

-Jiyîn..

Cara ewil e ez ji jiyanê hez dikim. Vegeyriyam. Min kincên xwe xwest. Wekî ku min bixwin li çavê min nêrîn, gotin:

- Te neda!

Û kenian. Wiha çipûtazî min nedikarî biçûma derekî. Dikarin mirov daleqînin. Herî baş serê pirê... Derketim ser pirê. Min li avê nêrî. Û min xwe berda.

-Her bijî, bravo!...

Gotin.

(Wergera ji tirkî: Ferzan Şer)

Têbînî :

(*) **Yilmaz Guney**, *Yeni Ufuklar*, 1956, Stenbol.

Êvareke westiyayî kirasê xwe pêçabû ser jîngehê. Hûnebayê payîzê hûno hûno li perdeyên tenik ên ber pencereyê dixist. Li ser kursiyekî çermexezal î gewr lawikê reşesmer rûniştibû. Pala xwe vedabû û berê wî li ser lempaya odê lê çavên wî girtî

Hatûbatên sêdilî

Omer DILSOZ

bûn.

Kûr û dûr diponijî.

Destê xwe avête ber bivêla xwe, bêhna wî li nav milan dida. Serê xwe tam dabû paniya kursiyê ya nerm, destekî xwe dabû ber guhê xwe û yê dîtir berdabû ser tenîştê kursiyê.

Dûr û dirêj di geştê xeyalan de dihat û diçû.

“Ez” got berî bêhnvedaneke kûr, “Ax ez! Erê, ez li kê dera jiyane me” berdewam kir û kulma xwe guvaşt û hilmeke kûr ji kezêba xwe berda.

“Ez!”

Pirsa xwe dubare kir, “Li kê dera jiyane me?” Mijlankên xwe piçekî livandin, lê çavên xwe venekirin, pêla hizran bi ser de hate xwarê; “Na na, diviya ez her tiştî ji hev safî bikim” bir di dilê xwe de xweziyeke dîtir û dewam kir, “Ez! Erê erê ez! Di kîjan pêlekana jiyane de me?”

Ofîneke kûr bêhemdê wî ji ber ve çû, “Ez. Kursiyê çermexezalî... Ez, of dayê, xwezî ber piyê te bama vê gavê, di umrê zaroktiyê de li ber piyê te!”

“Ez” got piştî axîneke dirêj û dîsa tiliya xwe ya şadê da ber difna xwe, bi tiliya beranî ve çena xwe çend caran xurand, “Ez” got û dewam kir, “Di jiyaneke çawa de me?”

Anî bîra xwe jiyana jê hatî; riyeke dirêj, serhatiyeke di navbera jiyanan de... Bîskeke fikirî, “Salên borî” got, “Par û pêrarên ku wekî xewnekê di hişê min de mayî...” Piştî li xwe vegeriya, “Ev çendek



e ez tenê li dora pîrsekê tîm û diçim” got û piştî di tunela hizran re xwe berda xwarê û çû û çû dem û dewranên jiyana xwe...

....Tenê berî bi çend salan bû: Ew, li bajarekî dûr î cihê niha lê ye, di maleke qelebalix de dijiya. 12 xwişk û bira... Maleke qelebalix, sifreyeke qelebalix, odeyeke nivistinê ya qelebalix, axaftineke qelebalix... lê di nav ev çend qelebalixan de kurikekî reşesmer ê mit û bédeng... Li paş jiyanan dûvkêş, li nav rûdanan paşkêş, li nav xiyalan rakêş... Xiyalên qelebalix li serê wî govendê digerin.

Xelekek bi wêdetir; kurikê reşesmer ji qelebalixekê diçe qelebalixekê dîtir. Li kargehekê; ew ji xwe re navekî di lê dîkin, xelk bi navekî di wan dinase, dewlet bi navekî dîtir; qelebalixa navan... Gava jê dipirsin, “Tu çi karî dikî?” dimîne dimîne, xwî dide xwî dide, dike nake nizane bi kîjan navî bibêje, tenê xwe dispêre bédengiyê qelebalix û bédeng bédeng dikeve nav pêla xewn û xeyalan...

Çend qonaxan bi wêdetir; xelekek di diale bi jiyana lawikê reşesmer: Li mal-

bateke qelebalix, têkiliyên berz û xanedanî bi ser jiyana wî de tî. Ji qelebalixa malbatekê ber bi qelebalixa malbateke dî... Li vî welatê ku bav bi kurî napirse, lawikê reşesmer ji qelebalixekê ber bi ya dî ve diçe...

Dihizire:

....Ez li kê dera vê jiyane me?

“Ez!” got û bêhnekê li dor vê pirsê geriya, “Erê ez... Na na, ez li vê derê me, li ser kursiyê çermexezalî palvedayî me, erê erê... lê ez dixwazim li kê derê bim?”

Gotineke Nietzsche hate bîrê, “Tu ji ‘ez’ê kevintir e, ji ber hindê jî her ez pal dide ‘tu’yekê û bi wê hebûna xwe diselimîne” keniya, devê xwe gezekê vekir, tîqotîq keniya, got, “Gelo ma hewce ye, ez jî pala xwe bidime ‘tu’yekê?”

“Tu” anî bîra xwe; jî ‘tu’yê gelek hizr di mejiyê wî de hatin û çûn.

Hizirî:

....Di nava babelîska qelebalixan de bêndereke تنها û aram, tu... Kesê berê ‘ez’ê lê ye, an jî, palgeha ‘ez’ê... Pala wî li kursiya çermexezalî bû, li ser çermê xezalê fikirî, xezal û tu, çerm û tu, qelebalix û tu, ba û bahozen jiyane û tu; xelekên sêgoşeyî û tu... Li vir tu, li wir tu; li nav qelebalixan tu, li ser kursiya çermexezalî tu... Tu jî ‘ez’ê gelekî bi dûrtir bû!

“Ez!” got û piçekî çavekî xwe vekir, tîşka lempeyê çavên wî hingaftin, “Eh tu jî tîşk!” got di dilê xwe de û piştî nefeseke kûr jî cergê xwe berda dîsa xwe qulipande çala hizran:

...Li destpêka xwe fikirî. Destpêka wî destpêka fampêkirina wî ya jiyane bû, bê

pêşiya wê? Li pêşiyên fikirî; pêşiya berî fampêkirinê. Pirs lê bûne qelebalix, li wan fikirî; li mala gundî, li mala niha tê de, li malên ku gelek caran tê de bûye... Ewle, piştgermî û pal...ve...dan! Û di nava ewende qelebalixan de sîtavekê ew ber bi xwe ve dikêşa: Tu.

Got, “Belkî Nietzsche neheq be, belkî jî ‘ez’ jî ‘tu’yê kevintir be. Ka min pala xwe nedaye çu ‘tu’yan; aha pala min li kursiyê çermexezalî ye!”

Piştî, hizrên xwe dan ser hev... Piçekî pala xwe ji kursî sist kir, destê xwe avête eniya xwe, ew xurand, dûre dîsa cihê piştî xwe xweş kir, kûr xwe berda ber pêla hizran:

“Ez!” got, “Li çermê xezalekê palvedayî me. Di xaniyekî hem biyanî hem jî xweyanî de” û berdewam kir, “Ez karekî dikim, lê ez bi wî karî ranabim. Ez di kargehekê de dixebitim lê karê min nîn e, zikê min pê tîr nabe; keda min tê xwarin. Ez palê pûşî me... Ez, li xaniyekî dimînim lê xaniyê min nîn e, kirêdar im, deyndar û çavliiriya xwedanê mal im. Ez jî jiyane hatime lê min çu tîşt jî xwe re li wir nehiştiye... Ez li ser çermê xezalê palvedayî me... Xezaaalll hayê!”

Serê xwe rakir. Çavên xwe rast kutane lempeyê.

“Ez li ber lempeyê me” got, “Ka mêvan li ku man?!”

Di nava çîrokên jiyana nîvçemayî de bi awayekî zarokane digevizî. Bûyer û qewimînan wisan ecêb û jî nişkê ve rû didan ku car caran nedizanî bê çî bikira, bi çî rengî tev bigeriya. Ezmûndariya ku heta niha jî jiyane girtibû, pîrî caran bi kêrî tu tîstekî nehatibû... An jî ew wisan pê dihişiya. Carinan digot qey dinya bi ser serê wî de tê

Çûyîn

Dilawer ZERAQ

xwarê.

Wexta ku lê qewimî;

Di ber xwe de got: “Divê tu hîn bibî... Her çendî banekî haveyna jiyanê bin jî divê tu hîn bibî, bibanî; da ku di nava rasteqîniyên ku li dora te çeper girtine de nefetisî. Divê tu wan bi dilekî zarokane wekî lilikekê hem-bêz bikî... Gava ku jiyanê te ji rê û rêçika xwe avarê bû, êdî tu mirî yî!.. Dibe ku hin kes hebin –belkî jî gelek kes- ku nexwazin bibin kesên bijarte. Mirov bi duristiyeke kawikane nabe kesê bijarte. Ma ne wisan e, nepeniyeye xweser û taybet divê jê re... Dibe ku ew roj qet û qet neyê. Lê ku ew roj hat, wê rasteqînî wisan li rastê û beloq bimîne... Wê têra xwe bandorê li te bike û tevgerên te tê de asê bimînin. Wê hingê divê tu bi dilsozî tevbigêrî. Bi dilsoziya ku tirs ji ber deriyê dilê xwe qewitandiyê.”

Bi peyva tirsê cefilîneke sivik ket nav canê wî û pê re jî dengê nerm ku ji kaniyê hestên rengsor diza, xwe li guhên wî ferz kir:

De ka ji xwe re hinekî bifikire;

Te kîngê olana dilînên xwe bihîst?

Hee..! De ka bêje!

Wekî cara dawîn kîngê vê olanê zimînî ji guhên te bir? Defa sînga te ku her tim bi kutana gopala hestên coş nepixîbû, bi şûjîna evînê hate teqandin û dilê te yî jar û reben wisan li rastê bê kes û kûs ma.

Zelalî û deqerûtiya te tu sêwî hiştî.

De êdî bes e loo!!.

De êdî bes e dilol!

De wer neke!

Bi gotinê min bike!



Ta bi derziyê ve neke!

Ta bi derziyê ve...

Ta bi der...

Ta bi...

Ta...

Ta qetiya!

Tayê xav... Tayê ku xwe pê ve girê dabû û pê ji fetisîna di nava zeryaya jiyanê de xelas bûbû.

Hemû tiştên ku dizanibû yek bi yek ew terk kirin. Her ku serî li qonaxeke din da tiştin di serê wî de kêmbûn. Li hev gêjomêjo bû. Di riya ku lê digeriya de winda bûbû. Demekê wekî mirîşka gêj li dora xwe çû û hat. Piştî hêz û taqeta xwe ya dawîn da ser hev; çavên xwe girtin, valahiya di hundirê xwe de pêkhatî pîva, hemû banekiyên jiyanê bi tena serê xwe hişt û... wekî serberdayiyekî rêwindakirî da rê û... Çû!

Çima dîsa tu bêdeng î delala min? Ne ji bona vê bêdengbûna te ye ji nişka ve em bi hev ketibûn lê, paşê te lêborîna xwe ji min xwest û careke din em nêzî hev bûbûn û em li hev hatibûn. Lê dîsa te sedema bêdengiya xwe, ya ku te weke beleka çavên xwe beleka ku te ji nenasan vedişart, te ji min veşartibû. Û îro dîsa tu

Here

Selmet GULER

bêdeng î çavbeleka min.

Tu di bêjî ez ê herim lê, bi gava pêşîn re
tu di keribî, hîn piştî te neketiye min av
ji çavên te di herike. Lê dîsa tu xwe pişt-
dayî min dikî û diçî.

Gelî-rêçên tenêtiyê çendî dirêj in, tu
dizanî?

Tu dizanî xofa kûrnewalên bêdengiyê,
Û dirêjahiya şevên tenêtiyê,
şevên tenêtiya min,
şevên tenêtiya xwe,

Û roj-şevên tenêtiya min ên bêtî te û
yên te yî bêtî min.

Berî ku tu dûr bikevî divê tu li xwe
mîkur werî û tu pirtûka bêdengiya dilê
xwe ji min re vekî.

Tu disekinî û yekawir tu li reşikên
çavên min dinihêrî lê, tu neaxivîyî. Lê
belê, peyvawirên te yê mîna gavên te ji
hêzketî ji reşikên çavên min reşikên ku
hê ji niha de bêriya te dikin û li dû gavên
te yê ku te ji min dûr dikin, bi awayekî
stûxwar û xemgîr dibêjin “ez ne bêdeng
im lê, der û dorên te û yê min, min bê-
deng dikin û min ji te dûr dikin, lê belê,
tenê gewdê min ji te dûr dikin”

Ax delalê, tu xweş dibêji lê belê,
awirbersivên te dîsa tenêtiya min naber-
sivînin û kaniya rondikên min naseki-
nînin.

Dema tu diçî ez ji te dûr dikevim. Xelet
fam neke, tenê ez ji wekî te ji dengê te û



ji beleka çavên te yê xezalî dûr dikevim.
Lê tu bi xwe bêhtir nêzikî min dibî. Na, na
tu nêzikî min nabî tu tevli min dibî û wekî
karaxezaleke terqavî çargavî tu di rêçikên
xwîngerên giyanê min re dibezî. Lewra,
rûyê te roj bi roj di çavên gakoviyê giyanê
min î navaseran de ji heyveke çardehşevî
ya ku nû hiltê xweşiktir dibe. Demên te ji
sêva li darê sortir, lêvên te ji peliyên gula
gulşîre pembetir û narîntir dibin. Singên
te yê binkiras wekî du şemamokên bi-
harî di lemên çavên min de belektir û
bejna te wekî şiveke darbiyên mêrg-
rastegehên zozanî yê ber av û ber kanî
bi min dirêjtir dixuyê.

Lewra, mafê te heye ku tu nêzî min
nebî û tu xwe li ber çavên min piçûk
piçûka min lê, mezina xeyalên min, kiras-
nîgaşa giyanê min, spîpîvoka xeyalên
min.

Here şarkeskê, xeftansorê here, here
çavxazalê, kezîzerê here, here xirxalzîvê,
xizênzêrê here, here û heta ku tu dikarî

ji min dûr bikeve. Lê dema tu çuyî li du xwe nenihêre, da ku tu neaxivî û tu li ber çavên min reş nebî, da tu negirî û tu li ber çavên min piçûk nebî, da tu ne bişirî û tu li ber çavên min sivik nebî.

Gava tu çuyî bila şev be da ez te nebînim, bila bager be da ez te nebihîzîm, rê û şivilên xwe ji min veşêre da ez te neşopînim torinê, şevçira çav û gavên nîgaşên min ên şevînê.

Here, here û xwe di şevkirasê roniya gerdûna çavên min de veşêre, da bikaribim te di çavên mêjiyê xwe de hilînim. Here, here da bikaribim nîgardi-menên te li şevên xwe yên zivistanî û xwe jî li reşê keziyên te yên şevistanî bikim mêvan, mazûn-mêvana min, hevalveşardoka hilka xewn û maçên canê min.

Here, here da bikaribim nîgaşdîmenên te di deydika di lê xwe de bihejînim û bi lorînên evînî te ji xwe re kedî bikim û tenêtiya xwe di xeyalên te de bihedînînim.

Here, here da ku wekî sofîyekî berdergeh an jî wekî mirîdekî şêxê terîqê şev û roj te zikir bikim û wekî mezinbûna Xwedan te di xwe de mezin bikim, delala min, şevbihara giyanê min, kiraspîvoka nîgarên min.

Here, da ku laşê te nekeve ber awir-ramanên tîrên çavên min. Here, here da ku jîniya te nekeve xefika avgeriya mêraniya giyanê min. Here, here da ku rojekê ez karibim li ser dawa te bejna xwe bitewînim û nimêjan ji te re bibexşînim xeydoka min, roniya awirnîgarên tîrên çavên min here...

(Tebax 2008)

PÊL

Bi dilekî tirsonekî û bi gotinên stûxwar ve min jê re got, "Em niha li ser pêlekê ne, ev pêl an dê me bigihîne peravê jiyanekê an jî peravê mirinekê..."

Çîroka te û wî

Dilxwaz HERDEM

Tu

Xwe wek baranê dibînî

Û her xwezayê ji bo barînê cih dihesibînî

Ew

Ji heriyê xanişokan çêdike

Bo ku vegere zaroktiyê

Û te ji bîr bike

Tu

Aşînayê porên rengereng î

Kulîlka bihara dereng î

Ew

Miriyê biska reş e

Kêliyê ji demsalên borî ye

Tu

Babelîsk î

Di xerabûna demsalan de dileyîzî

Lê ew

Şevba ye

Evîndarê hênikahiya qedîm e

Tu

Pelekî sivik î

Bi her bayî re dileyîzî

Lê ew

Bi tenê, dilek şevînî ye...

Pênc Kurteçîrok: pêl, dest, dîn, ziman, qêrîn

Evdile KOÇER



“Ez bi vê razî me...” got, lê te digot qey gotinên din wekî hêşiran ji çavên wê diherikîn, “Lê ez ditirsim ku ev pêl me ji hev veqetîne, berê te bide ser peravekê yê min peraveke din...”

DEST

Di guhê wê de min kir pistepist, “Dema ku tu destê min digirî ez jê ditirsim, ez dibêjim qey bi tilikên xwe tu rûpelên ruhê min diqulipînî û bi dizîka dixwînî...”

Delalîkê, maçeke xemrevîn danî ser tili-kên min, “Lê dema ku tu destê min digirî, ez dibêjim qey tu gotinên dilê min didizî û di guhê min de dikî pistepist...”

DÎN

Ez ji nizamim ji bo çî, lê hema ji nişka ve ji min re got, “Ez ji xwe re li dînekî digirim...”

Min wiha lê vegerand, “Dîne ku tu lê digirî, ez bawer nakim ku tu yê peyda bikî, ya baş ew e ku tu ji xwe re dînekî biafrînî û dûre jê bawer bikî...”

ZIMAN

Kezînekurê hiş ji serê min biriye. Lê wê rojê wekî xerîbekê wiha got, “Ez dixwazim fêrî zimanê çavê te bibim...”

Min hingê dixwest bigiriyama, bi dilekî xemgîn min wiha lê vegerand, “Baş e, lê bi şertê ku tu jî zimanê çavê xwe fêrî min bikî...”

QÊRÎN

Xwezî ku min bikariya delaliya wê bikira qêrînek û bi şev nivê şevê bi ser bajêr de biqêriyama.

Min wê rojê xwe ranegirt û jê re got; “Gelo tu dikarî delaliya xwe bi ser min de biqîrî...”

Got, “Xwezîm... Lê ez nizamim biqîrim...”

Ez bimirama lawo! Ez biçûma wê gora tarî lawo! Ez bibûma mêvanê axa sar lawo! Ew gule li min biketa lawo! Ez bibûma xwediyê darbestê lawo! Ez bibûma xwediyê serê pelçiqî, laşê şewitî, dest û piyê jêkirî lawooo! Ax li min porkurê! Oy rebî zarokên min pêşiya min mirin. Yek ji

Mirin

Şevger ÇIYA

wan, bi panzerê ve giredayî kaş kirin heta ku mir, yek ji wan jî niha.... Dibêjin, dest û piyên wî jêkirine, laşê wî dane ber qa-setoran, çavên wî derxistine. Piştî ku wan ew kuştiye wiha kirine, wax li min, ez di dewsa te de bûma lawo! Bila dest û piyên min jêkirina, bila postê min bigurana, bila di şûna te de laşê min bişewitandina lawo! Bila ez bimirama di dewsa Zinarê xwe de, bila rebê alemê ruhê min bistenda. Hawar, li min hezar hawar! Min porkurê, min feqîrê, min belengazê, min ûcaxkorê, min hejarê, min bêbextê, min bêsiûd û bêşensê! Wan zaliman, wan bêbavan, wan hov û dirindeyan, wan ez kuştim di vê şeva mibarek de, îşev ez mirim, ew darbesta Zinar nîn e, ew darbesta min e. Ew gora Zinar nîn e, ew gora min e. Hey hawar, hawar! Rebî tu îşev rihê min bistînî, tu îşev şevê li min nekî roj, tu min bigihînî kurên min, tu min bibî ber Zinar û Mihemedê min. Bila ez carek tenê rûyê wan bibînim û bila qet... Xwedêyo ez îşev mirim, tu jî ruhê min bistîne, tu jî wî emanetê xwe bistîne bila tamam bibe! Ey hawar û hezar hawar! Min got neçe lawo, min got rêça kekê xwe neşopîne, min got tu tenê mayî ji me re, min got bila zarokên xelkê jî biçin, min got qey welatê me tenê ye, min got tu li kevir bilikumî kezeba min dipêrite, min got ez muhtacê te me! Min got ez û bavê te êdî pîr in. Min got bila dilê te bi me bişewite. Te ez guhdarî nekirim, te xebera min nekir. Tu çûyî, bi çûyîna xwe te ez kuştim. Dibêjin ew û du hevalên xwe bi hev re mirine. Ez qurbana te û hevalên te bimir lawo! Ez qurbana çeka destê te, şal û şapikê te bimir lawo. Ez qurbana porê te, çavê te, lêvên te, mijang û birûyê te, destê te, lingê te bimir lawo! Ez goriya te me

lawoo! Ez bimirama lawo!

Di vê navberê de Sofî Xelo ket hundir. Yekser çû ber Xalê Riza ango bavê Zinar, got "Xwedê wan bi rehma xwe şa bike. Cihê wan li bihuşta xwe çêke. Ew zarokên vê axê bûn û cihê şehîdan her dem bihuşt e. Li ber nekevin." Xalê Riza bi rûyê qurmiçokî, çav mişt bi rondik, kumê xwe ji serê xwe rakir, serê xwe xurand got "ez çi bikim emrê Xwedê ye. Qey qedera wan tamam bûbû. Bila termê wî wiha perçe nekirina bila qetûqet... Termê wî perçe wesle" gotin di gewriya wî de asê ma, rondik ji çavên wî yên henûn bariyan, qidûmên wî şikestin, ji laşê wî xwêdaneke sar herikî, destên wî bûn weke cemedê û lêvên wî lerizîn bû îskeîska wî giriya.

Sofî Xelo xwediyê marketa mezin, hemû mesrefên şînê girtibû ser milê xwe lewre Sofî Xelo doza mezinatîyê dikir. Di marketa xwe de piranî gundiyên xwe dida xebitandin. Ji xelkê kêmtir nebûya zêdetir ji nebû heqdestên karkeran û bi ser de jî mineta xwe dikir. Wexta yekî/ê bigota "Sofî wele ji te nebûya dê ev zarok hemû şerpeze bibûna, Xwedê ji te razî be, wele tu bavîtiyê dikî ji wan re. Divê ew jî şikir bikin, qedr û qîmeta te zanibin." Devê Sofî Xelo diçû pişt guhên wî. Wî jî her dem heman bersiv dida "Rebê alemê dide min, ez jî didim wan. Divê her kes ji Xwedê re dia bike, şikir bike. Ez jî weke her kesî evdekî Xwedê me." Ji bo Sofî Xelo şîn û şahî nêçîrên zêrîn bûn. Her çiqas di dayîna heqdestan de çikûs be jî di şîn û şahîyan de destvekirî bû. Lewre zanibû cihê mezinatîyê şîn û şahî ne. Her tim alikariya xwediyê şîn û şahîyan dikir, wexta diçû şîn û şahîyan jî her kes ji ber radibû piyan, ev yek pir pê xweş dihat, lê qet nîşan nedida. Ev qedr û qîmet ji bo xwe asayî didît û weke ku ev yek jî pê re hatiye dinyayê ango perçeyekî wî ye tu car nedi-bişirî ne jî ji yên piyan re digot aciz nebin, rûnên.

Weke piraniya gundiyên wan bavê Zinar jî li ber marketa wî dixebitî. Bi şev

natoriya marketê dikir. Du pisxaltiyên Zinar jî li heman marketê dixebitîn. Wexta bihîstin ku laşê Zinar dane ber qasetoreyan, çavên wî derxistine, guh, poz û tiliyên wî jê kirine dawîya dawîn jî wan ew şewitandîye her duyan jî berê xwe dan çiyê. Wexta ev her du ciwan winda bûn, hê kesî jî wan salix negirtibû lê xelkê texmîn dikir ku çûne, Sofî Xelo mirûzê xwe tîrş kir. Xwe di nava xwe de bihecand. Sofî Xelo dizanibû heke dewlet pê bihese ku du xebatkarên wî çûne çiyê û bavê Zinar jî li cem dixebite û mesrefên şîna Zinar jî wî kiriye dê tu car eman nedana pê. Her ku diçû ramanên wî kûr dibûn, xeyal û kabûsên cur be cur hişê wî dagir dikirin. Karibû bibêje Xalê Riza gundiye min e, ji ber vê yekê li cem min dixebite û dîsa karibû bibêje di hemû şînan de alîkariyê dike bêtî ku ferqê bike navê. Lê ew her duyên çûyî heke ew bihatina girtin û bigotina em li ber marketê dixebitîyan û Sofî Xelo jî gundiye me ye. Wê çaxê dê polêsan bavêta ser marketê û wexta polêsan avêt ser marketekê êdî tu kar bi wê marketê nabe ango market dimire. Bi van ramanan diricîfî, xwêdaneke sar dida, dilê wî bi gulpegulp lê dixist, mûyên canê wî gij dibûn. Di ber xwe de digot “hela ji xwe re li cewrikên dêlikê binêrin. Ax! Ax! Ez çima başiyê bikim, wan bigirim kar ew çima wiha min bavêjin xetereyê. Ez ew qas li wan difikirim, mezinatiya wan dikim dawîya dawîn ew xirabiyê bi min dikin. Hela ji xwe re lê binêrin, yên ku nikarin koxekê ava bikin çawa bi hêsanî qesran hildiweşînin. Van cewrikên dêlikan, qene mirov ji kar derdikeve dora xwe paqij dike, zirarê nade yên mayî û hê diçe. Diçin û çi gûyî dixwin tu dibêjî qey. Nikarin termên xwe jî rakîn, şîna xwe deynin. Kurmanc wihan in, bê aqil in. Zirarperest in. De herin, de gûyê xwe bikin nava vê marketê xirab bikin ez nizanîm dê çi bikeve destê we.”

Deh roj di ser çûyîna her du birayan de derbas bûbû wexta Sofî Xelo weke her caran ji malê derket di devê wî de cixa-

reya wî, çavên wî ji ber tîrejên rojê kurkûsandî, destekî wî di berika wî de, bi xwe ewle derdiket. Fikara her du birayan ji ser xwe avêtibû, her tiştî weke berê dewam dikir. Wexta gihîşt ber marketê hîn bû ku du polês hatine li wî pîrisîne û gotine gava hat bila bê midûriyeta ewlehiyê û qomiserê navê wî Fûat e bibîne. Sofî Xelo bi hînbûna vê xeberê madê xwe tîrş kir, zer û ziwa bû, ofîniyeke ji kezebê kişand, hezar fikir û ramanê êrîşî hişê wî kirin, ji bégavî berê xwe da midûriyetê lê bi zorê bi rê ve diçû, dest û piyên wî dile-rizîyan, dengê wî kelogirî bûbû.

Piştî çûyîna midûriyetê Sofî Xelo bi qasî du sê rojan her tim diponijî, bi fikir bû, cixare li ser cixarê pê dixist, bi kesî re xeber nedida. Nas û dostên wî wexta bigotina “Sofî xêr e? Polêsan ji te re gotin çi? Çima wisa bédeng bûyî? Qey tişteke qewimî?” Sofî Xelo yekser digot “na heyran dê çi bibel! Polês dikarin ji min re bibêjin çi! Meseleyeke danûstendîne bû, me safî kir”. Rojekê dîsa berêvarê wexta Sofî Xelo xwe dabû bin siya dara ber marketê, di esra teng de midûrê ewlekariyê hat, li cem Sofî Xelo rûnişt û wî û Sofî Xelo xeber dan, hema bi qasî pênc deqîqeyan axaftîne dewam kir û midûr rabû çû. Sofî Xelo wê êvarê beriya ku marketê bigire di nav xeberan de got “hela li wî kurê kûçikê binêrin, hatiye dibêje ji polêsan re erzaniyê çêke lewre polês ji bo ewlehiya we dixebitîn. Min jî got heqdestên xwe distînin, ev heqdestên wan jî ji bacên me tînin dayîn. Îcar em çima careke din erzaniyê çêkin? Heke tu lê binêrî ez jî xizmeta gel dikim bila ji min re jî tomerîfiroş erzaniyê çêkin. Tişteki wisa dibe. Min ew teqizand û çû”. Peyva teqizandinê zêde bû lê ji ber ku her kes fortê xwe dike ev yek jî bû forteke Sofî Xelo ango tu bal nekişand. Di vî welatî de kî çawa dikare polesekî biteqizîne? Sofî Xelo wexta peyvên xwe qedandin kenek hat ket ser rûyê wî, cixareyek pê xist, derbeke wisa li cixareyê xist heke ziman bi cixareyê biketa dê bigota; bêmirad ka ne ya te ye kadîn jî ne ya te ye?



Piştî wê rojê Sofî Xelo dîsa bû Sofî Xeloyê berê, dîsa li ber deriyê marketê bû qare-qara wî, cixareya wî di kêleka devê wî de, bi xwe ewle weke ku nivê dinyayê yê wî ye, her du telefonên wî yên destan di destekî wî de, berêvarê li bin dara ber marketê dîsa digot “di vê dinyayê de qencî pere nake. Êdî ne ji bo riza Xwedê be ez ê tu caran qenciye nekim, çi ji min re qurban çi ji min re! Tu vî milletî bidî piştî xwe bigerînî wexta tu wan deynî dibêjin hey piştî te bişikiya! Te çima em danîn? Bi Xwedê ne kêr ne zêde wiha ye. Ka xelk jî wiha ye, na bi Xwedê xeynî kurdan kes wiha nîn e. Ka tirk wihan in? Tirk jî hev hez dikan, qîmetê didin mezinan, yek qenciye jî wan re bike jî bîr nakin, dizanin mezin çi ye, biçûk çi ye. Lê kurd, her dem çavnebarî, çavsorî, dexesî, xirabî, xeynî van yekan tiştek li cem me tune.” Kesên ku li dora wî kom dibûn digotin “herê wele tu heta mala Xwedê heqdar î”.

Bajar êdî ketibû serberjêra payizê, bi şev êdî sar bû, Xalê Riza êdî bi saqo dihat ber marketê. Roj kin bûbûn, şev jî dirêj

bûbûn, meha Remezanê hemû karker tevî Xalê Riza şerpeze bûbûn lewre market heta paşivan vekirî bû, ne roj ne jî şev kifş bû. Hemû karkeran roj dijmartin, her roja çûyî ew ber bi serkeftinê ve dibirin. Xeynî du xebatkaran ên din dev ji rojiyê berdabûn, yek ji wan Xalê Riza bû, her çiqas hemû xebatkaran digot “xalo bi Quran îsal rojî nayê kişandin û di ser de jî tu pîr î. Dê tu nexweş bikevî, dev jê berde. Ne roja me ne şeva me kifş e. Çawa tu debar dikî” Xalê Riza digot “nayê bîra min ku min rojiya xwe şikandiye, di eskeriyê de tenê min digirt, heke qumandar hîn bibûya dê ez bikuştima lê dîsa jî min digirt. Serê sibê min xurîniya xwe bêyî ku haya kesî jê çêbibe dida hevalê xwe û êvaran jî di pêşiya fitariyê de şîv didan. Bi pîranî heta fitar dibû, jî şîvê jî min re tiştek nedima. Axir ku bajariyekî min hebû li aşxaneyê wî car caran jî min re şîv peyda dikir. Lê dîsa jî min dev jê berneda. Min temam girt. Ez ê îsal jî bigirim. Ka çi ma pîr çû hindik ma”.

Di bîstê roja rojiyê de, nêzî nivroyê Xalê

Riza hat ber marketê yekser çû ber Sofî Xelo, Sofî Xelo dişa hinek mirov li dora xwe kom kiribûn, bê navber xeber dida. Li rûyê Xalê Riza dilşabûneke nedîtî hebû, ji çavên wî çîrûskên şabûnê dipekiyan, dev bi ken, bangî Sofî Xelo kir; "Sofî hela xêra xwe tu dikarî kêlikekê bi vir ve bêtî?" Sofî Xelo bi mirûzekî tîrş xebera xwe birand, rabû ber bi Xalê Riza ve çû. "Xêr e, çi bû?" "Sofî ez tiştêkî ji te re bibêjim, lê sond bixwe ku dê ji tu kesî re nebêjî." Sofî Xelo got "temam bibêje" "Na divê tu bi serê Resulê Ekrem sond bixwî" Sofî Xelo bi dengêkî tengizandî got "Riza, tu jî dizanî sondxwarin guneh e. Tu çima vê roja pîroz gunehan li me dibarîni?" Lê Xalê Riza ji ya xwe daneket xwarê "Wele divê tu sond bixwî, divê tu bi serê Resulê Ekrem sond bixwî." Ji bégaviyê Sofî Xelo got "bila, bi serê Resulê Ekrem ez sond dixwim ku ez dê ji yekî/ê re nebêjim" Xalê Riza bi dengêkî nizm ku bi zorê deng diçû Sofî Xelo got "Sofî xeber hat dibêjin Zinar şehîd neketiye, Zinar dijî. Zinarê min nemiriye sofî. Yê ku me şîna wî kir, me ew kir binê axê ne Zinarê min bûye sofî! Do hatin gotin em ê sibê we bibin cem Zinar. Îşev dê me bibin cem Zinarê min. Min got ez bêm xebera te pê xim ku ez îşev nayê. Ez bi qurbana te bim tu jî devê xwe neşiqitîni. Diya wî jî îşev ji binî ve raneketiye. Heta serê sibê di nav malê de geriyaye. Îşev şev çi dijwar bû sofî, kêlik bûbû saet. Wa qediya îşev pişt fitariyê dê me bibin ba Zinarê min." Sofî Xelo got "çavê te ronî Riza. Ez pir bextewar bûm. Te got dê piştî fitarê hûnê biçin?" "bi Xwedê, negotin di kîjan saetê de lê ez texmîn dikim piştî fitarê em ê biçin." Sofî Xelo got "baş e. Silavên min lê bike, ez çavên wî radimûsim." "Ser serê min, ew jî destê te radimûse sofî. Ez îro nayê ha!"

Nîvê şevê di xaniyekî yekqat de, li ser mînderan sê bedenên bextewar, jinikê destê lawik hişk girtiye, rondikan dibarîne, ji rondikan nikare xeber bide, destê ku hişk girtiye car caran maçî dike. Tenê dibêje lawo û lawooo! Lawikê ciwan rextê

wî li ber, li ser çavê wî kenekî xweştam, serê jinikê dike hembêza xwe, ew jî tenê dibêje "bes e dayê. Bes e ez heyran." Diya wî di wê navberê de dibêje "ez heyrana te, ez qurbana axa binê sola te, ez qurbana cilên te, ez qurbana çeka te, ez qurbana dengê te, ez qurbana bîna te, ez qurbana her du çavên te" bavê lawik li aliyê din rûniştiye wî jî destê din ê lawikê girtiye. Yekser li rûyê lawik mêze dike. Ne deng dike ne dizane çi diqewime, tenê nêrîn têra wî dikan. Wexta lawik dibêje "bavo ka ji min re qala şîna min bikin" "lawo bi xêra Xwedê wa tu li vir î. Şîna çi?" destê lawikê ku girtiye dijidîne. Nikare rondikên xwe bigire, rondikên wî jî diherikin. Dibe îskeîska wî digirî. Di hemû jiyana xwe de mirov du caran bigirî, her du caran jî ji bo kurê xwe, ev e rewşa mêrik. Di wê kêlikê de dengêk ji derve tê "teslîm bibin. Dora we hatiye dorpeçkirin." Bêtî ku destûra teslîmbûnê bidin, deng bi çekên giran dikeve.

Roja din di hemû nûçeyan de heman tişt; "do êvarê yek jê jin sê terorîst hatin kuştin, yên ku reviyarên tîn teqibkirin."

Hefteyek paşê wexta Sofî Xelo û mîdûrê ewlehiyê di navrojê de di aşxaneyê herî luks de xwarin dixwarin mîdûr got "ez te pîroz dikim Sofî, ji te nebûya em ê tu caran nikaribûna bigihîştina Zinar. Bi vê hevkarîya xwe te hem marketa xwe xilas kir, hem jî tu bûyî hevparê teşwîka ku dê bê belavkirin. Êdî kes nikare piştî te deyne erdê" Sofî Xelo tenê bişirî.

Çemê Dicleyê di nîvê zeviyên gund re dihat, pêlên avê li diwarên xaniyan dixist û weke rîya marekî sor, ber bi jêr ve diherikî. Ji bilî çend darên tuwan ên ku di hewşên xaniyan de hatibûne çandin, gundekî bê dar bû. Tu kesî nizanibû ku ev gund kengî û ji hêla kê ve hatiye avakirin. Ev deşta fireh, ev axa nola hevîrê tîrşbûyî nerm, çawa çipitazî bû, mirov matmayî dihişt.

Esir derbas bûbû, roj ber bi êvareke

Min nizanibû ku li vê dinyayê jî bihuşt heye

Behlûl ZELAL



payizî ve diqulibî. Karvanî, matereyên avê yên bi potên şilkirî pêçandî di milên wan de, sernixumandî, karik û berxikên xwe ji bin siya darên tuwan derdixistin û ber bi firazeyên genimî ve dibirin.

Piştî ku mêrê Delalê li tirimbêla Miheme, axayê gund siwar bû û tirimbêla ku weke berfê spî bû, di nav gulokên tozê de winda bû; Delalê ji qehran dikir bixeniqiya. Hêrsa wê bûbû girêkek û hatibû di nivê qirka wê de zeliqibû. Laşê wê sinciribû û direilî, dixwest bigirî lê dikir û nedikir nikaribû bigirî jî. Girêka hêrsê ya ku di qirikê de bi cî bûbû rê nedida girî.

Pêşiyê sifreya ku firaxên şûştî li serê rêz kirîbûn li erdê xist, dûre bi çembilên kurê xwe yê sêsalî girt û li erdê xist. Girêka hişk a ku mêjiyê Delalê ji cih leqandibû daketibû bin singa çepê. Henaseya wê diçikiya. Dixwest tiştina bike lê ew tişt a ku dê dilê wê rihet bikira çî bû, wê jî nizanibû. Gava cîranên wê gihan Delalê, yekê ji wan kurik hilgirt, di himbêza xwe da parast, a din bi şid her

du destên Delalê girtin, bi hosteyî ew rûnand, te digot qey serbazê cendirmeyan a salan e.

Delalê bi qasî qederekê têr girî. Heta rondik di çavên westiyayî de ziwa nebûn, devê wê venebû, peyvek ji nav lêvan derneket. Giştî nola zarokekî berşir ku di ber singa dayika xwe de bi xew ve diçe, serê xwe daniya ser kaboka cîrana xwe û bi xew ve biçûya. Tenê xewê ew ji hezn û derdan bi dûr dixistin. Lê ev serê çend salan e, bi rastî jî piştî ku mêrê wê Evdo bi Miheme re bû heval, xewa şevan jî jê re bûbû hesreteke mezin. Dema ku ji taqetê diket û hema wisa xalî bi xew ve biçûya jî vê carê xewnên dojahî dihatin dibûn mewanên wê û xewa şîrîn li diherimandin.

“Delalê, xweha min, tu çima wisa bi xwe û zarokên xwe dikî? Mafê te li te hebe, li van zarokên bêguneh nîn e ku tu vê bobelatê tinî serê wan. Ma çî sûcê wan heye, feqîrên xwedê? Heke wisa tu ji mêrê xwe û rewşa wî ne xweş î, ku mêrê te hate malê, li hember wî rûnê û bi

xweşikahî yek bi yek jê re bibêje. Bêje, ez ji îro û pê ve qebûl nakim.”

Delalê çavê xwe miç kiribûn, li axaftina cîrana xwe Xezalê guhdarî dikir. Cîrana wê Gulê jî xwest tiştina bibêje. Ku negota dê xwe sûcdar bidîta. Bi wê zîziyê tevgeriya û bi nêrîneke wateyî li Xezalê nihêrî, nola ku bibêje, ‘Êdî dora min e cîranê, ez jî çend tiştan ji Delala xizan re bibêjim’ û pêre pêre jî dest bi axaftina xwe kir.

“Hey agir bi malê neketê, ma ev bû çend caran ez ji te re dibêjim, gazî birayên wî bike, gazî ap û xalên wî bike. Li ber hemûyan yek bi yek her tiştî bibêje. Em ê jî alîkariya te bikin. Bû, bû. Nebû, nehate ser rê, xwedê mezin e. Ya tu dê li malika xwe rûnêyî, tu carekê jî deriyê malê jê re venakî. Bi ku de diçî cehnem û korîma wî, yan na rahêje bexçika xwe biçê mala bavê xwe. Ma di vê dinyaya mezin û tije de, tenê ji te re, pariyek nan nîn e, hey mal-neketê! Ev çi hal e ku tu her roja xwedê, vê ecêba hanê tîni serê xwe û zarokên reben’... Û Evdo beg jî biçê, li bajaran kêfa xwe bike. Bi jinên qehpik re rûnê û rabe. Bixwe û vexwe. Tu jî li vir êş û derdan bikişîni, ha! Ma ev karê aqilan e, ma ev karê mirovan e, ha!...”

Nola ku gulê û Xezalê, berî ku bêne cem Delalê bi hev şewirîbin; rê nedidane axaftina wê. Yekê jî ya din peyv werdigirt û didomand, lê belê, wan dilê Delalê rihet dikir an dilê xwe rihet dikirin ne diyar bû.

“Ma ku şeref û namûs bi wan re hebûya, dê roja pêşîn rasterast biçûna taziya li gundê cîranê me. Ma ne bi lingan nîvsaetê nakişîne. Bi ser de jî, xortê ku ev serê şeş heft salan e li serê çîyan bû û jiyana xwe di şerê bi dewletê re ji dest da, kurê xalê Evdo ye, ne li ser xêrê be.”

“Xwekê, ma yê rûreş, tenê Evdo ye? Ma qaşo, Miheme axayê vî gundî ye, axatî jê kêma e. Ne axa, ew nikare bibe geyek jî. Ma bîra taziye jî nabe. Ma qet riwê wî

naêşê? Kesî tu ecêba wilo neditiye. Li der û dora vê deştê mêrek nema ku nehat taziye wî xortê delal. Di nav ên ku ji bajêr hatibûn, bi qasî mêran jin jî hebûn. Lê rûreşên me lêdixin û diçine bajêr, li dû qûna jinên qehpik digerin.”

“Dilê xwe xweş kin, sebir bikin, ev bêxîretî wilo nadome û ev tir jî, ji wan re namîne. Kesê di riya rast de nemeşe, teqez dê carekê lingê wî, li kevirekî biterpile. Tiştê ez baş dizanim, dawiya wan ne ya xêrê ye û hew.”

“Ne tenê biterpile, xwezî rebî qidûmê wî bişikên ku careke din nikaribe rabe ser piyan.”

Her du jinan dilê xwe rihet kiribûn. Bêhna teng li wan fireh bûbû. Lê dilê ku bi kul û derdan mişt tije bû, hê dikeliya. Agirê laşê Delalê hîna weke xwe bû. Bêhna wê di ber re dernediket. Nola sewala ku ji ber gurekî filitibe, kûr kûr dinaliya.

“Erê, erê. Gotin hêsanî ye, xwişkên min. Ez jî dizanim çi bikim lê gotin û kirin nabe yek. Ma tenê firotina mal û milk e derdê li ser dilê min. Erê pêncî donim erdê me ku me bi çi perîşanî kiribû, firot. Çavê zarokên min mane li deriyê xelkê. Traktora ku me bi deynê salan kiribû, firot. Dest û piyê me birin. Heta bi sê çelekên me ku me peşkek şîr ji wan dixwar, firot, devê zarokên hûr ziwa hişt. Xwekê ma çi bêjim, tişteki bi serê mis-qalekî ku pere bike li dora me nehişt, vî xwedê nehiştî. Lê ma ev tenê ye? Ev serê salekê ye weke mirovan, zimanê wî li zimanê min neketiye. Bi xweşikayî bi van zarokan re neaxiviye û ew hembêz nekirine. Ku çû sê roj, çar roj, carna deh rojan, bîst rojan piyê wî li malê nakeve. Ku tê jî, bêhn û pixara ku ji laşê wî difûre, ya star! Piştî ku bi vî xwedê nehiştî re bû heval, dev ji her tiştî berda. Her tişt jî bîr kir. Hûn jî dizanin, ma berê Evdo wilo bû? Dawetek bûya, taziye bûya,

palûteyek bûya, Evdo berî her kesî baz dida. Ez rebena xwedê çi bikim? Xwedayê mezin ji neqencan re nehêle rebbî!...”

* * *

Mala wan hezar carî ava be, cîran û gundiyan, zarokên wê tî û birçî nehiştibûn. Lê bi pariyên xelkê debar nedibû. Delalê bûbû rêncbera gund. Karek hebûya, gazî Delalê dikirin. Keça xwe ya mezin a deh salî û kurê xwe yê heşt salî didan dû xwe; karê nav malê, paqijkirina hewşan, paleyî, eşêf, bêjinkirina nîsk û genimî... Çi diket ber destê wan texsîr nedikirin. Êdî tu fêda Evdo ji wan re tune bû. Fêde li aliyekî, roja ku neçar dima û dihate malê, xisar dida wan. Ji ber vê yekê, her tim Delalê digot; “Xwedêyo te ev belqîtî ji me bistenda, em jê xelas bibûna.”

Evdo û Mihemeyê axa, li bajaran digeriyan, kêf û şahiya xwe dikirin. Delalê û zarokên xwe, roj bi roj, bi nanezikê dixebitîn.

Rojekê, dîsa weke her carê, Miheme û Evdo du jinên ciwan û spehî bi dest xistibûn. Sê şev û sê rojan, li oteleke li ber behrê, bi jinan şa bûbûn. Di dawîya şeva sêyem de derketibûne nav baxçeyê li ber behrê. Pêlên avê, bi giranî li qiraxê dixist. Dengê avê, roniya rengo rengo, sifreya ji her cure xwarin û vexwarinê, bişirînên jinikên ciwan û xweşik; serê Evdo xweş kiribûn. Evdo nola li ser deydikekê be. Ew rûniştî bû, li hewayê bû, şiyar bû, di xewê de bû, çûbû bihuşta ku melayê gund, her tim di mizgeft û civatan de qal dikir, wî qet nizanibû. Tişta ku baş dizanibû; dilê wî xweş, riwê wî geş bû. Dilê wî çi bixwesta li ber destê wî bû.

Piyalek eraqa sar bi yek carê di devê xwe de vala kir. Şahî û coşê, bi ser dil û mêjiyê wî wergirtibû. Piyale bi şid li nivê maseya tije xist û bi her du destan bi milê Miheme girt û ew hejand: “Kuro lawo Miheme, tu çi mirovekî xayin î lawooo. Ma

çima heta niha te ji min re nedigot, li vê dinyayê jî bihuşt heye, ha, bêje ha, te çima nedigot?...”

Evdo pir dixwest ku ev bihuşta xweş tim û tim bidome, xulekek be jî, laşê wî, hişê wî, ji nav vê bihuşta xweş dernekeve. Nedixwest gund, kesên wî yên li gund carekê ji bêne bira wî. Jixwe ku zarokên wî, jina wî dihatin bira wî, piyale li ser a din dadigirtand. Lê êdî tişteki Evdo ku karibe bifroşe nemabû. Miheme îcara sê hezar donim zevî ya du salên dahatî jî, stendibû û xwaribû. Destara wan, pîrî jî destara Miheme axa êdî nedigeriya. Lê heçî kesê dewlemend be, dost û hevalên wî jî pir in. Miheme axa lêxistibû, çûbû bajarên dûr. Kêf û şahiya xwe li wan deran didomand. Jixwe dihate gotin ku jineke Miheme li wî bajarê dûr jî heye. Evdoyê reben bêçare, serî di ber de tewandî, vegeyriyabû mala xwe.

Rojekê melayê gund bi Evdo re axivî. Gotê ku heke ew tobe li ber xwedayê xwe bike, dê cenantiya salê bidê. Heta dê hinek heqdesta wî pêşin bidê da ku bikaribe çelekeke bişîr ji zarokên xwe re bikire. Evdo li ber destê melayê gund ku ji îro pê ve kardêrê wî jî bû, destê xwe li Quranê xist. Qurana pîroz bi şid girt, heta melayê wî got, “Bes e Evdo, bes e.” Maç kir û danî ser serê xwe. Nola ku Evdo di xeweke ber sibeha rojê payîzî de xewneke kin dîtibe û bi lez û bez ji wê xewnê şiyar bibe. Û jixwe ji her kesî re digot. “Ez ji ser hişê xwe çûbûm. Min aqilê xwe winda kiribû. Miheme axayê gundekî ye. Bi hezaran donim erdê avî dixwe. Ez û ew, em ne peyayê riyekê ne. Şikir ji xwedayê heq re, şikir... A niha ez ji wê xewa derewîn şiyar bûme. Hişê min hat serê min. Çavê min bal bûn”

Evdo ferzeke limêjê li xwe nediborand. Pir caran ew berî melayê gund li mizgeftê amade dibû ku ferza limêja xwe bike. Heta mele dihate mizgeftê, Evdo der û dor paqij dikir. Pêlav rast dikirin. Bi-

huşta ku Miheme axa jê re vekiribû, ji bîr kiribû. Niha di hişê Evdoyê cenan de, xeyala bihuşteke din hebû ku bi saya mele û kardêrê wî her roj nêziktirî wê bihuştê dibû.

Êdî Delalê dev ji karê xelkê berdabû. Evdo yeka wê nedikir dido. Zevî, traktor, çêlek... ji dest çûbin jî, delalê dilan vege-riyabû malê. Stûna malê ketibû cih. Bi kêf û eşq karê mala xwe û zarokên xwe dikir. Di ber karê xwe de, tim distrî;

“Dilo lo dilo, dilo lo dilo,
Dûr me fire bilbilo,
Here bîne Hekîmê Lokman,

Da ku derman bike dilê bi kulo.

(Amed-29. 09. 2008)

*Di her sûreteki de civata paşdamayî, tabû-
yek neşikiyayî,
nezaniyek bêxem, maldariyek bêwîjdan û
bêşerm,
zordariya dewletê ya hovane û hezarfen,
parastina şerefekê hêşir hatine raxistin*

Ez bi her kurteçîrokeke realîst a pir-
tûka **“Şikefta Xwekuştinê”**, gihîştim
hizir û peyamên cuda. Di çîrokên Receb
Dildar de gelek wêneyên civakî hene û pi-

Wextên xewneroj veşartî

Şivan Ar



Şîr venexwar pitika nava min
Vê sibehê
Kuçeyên bi kevirê Arnawidî
Şewqeyek fotir
Çileke baxçevan
Zarokek
Bi gavên xwe yî mîna
Charlie Caplin nemeşî

Hê
Pif nekir mizîqa
Li hember ba
ja
rê
xwe
li qaqlîbazan temaşe nekir

Zûzûka!
Stenbol cilê berfê li xwe dike
Kwîtekwîta ba deng dide
Zûzûka..
Zaroka di bîranînan de veşartî mayî

29 Pûşper 2007

Şikefta Xwekuştinê

Aram GERNAS

raniya wan bûyeran li ser rastiye û jiya-nê ne. Di wan bûyer, serpehatî û dîmenên jiyane de evîn heye, ragihandinên hizrî, politîk, civakî hene, ken û girî hene, drama hene û bi gotineke kurt hemû sûretên civatê hene.

Di her sûretekî de civata paşdamayî, tabûyek neşikiyayî, nezaniyek bêxem, maldariyek bêwîjdan û bêşerm, zordariya dewletê ya hezarfen û hovane, parastina şerefeke bêşeref û bi dehan wêneyên din hatine raxistin. Pirsgirêkên civakî û rêzê-pirsên bersivandinê xwe davêjin pêşîra meriv.

Hêmanên çîrokan

Kurteçîrokên Receb Dildar bi mijar, leheng, bûyer û rêsiyên bûyeran, rê û şopên çîrokê lihevhatî ne. Kontrola nivîskar li ser herikîn û berê çîrokê, lehengan û tevgera wan xurt e. Bûyer û lehengên bûyerê bi teswîrên xurt tîr pêş-kêşkirin. Bûyer gav bi gav tê amadekirin û di xwendevanan de bendewariyekê diafirîne da ku çîrok li cihekî peyama xwe û mebesta xwe biteqîne. Bi awayekî şêwe, çîrokên Receb Dildar di dawiyê de diteqin û şîfreya çîrokan dibîşkive. Ev şêwe di piraniya çîrokan de bûne xeta sereke. Wek mînak, di çîroka *“Ez kekê te me”* de Brahim ji aliyê tîmên taybet ji dermanxaneyê tê revandin. Sadûnê birayê wî li ser qereqola polêsan de hêwirzeyekê radike û revandêrên birayê xwe wek terorîst dest nîşan dike û giliyê xwe bi wî awayî dike. Polês li tîlê dixin û li ser rêya Amedê texsiya tîman didin qefaltin. Sadûn û merivên wî jî digihîjin texsiyê û millet bi ser serê wan de dixurice. Heta ku nasnameya



revandêran tê famkirin, gelek kes bi wan dihesin û dibînin ku kê Brahim revandîye. Sadûn ji tîmên taybet kutanê jî dixwe lê bi gotina xwe ya dawîn a ku ji merivên xwe ra dibêje peyama çîrokê dide ragihandin: *“Hûn li ber çî dikevin lawo, me Brahim ji kuştinê xilas kir, ma ne bes e? Ew qas însan bûn şahidê bûyerê, êdî ew nikarin wî bikujin, hepis jî karê mêran e.”*

Bi gotina kurt a dawî, kurteçîrokên Receb Dildar bi vî formulê hatine nivîsin:

Destpêk – tîrkirin – bişkivîn

Ziman

Zimanekî rewa û zelal, gelêrî ye û bi hêsanî tê têgihîştin. Teswîr û estetîk xurt in. Bi navê hunera vegotinê, ziman nehatiye giran kirin û wisa xuya ye ku nivîskar bi awayekî xwezayî hiziriye û çîrokên xwe nivîsiye.

Krîtîk

Bêhemdî be jî, li hin deran şasiyên zîmanî çêbûne. Lê ev şasî gelek kêmtir in û meriv zû bi zû lê nawerqile. Nivîskar jî, ya lê newerqilî ye yan jî bi wî awayî dizane û bi kar aniye. Wek mînak:

*“xwe bi ser hev de **dîquncirand**”, bi maneya “xwe bi ser hev de dîquncifand”*

bi kar anîye lê maneya “quncirandinê” tiştêkî din e. **Quncirandin:** badok e, li hev badan e, êşandin e. **Quncifîn:** ji ber serma û tirsê meriv xwe diquncifîne ser hev, ango xwe melisandin e.

Dîsa di îdiyomêkê de gotiye “*ji sermayê cih nediketê*”. Ev deranîn kare bi çend awayan bête bikaranîn. Wek mînak: “Ji sermayê tebat pê nediket”, “ji sermayê hedana wî nemabû”, “ji sermayê bêhn lê çikiyabû”, “ji sermayê quncifibû ser hev” û hwd.

Dîsa di çîroka “**Çavên li ser darê**” de bi awayekî teknîkî şaşîyek hatiye kirin. Ev çîrok li ser karesata Parqa Beza Hespan (Koşuyolu), mirina pênc zarok û sê mezinan bû. Di termosê de bombeyek hatibû bicihkirin. Hemû şikan destnîşan dikir ku amadekarê bombeyê û vê komkujiyê Ergenekon bû. Du keçikên biçûk bi destê hev digirin da ku herin mala bapîra xwe. Riya wan di parqê de derbas dibe. Tî dibin û çavên xwe li kaniyekê digerin. Wê hingê rastî termosê tên. Yek ji wan ji bo avvexwarinê termosê hildide lê çî dibe wê hingê dibe. Bi teqandina bombeyê heşt kurd tên kuştin û gelek birîndar dibin. Di vê çîroka lihevhatî de şaşîyeke teknîkî hatiye kirin. Dema ku Şîlan destê xwe dirêjî termosê dike weha dibêje: “*Tiştêk nabe, wa ye pereyên hûr bi min re hene, em ê qedehek ava xwe bigirin, eger heta wê çaxê xwediyê avê nehat, em ê pereyên wî deynin ser termosê û herin.*” Ev peyvên han ên zîrekiyê ne, peyvên kesên perwerdekirî, xwedî êtik û pêşketî ne. Bi raya min ew peyv li wan zarokan nayên. Peyvên ji serê wan mezintir in. Ji bo hildana termosê şîna gilover, du alternatîf hene. Yek jê: Zarok termoseke xweşik û bêxwedî dibînin, kêfa wan jê ra tê û wê hiltînin. Dudo: Zarok bi mebesta avvexwarinê termosê hildidin û piştî datînin cihê wê.

Çend gotin li ser naveroka çîrokan

Çîrokên Receb Dildar, temaya xwe ji bûyerên civatê yên qewimandî wergirtine. Nivîskar hin bûyer bi xwe neditiye û ne-

bûyê şahidê wan lê bi fanteziyeke xurt û bi şeweyekî realist ew bûyer vejîrandiye. Wek mînak: “**Evîna Kulîlkê**”. Çîroka dayikekê û keçika wê ya biçûk a ku di karesata Helepçeyê de can daye. Psîkolojiya dayika kurd a ku ji bombeyên jehrê û ji mirinê direve; psîkolojiya tofana ku bi serê kurdan de hatiye, koçberiya ku ew bi dertûlê xelkê xistine... “**Bêhna Axê**”. Çîroka xortekî kurd ê ku li Rûsyayê kar dike û pêrgî jiyanêke cuda dibe. Di wê jiyana de pêkhatina xeyalên xortekî heye lê li aliyê din serketina dijiwariya debarê xwe davêje pêsîra wî xortî.

Di pirtûkê de bîst kurteçîrok hene û her çîrokek xwedî temayeke cuda ye. Mesele çîroka ku navê xwe daye pirtûkê, ango “**Şikefta Xwekuştinê**”. Tema: Zewaca bédil û bédeng e. Maldarên bêwijdan û xweperest ji bo nefsa xwe ya bêserm û rezîl, çavên xwe kor dikin, guhên xwe kerr dikin, hizrên xwe ji zanîn û hişmendî re mor dikin. Bavê keçikê ji feqîrî, keça xwe di ber deynan de dide melayekî bi jin û zarok û kal. Keçik dikeve ber çerxa urf û adetan, feqîrî û bêhurmetnekirina malbatê. Di dilê keçikê de tofanek radibe û ji bo xwekuştinê biryarê dide lê li aliyê din jiyaneke dirêj û bedewiyên wê!..

Wek ku min got, her çîrokek xwedî taybetmendiyekê ye. Her çîrokek serboriyek e. Her serboriyek jî bûyereke e. Di nav van çîrokan de, yên ku xelat ji wergirtine hene. Wek çîroka “**Veger**”. Çîrokek pîralî û bi kêş û civakî. Hemû êş û taliyên jiyana di serê lehengê çîrokê de teqiyane. Debara malê, zordariya ser gelê wî, xwendina kurê wî, rihetkirina jina wî ya derd-kêş, ketina ber qar û minetên karmend û gelek stresên din....

Helbestên Sosinê xwe kuştin

Ez ê balê bikişînim ser çîrokeke din î ku dikeve rojeva nivîskaran. Kurteçîroka “**Helbestên Sosinê**”. Sosin ji bo çapkirina helbestên xwe yên xweş û cudareng bi firê dikeve lê bersiva weşanger dibe

wek sîleyekê û di belegoşka wê de diteqe, xewnên wê serûbin dike. Û dema ku hevaleke wê jê dipirse ka wê kengê helbestên wê bîn çapkirin, bersiva wê dibe pirsek, dibe sîleyek, dibe protestoyek û dikeve sifreya weşangeran: *“Helbestên min xwe kuştin!”* *“Helbestên min gotin em naxwazîn bibin pêkenokên bazir-ganekî ber şekalan!”*

Sosin çima helbestên xwe dikuje? Ji ber ku weşanger wek bazirganekî çîlû bersiva çapkirina helbestan dide. *“Ji bo çapê mesrefa wê milyarek û 400 milyon lîra ye, nîvî ji min, nîvî ji te. Nebêje ku ji min tenê pereyan dixwaze, nivîskarên herî mezin ji werin em dîsa ji wan distînin, lê tu kes li xwe danayne. Usûla vê bazarê wilo ye, heta pere neyê ser masê, kitêba tu nivîskarî/ê nayê çapkirin.”* Ya rastî, bersiva weşanger wek topekî di serê meriv de diteqe. Weşangeriya ku di civata kurd de heye, du sê weşanxane û weşangeriya rêxistinane ne tê de, li ser bidestxistina pereyan dimeşe. Li hemû dinyayê weşanger li dû nivîskaran digerin lê li ba me nivîskar li ber weşangeran digerin. Li hemû dinyayê nivîskar ji berhemên xwe pere qezenc dikin lê li ba me ji cêba xwe pirtûkên xwe didin çapkirin. Him ji cêba xwe berhemên xwe didin çapkirin him jî firoştin û hatina ku ji pirtûkan tê dikeve cêba weşangeran. Ji berhemên çapkirî, pirtûkan ji sedî pênc an deh digihîje berhemdaran. Li hemû dinyayê weşanxane projeyan çêdikin da ku nivîskaran teşwîqî berhemdariyê bikin lê li ba me polîtîkaya ku weşanxane dimeşînin nivîskaran bêzar dike û helwesta wan a berhemdariyê kor dike. Bêguman yekhebin weşanxane hene ku pirtûkan bi pereyên nivîskaran didin çapkirin û pirtûkên çapkirî didin nivîskaran lê simsariya xwe digirin. Ev rewş sergêjahîyeke wisa afirandiye ku hin nivîskar ji bo ku neyên xapandin, bixwe weşanxaneyê vedikin da ku berhemên xwe bixwe çap bikin.

Çîroka “Helbestên Sosinê”, weşan-ge-



riya heyî wek xwekuştina berhemdariya kurd destnîşan dike.

Bi gotina dawîn, kurteçîrokên Receb Dildar hêjayî xwendinê û pesindanê ne. Pirtûk bi bergeke bedew ji aliyê Weşanxaneyê Avestayê ve hatiye çapkirin. Hêja ye ku meriv yek bi yek çîrokên “Şikefta Xwekuştinê” bixwîne. Min çend gotinên xwe got bila çend gotin jî ji aliyê hizrên cuda bîne gotin.

Peyva koçer, ji yên ku ne niştetih in û li tu deveran daîmî angî temamiya salê nasekinin, angî her dem warguhêz in û li deşt û zozanan digerin re tê gotin. Heçî Koçer in zivistanan li deştan, li cî û deverên germ bi cih dibin. Wexta dinya piçekî ji ba û baranê, ji berf û sermayê rizgar dibe êdî koçer ber bi çiya û zozanan ve diçin. Sedema vê gera wan jî ew e ku bikaribin pez û dewarên xwe hem tîr çêre bikin hem jî ji germ û serma zêde biparêzin.

Di dîroka kurdan de destpêka koçeriyê digihîje bi hezaran salan û bingeha

Ferhenga koçeriyê

- | -

Bahadîn ROBAR

aboriya kesên ku koçerî dikirin jî xwedîkirina ajalên cur bi cur bû. Heta em dikarin bibêjin yekane deriyê aboriyê bû. Ev kevneşopiya jêneger heta salên 1987-1988'an bi awayekî dilxweşî û aramî dihat meşandin. Lê belê ji 88-89'an û şûnve jî ber şerê bi hênceta ewlehiyê çûyîna zozanan jî aliyê rayedarên dewletê ve hat qedexekirin û êdî koçer îskan bûn, ango êdî nikaribûn biçin zozanan. Gundê wan hatin valakirin, ajalkarî û çandinî li gor daneyên 200 salên dawîn daket asta herî kêr. Koçeran û gundiyan pez û dewarên xwe bi nivbuha firotin û neçar man ku dev ji çandiniyê berdîn û li herêmê û li tevahiya Tirkîyeyê (li metropolan bi cî bûn) heta li her çar aliyên dinyayê belav bûn. Ji van koçeran 7, 8 eşîrên Koçer li cizîrê û li derdora wê diman. Ka em binêrin koçerî karekî bi çi awayî ye.

KON: kon; avahiya ku mirovan weke mal bi kar dianîn û ji mûyê bizinan dihat çêkirin. Mûyê bizinan piştî ku ji bizinan dihat birin bi şehê hiriye dihat şekirin û bi teşiyê dihat rêstin û dezgeha bi navê tevn de dihat honandin û bi vî awayî li gor daxwazê mezin an jî biçûk bi hevdu ve dihat dirûtin û dibû kon. Mezinahiya konan bi stûnan diyar dikirin û stûn durêzî bûn, ji du stûnan heta heft stûnan konên havînî, ji heftan heta çardeh stûnan jî konên zivistanî dihatin çêkirin. Biharan hê zû jinên Koçer bi dest honandin, pînekirin û dirûtina konên xwe dikirin ben, şelît, ta û werîsên kongirêdanê jî bo girêdana kon amade dikirin da ku dema malbarkirinê konên wan jî bo zozanan bê kêmasî be.

BÊRÎ: Ji dotina pezê gelek (kerî) re "bêrî", ji yên ku pêz didoşin re pezdoş an jî bêrîvan tê gotin. Dera ku pez lê tê dotin navê wî cihbêrî (cihê bêriyê) bû. Cihbêrî, paralelê hevdu du kuçên ku mirovek bi karibe li ser rûne û metro û nîvekê jî hev dût, kuçek jî metroyekî jî wan dût û wek sêkuçî li rasta nava her du kuçên din tên danîn. Her du kuçên ku paralelê hev in her yekî bêrîvanek li ser dirûnê û kuçê din yê ku pêşberî wan e jî bêrîvanek li ser dirûnê û berê wê li her duyên din e. Û bêrîvanên mayî jî li dora wan li vî milî û li wî milî berê pêz didin nava bêriyê û nedihêlan ku pezê bişîr di tenîştên (kêlek) bêriyê re derbas bibin û berê wan didan nava bêriyê û pezdoş didoşe qûşxaneyê ku li nav her du lingên xwe de girtiye. Yê ku li pêşber rûniştiye serê mihan digire heta ku bêne dotin û piştê diberde û serbêrî, ango di bêriyê re derbas dibin. Lê yên ku stewr in ango ne bişîr in di tenîştan re tên berdan û serbêrî dibin. Dema qûşxaneyê ku li ber pezdoş tijî dibe bi alîkariya kovikê ditêxin şîrarê ku ji bo şîr anîne. Piştî keriyê pezî hemû hat dotin bêrîvan şîrarên xwe ditêxin têran û li kerê bêriyê dikin û dibin malên xwe.

MEŞK Û ŞÎRAR: Meşk, şîrar, heban (hewan) û hîz, ev her çar cure jî ji eyarên pêz tîr çêkirin. Meşk, şîrar û hîz bêhtirîn li zoznan jî bo şîr, dew û rûn tîxinê lazim dibûn. Heban jî ji bo hilandina cilên kîl-fetê malê dihat bikaranîn. Ji bo vê yekê jî di dema zivistanê de eyarên pêz jî aliyê jinan ve jî pûrt û mûyan dihat paqijkirin û bi debaxa qalîşkên hinaran dihat dermankirin û deverên ku kun in bi dirûtîneke taybet (kûnderz) dihat dirûtin da ku cureyên herikbar lê neçe (jê nerije). Her wiha şîrar jî bo şîr, meşk jî ji bo mast, dew, av, dims û hwd. bû. Ji kevilê pêz gelek cureyên din jî ji bo karûbarên nav malê dihat bikaranîn. Weke berdestk, berank, pêlav, lepik, boxcik, sûcade (mêzer) û hwd ji kevilê pêz dihatin çêkirin.

FIRAXÊN SIFIR: Ji ber ku Koçer pir merd bûn diviyabû firaxên wan pir bin da

ku bikaribin bêhtirîn mêvanan xwedî bikin. Ji bo wê çendê ji beriya ku biçin zozanan firaxên weke qaqeb, zerik, qûşxane, sînî, şerbik, laliyên xwarinê, piyan, fitir, hwd. dibirin sûka Cizîrê li cem sefaran (yên ku karê firax û tiştên ji hesin, sifir, bakir û hwd dikin) paqij (spî) dikirin. Derxûn, şopik, kevçik û heskoyên koçeran jî ji daran dihatin çêkirin. Ji bo nanpehtinê sêl bi kar dianîn. Koçerên wê serdemê kêmbay vedixwarin. Yên ku bêhtirîn çay vedixwarin û îkram dikirin axleb ji mala axê û ji mala muxtar (lê muxtar ne fermî bûn) bûn. Ji vê yekê jî çaydank, kevçikên çayê û amûrên din ên çayê hewce nedikirin.

TEVN: Tevn ji bo koçeran dezgeha herî pêwîst a cil û bergên mirovan, heywan û tiştên nav malê pê dihat çêkirin bû. Tevn bi pîjik, tefşik, kerkît, pişte, navtevn û hin amûrên din dihat kirin. Cur bi cur tîr (amûra ku şûna dolaban pêdivî dixistinê) tûr, şelege, çelte, xurcîkzîn, xwêdank, doxhevsar, werîs, teng, destmehdik, doxîn û hwd. bi riya tevnê dihatin honandin û pêdiviyên xwe bi vî awayî diditin û ji çûyîna zozanan re ji vî aliyî ve jî amadekariyên xwe pêk dianîn.

BER BI ZOZANAN VE: Piştî hemû amadekariyên pêwîst hatin kirin êdî her malekê ji bo rênçberiya pez û dewarên xwe şivan, gavan û berxvan digirtin an jî ji malê hinek kesan ev peywîr pêk dianîn. Kesên ku karê şivanî, gavanî û hwd. dikirin re rênçber dihat gotin. Ji bo bikaribin karên xwe rihetir bi rê ve bibin du malan pezên xwe diberdan nav hevdu û şivanî û bêrîvanî bi dorê dikirin. Dema hewa piçekî germ dibû êdî li warên zivistanî sebra koçer û ajalên wan nedihat û her malekê ji ser warên xwe yê zivistanî ber bi zozanan ve bar dikirin û li devera herî nêzik digihan hev. Lê her eşîrekî babik babik bi hev re diçûn zozanan. Koçeran hemû tişt û pêwîstiyên xwe li dewarên hespîn, ker û çêlekan bar dikirin û qonax bi qonax, (her qonaxekî 4, 5 saetan didomand) her roj konaxekî ber bizozanan ve diçûn. Li vê navberê re tiştên ku xetereya şikestina

wan hebû jinên koçeran ew tişt her çî be û çiqas giran be jî dixistin tûrê xwe, jinên zarokşîr jî ango yê pitikên wan hene jî pitikên xwe dikirin tûrê xwe yê ku neqîşandî ye û didan piştê xwe û 4, 5 saetan dimeşîyan heta ku bigihîjin warê ku malan lê deynin. Wexta ku mal digihîyan warê ku lê deynin, bi bayê bezê re jin û ciwanan dewarên ku barkirî ne ben û werîsên wan vedikirin û barên wan didanîn xwarê (jêr). Bi dirêjahî kuç (kevir) li erdê radixistin û ew tîr û telîsên ku hemû tişt û miştên wan tê de ne li ser wan keviran diraxistin. Ji seriyekî heta serê din ê kon tîr û amûrên xwe dikirin rêz û ji vê rêzê kirinê re digotin “ster.” Piştî sterê xwe rast dikirin demildest dest bi vegirtina konê dikirin. Ben û werîs li serê stûn û singan ve girêdidan û di nava kon re hêdî hêdî stûn dihildan jor û bi vî awayî kon di demek kurt de dihat vegirtin.

Dema kon dihat vegirtin karê pêşîn taştêya maliyan (malbat) bû. Wî wextî bûkanti û xesûti pir dijwar bû. Xesûyê emir dida bûkê taştê dianî ber kilfet û bi hev re taştêya xwe dixwarin û piştî taştê zarok û ciwan tev diçûn bêriyê, bûk jî ji bo dewarên xwe diçû ciyekî ku giya, kêvar an jî qirş lê hene tîra dewarên xwe didûrit û dikir piştî û dida piştê xwe û dibir malê li ber tewla dewaran rêz dikir. Piştî şîva dewêrê bûkên malê (hin malan 3, 4 bûk hebûn) ji bo pehtina xwarinê diçûn ardû (êzing) berhev dikirin û dianîn ber kon. Heta ev kar dihat kirin bêrîvanan jî pezên xwe yê bi şîr didotin û şîrê ku ji pêz dotine dixistin şîrarî û dianîn malê. Wexta ev şîr digihîya malê xesû û bûkê bi hev re lez û bez hinek jê dikirin mast û para mezin jî dikirin penêr. Mastê zêde jî dikirin meşkan û di keyan heta ku rûn (nivîşk) bi ser diket. Rûnê ku li ser keyandina meşkê diket dixistin hîz (hîzik). Hîz jî ji kevilê pêzê ku ji hiriyê û ji mûyan hatî paqijkirin, ango kevilê rût yê ku ji bo hilandina rûn dihat bi kar anîn e. Dewê ku zêde dima dike landin heta ku dimeyiya û dikirin parzûnê heta ku xweşik dadinizilî û wek penêr hev digirt jî wê dikirin yek kulm û

(navê wan keşk e) didanîn ber hewayê heta ziwa dibûn.

Ji dewarên zomê hemûyan re hinek kes bi mehane digirtin û dikirin gavanê zomeyê heta ku koçer ji zozanan vegerin. Sibeha (beyanî) hê zû gavanan dewarên zomê ji nav zomê berhev dikirin û dibirin erdên ku çêra wê bijon e diçêrandin heta êvaran. Bi nimêja êvarî re gavanan dewar dianîn nav zomê. Jinên Koçer dewarên xwe bi rêzê li tewla dewaran a girêdanê girêdidan. Ji xwe ew dem dema konberdanê bû. Dema rûçikên rojê xwe li pişt gelî û çiyayan diveşart hemû kesên ku heman sibehê ew kon vegirtine êdî ji bo sibeha din bikaribin zû bi rê bikevin dîsa konên xwe berdidan, ango vedikirin û dipêçan ji bo barkirinê amade dikirin. Wek me li jor jî gotibû ew kar her roj dihat dubarekirin û nêzî 15 heta 20 rojan dom dikir heta ku Koçer digihyan warê binecihê, ango digihyan zozanên ku kirê kirine an jî yê ku xwemalê wan e. Heçî koçerên ku zozanên wan bi xwe tune bûna zozanên eşîrên biyanî kirê (kode) dikirin. Ji wê û şûnde êdî cur bi cur penêr çêdikirin û dikirin eyaran heta payîza dereng bi vî awayî didoman-din. Ji hemû cureyên şîrîn re “spîtayî” dihat gotin. Dema zome digihyan warê binecihê êdî malbatê karên ku he-yîne li hev parve dikirin. Di nav jinên malê de ya emirdar kevanî û zîlamê ku emirdar bû ji malxwê bû. Hinek ji wan dibûn bêrîvan, hinek dibûn xwarinpêj, hinek dibûn berpirsiyarê spîtayê, hinek jî dibûn ardûçîn (gûnî, sergîn, darên hişk, hej, hwd.) û kêvarçîn (kêvarî), (giyayê bi stirî, kelbeş, serteşî, kêvarê smayî hwd). bi vî awayî karên malê di navbera xwe de dabeş dikirin.

PEZBIR : Dawiya meha gulanê û despêka tîrmehê cewêzî hebû, ango dema pezbirê bû. Ev kar bi dorê dihat kirin. Di zomê de çend kerî hebûna her roj sê çar malan gazî nas û dostan dikirin û hiriya pezên xwe ya ku zêde li ser piştê wan kom bûyî bi cewan (meqesa mû û hirî birînê) dibirîn û ji vî karî re jî pezbir an jî cewêzî

dihat gotin. Dîsa dawiya tîrmehê berxşo hebû ango her kesî berxên xwe dişûştin da ku livaya (hiriya berxikan) wan paqij bibe. Piştî berxşoyê rojekî du rojan êdî dema berxbirê bû. Mîna pezbirê berxbir jî bi dorê dikirin û hirî û livaya ku jê dikirin difiro-tin bazirganan, an jî li gor pêwîstiyên xwe dikirin kulavên rûniştin û şivaniyê.

XWARIN: ji xwe wek tê zanîn xawrina koçeran piranî hilberîna wan bi xwe bû. Koçeran bêhtirîn xwarinên ji şîr mast, pin-car, goşt, nok, nîsk, garis, genim û hyd. çêdikirin. Kêm tiştên xwarinê dihatin kirîn, ji ber ku piraniya koçerên Cizîrê xwedî gund û erd bûn ji aliyekî ve ajalkarî, ji aliyê din ve çandinî jî dikirin. Lê ji ber ku nedikarîn ardê zêde bibin zozanan ev pêdiviya xwe ji gund û bajarên ku nêzikê zozanî ne pêk dianîn. Jixwe dikarim bibê-jim hema hema tenê pêdiviya bingehîn ard bû. Tenê ji genim danû, danûyê zîq, danûyê kutayî, savar, danhûr, ardikutlik, ardpîrsik û gelek cureyên din çêdikirin û bi van cureyên pêkhatî bi dehan cure xwarin dihatin çêkirin.

CIL Û BERG: Cilên herî xweşik em dikarin bibêjin cilên koçeran in. Taybetiyeke koçeran ew e ku çî jin be çî mêr be divê cilên wan fireh be ji ber ku bikaribin rihet tevbigerin. Jinên Koçer bi tevahî kiras, fistan xeftan, mêzer, hevalkiras, kutek, bin-kiras, kefiyên hemayî, cemedanî hwd. werdigirtin. Di nava xwe re jî kefiyeke hemayî girêdidan (piştbenk). Cilên mêran jî şelwar, kiras derpî, çakêt, qapût, êlek, şal û şapik, cemedanî, şotik, êmlek û gelek cureyên din bi kar tinin.

ÇÊKIRINA KULAVAN: Wek me li jor jî behsa tevnê kir, koçer berik û merşikên xwe jî bi honandin û dirûtinê çêdikirin. Ji bo koçeran yên herî girîng kulavên hirî ne. Kulav bi hiriya mih û berxan dihat çêkirin. Hirî ewilê ji aliyê qetqenjenan ve dihat jenandin da ku paqij bibe û tu tişt di nav de nemîne. Piştê hirî li ser cawekî an jî li ser berikekî wekhev dihat raxistin û hinek hiriya ku hatiye reng kirin wek nexş li ser

hiriya ku hatiye raxistin dineqîşandin û stûnek hûlî (şahîk) di nava wî re dirîj dikiirin cawê ku hirî li ser hatiye raxistin bi hiriye ve li stûn dipêçan ji bo ku caw neqete li nava kincekî stûr de xweşik dihat alandin û bi werîsekî qahîm dihat girêdan û keç û xortan didan ber pehînan û gindir (kaş) dikirin. Ji vî karê pêçana hiriye ya ji bo kulav çekirinê re “bor” dihat gotin. Bor li qada nava zomê de bi pehînan dihat gerandin. Keç û xortan xwe dikirin du bir li vî alî û li wî alî bor bi pehînan ber hev ve kaş dikirin heta ku wê hiriye xweşik hevdu bigirta wî karî dewam dikir. Dema bor gerandinê keç û xortan stran û bêlîteyên xwe yên herî xweş distran. Dema bawerî pê hat ku êdî ew hirî bûye kulav êdî bor dihat vekirin û kulav amade dibû.

DAWETÊN KOÇERAN: Koçeran dawetên xwe bi piranî bi dahol û zirne û bi erbanê dikirin. Yên ku xwediyê dawetê bûn qasidê xwe dişandin nava êla (eşîr) ku jê ne hemû mal û malbatên êlê di ezimandin û hin nas û dostên ku ji zome û êlên nêzik û cîran jî vedixwestin. Di dawetên koçeran de jin û mêr bi hev re destên hevdu digirtin û direqîşîn. Di dawetan de mêran şal û şapikên botanî werdigirtin û şelemên nexşandî li ser girêdidan û jinan jî kirasên kitanî û xeftanên botanî werdigirtin, piştbenkên hamayî yên gilovankirî li nava xwe dişidandin û mêzerên kixmerî yên şalikî di ser milê xwe de berdidan jêr, hinekan jî qutek di şûna mêzerê de werdigirtin. Carinan li ber dahol û zirnê carinan li ber erbanê û carinan jî li ber stran û bêlîteyên keç û xortan govend digirtin û direqîşîn. Bi vî awayî sê roj û sê şevan dawetan dom dikir. Her taştê, nîvro û şîvan bi dehan berx û karik serjê dikirin li ber dawetîyan rêz dikirin. Ji berî ku dawet dest pê bike rojekî ji aliyê mala zavê ve jinek ji bo desthenekirina bûkê dirêkîrin mala bûkê. Heçiyê ev kar dikirin ji wan re digotin pîresar an jî pîresêr (serşo). Jina ku diçû hinek xemîrok ji bi xwe re dibirin ji bo zarokên mala bavê bûkê, lê hêj jinik negihîyayî mala bûkê zarokên zomê kevir diavêtin jinikê û gelek caran bi vî awayî

serê serşoyê dişikandin. Roja duduyan xêlîvan bi hespan diçûn xêlî û bûk li hespekî boz siwar dikirin, çaxêliyek sor bi serê bûkê de berdidan xwarê yekê/i hevsarê hespê bûkê dikişand û dibirin mala zavê. Wexta bûk dianîn derê malê digot hûn tişteki binirx nedin min ez ji hêspê peya nabim û heta ku birazava an jî dê an bavê zavê zêrek, çelekek, an jî tişteki binirx nedayê peya nedibû. Roja sisêyan danê êvarî dawet bi dawî dibû û kesên ku hatine dawetê li gor dewlemendiya xwe her yekî/ê hinek pere an jî tişteki binirx datanîn sersoyiya xwediyê dawetê (ji pere û xelat dayîna dawetê re digotin “sersoyî”). Û bi vî awayî dawet bi dawî dibû.

CIHÊZÊ BÛKAN: Di koçeratê de cihêzên bûkan ji pêdiviyên demê re bûn, weke em bibêjin a herî sereke têra bûkê, her yekî du dest lihêf û doşek û balingî, kulavê raxistinê, perdeyên nexşkirî, her yekê çend kiras û fistan û xeftan û hwd. goreyên hirî, tentene, tûr, çelte, xurcîkzîn, şeleme, doxîn, destmehdik, werîs, teng, serhevsar, teşî, berank, xwêdank, şotik, doxhevsar, heban, çarîk, laçîk û gelek cureyên destxetên jinan weke cihêz bi xwe re dibirin.

Amadekar:

Enîse Şîrîn Çager – Salihê Kevirbirî

Mahmut Baksi: Nexşeya jiyana kurdewarî *
Salihê KEVIRBIRÎ


Mahmut Baksi û sê romanên cuda; ‘Hêlîn’,
‘Gundikê Dono’, ‘Serhildana Mala Eliyê Ünîs’
Azad ZAL

Du xalên girîng: Klasîk û nû û afirîneriyeke
çawa?
Yaqob Tîlermenî

Mahmut Baksi: “Evîna welat di dilê min de
ye”
Hevpeyvîn: Gabar Çiyan

Jiyana bi teqereq, mirineke bédeng
Helîm Yûsiv

Me bi kûraniya evîna te zanibû...
Kakşar Oremar



Ji kela Siphîyê heta Stockholmê axîneke ji kezebê:

Lawîkê Xerzî

Mahmut Baksi

Têkoşer, dildar û xebatkarekî azadiyê: Mahmut Baksi
Amed Çeko Jiyan

Axx! Axîn û ax û ax
Serwet DENÎZ

Ji kela Siphîyê heta Stockholmê axîneke ji kezebê: Lawikê Xerzî Mahmut Baksi

Jiyanhez, siyasetmedar, rojnameger, rewşenbîr û romanûsê kurd Mahmut Baksi di sala 1944'an de li gundê Siphî yê Hezoya navçeya Êlih'ê, li ser axeke kurdewar çavê xwe li jiyanê vekir û di 19'ê berfanbara 2000'î de bi bêhna jiyanê kurdewar lê li bajarekî biyanî (Stockholmê), di nav malkambaxiya sirgûniyê de çavên xwe li jiyanê rengîn girt û çû. Lê konê xwe di nav konan de, navê xwe di nav civatan de hişt û çû. Tevî ku gelek kar kiribûn jî hinek kar û hêviyên wî nîvco man. Pirtûka wî ya bi navê 'Serhildana Mala Eliyê Ūnis' ku piştî koçkirina wî hat weşandin jî mirov dikare bibêje mînakê yekê ye.

'Lawikê Xerzî' jiyanhezî û berxwedêriya kurdî di berhemên xwe de jî dide xuyakirin. Xwestiya ku di hemû qadên jiyanê de afirîner be. Heta ku enerjiya wî têr kiriye wî dest jî xebatê, ji jiyanê û ji kurdewariyê bernedaye.

Di wêjeya kurdî de Mahmut Baksi romanûs û wêjevanê qonaxeke nû ye. Piştî navbereke dirêj rê li ber romanûsiya nûjen vedike. Dema ku wî dest bi romanûsiyê kir li Bakur kes bi wî karî ranedibû. Haya kurdên Bakur zêde ji xebatên li Sovyeta berê û perçeyên welat ên din tune bû. Ji ber ku di van mercan de dest avêtîye kar û barên wêjeya kurdî (her çiqas li Ewropayê be jî) xwediyê taybetiyeke cuda ye.

Bi kar û xebat û jiyanê xwe ya kurdewar nivîskarekî klasîk, di nivîs û afirîneriya xwe de nûjen e. Mahmut Baksi "ji kela Siphîyê heta Stockholmê axîneke ji kezebê" ye. Ū ji ber van taybetmendiyên wî yên ku kesayetiya wî bi kurdewariyê dixemilînin û evîndariya wî ya bi xwezaya xwe re li sirgûnê jî xurt dike me xwest ku em wî di salvegera çûna wî de careke din bibîr binin û wî bi dosyeya bi navê 'Lawikê Xerzî' bikin mêvanê her wêjehezên kurd.

Em sipasiyên xwe pêşkêşî nivîskarên me yên hêja yên ku bi nivîsên xwe dosyeya me dewlemend kirine dikin...

Nizanim çiqas heqê min e ku li ser 'Hosteyê Edebiyata Kurmancî', li ser dildarê welatê bav û bapîran' gotina pêşgotinê binivîsim? Ez ê çawa ji bin wî barî derkevim nizanim, lê xwesteka nivîsandina 'Weşanxaneya Lîsê' bo pêşgotina kitêbên gorbihûşt Mahmut Baksi, rûmeteke bêhempa li min da peydakirin.

Helbet min li ser wî gelek caran, di gelek kovar û rojnameyan de; li ser şaşeyên Televîzyonê û mîkrofonên radyoyê nivîsiye û axivîme. Piraniya bîr û boçûnên min ên li ser wî, bîr û boçûnên hestiyarî bûn. Helbet min baş hay ji wêjeya wî ya dewlemend hebû. Lê bi rabûn, rûniştin, têkilîsazî, dilsozî û cihêrengiya xwe bandoreke mezin li ser min hiştibû...

Di jiyanê xwe ya 25 salan de yekem car ez ê derketima derveyê welêt. Destpêka sala 2000'î bû. Sedema derketina min -ku dê yekem car li balefirê siwar bibûma- serdana nivîskar, rojnameger Mahmut Baksi bû ku 30 sal bûn ji welatê xwe dûr hatibû hiştin. Çend sal berê min di xewna xwe de jî bidita, minê qet bawer nekira. Lê niha ez rê-

Mahmut Baksi: Nexşeya jiyana kurdewarî^(*)

Salihê KEVIRBIRÎ

wiyê ber bi 'Lawikê Xerzî' ve bûm. Yekem car min zimanê kurdî-kurmancî bi kitêba wî ya bi navê 'Gundikê Dono' nas kiribû. Destpêka sala 1991'an bû bawer im. Min li Edeneyê, li pola dawîn a lîseyê dixwend û li ofîsa parêzerê kurd Kazim Dere min ew pirtûk peyde kiribû. Bi rojan ji destê min neket kitêba navborî. Bi kurdiyeke ku mirov jê têr nedibû, hatibû nivîsandin. Piştî xwendina wê kitêbê, min soz dabû ku kurdiya xwe pêşdetir bibim. Niha dê bibûma mêvanê nivîskarê kitêba Gundikê Dono. Serpêhatiyên Hacî Zorav, Filito, Hesên Meysê û Zibeyrê Ehmê hê ji di bîra min de ne!..

Min romanên wî, nivîsên wî, şîroveyên wî yên televizyonê wekî 'kêş'ekî dadîqurtand! Ji ber ku min ê 'Nefesa Kela Sip-hiyê', li gorî baweriya xwe ew 'efsane' ji nêz ve bidîta, tebata min nedibû.

Di balfira 'Lufthansayê ku li Stenbolê siwar bûm de; tevî van hestan, li romana 'Serhildana Mala Eliyê Ünîs' -ku em ê li Stockholmê bi hev re amade bikin- fikirîm. 'Gelo ez ê bi ser bikevim?', her pîrsa di serê min de bû...

Piştî sekna du saetan li Balefîrgeha Frankfurtê, bi Balfira SAS'ê me berê xwe da Stockholmê paytext. Du saet paşê, balfîr li Balefîrgeha Arlandayê ku li derveyî Stockholmê ye danî. Ji Balefîrgehê tevî Ahmet Baksi û Bedrî Baksi em ber bi mala Mahmut Baksi bi rê ketin... Û va ye, piştî nîv saeta din, bi rûkeniya xwe û bi 'bi xêr hatin'a ji dil em li dîwana Mahmut Baksi ne...

Mala wî li taxa Skanstullê, li ser kolana Gotgatanê bû. Her dema rojê, ji mêvanan xalî nedibû. Di mala xwe ya ku ji mêvanên kurd, tirk, swêdiyan vala nedibû, civateke kurdewar saz kiribû. Bi civata xwe

ya xweş û kesayetiya nuk-tedan, mêvan dicoşandin. Bi rastî jî di odeya ku bi destê xwe raxistibû de, mirov xwe di dîwaneke dengbêjên Xerzan de dihesiband. Pîraniya civatan bi kurdî bûn. Carinan ji dengê Şakiro, carinan jî ji dengê Salihê Qubînî kilam dihatin guhdarîkirin. Bêhna xwarinên kurdî ku jê re dihatin çêkirin û şandin, li çarmedorê malê belav dibû. Li ser maseya li ber wî, bi dehan kitêb, kovar û nivîsarên rojnameyan ku hatine jêkirin, bal dikişandin ser xwe. Tevahiya wan li ser rewşa siyasî, çandî, aborî ya kurdan û tirkên bû. Ligel ku bi salan nexweş bû û her diçû nexweşîya wî lê sor dibû jî, bi qasî 'misqalê zere' nîşanî derdora xwe nedida. Wekî xortekî 14 salî ji aliyekî ve ji çend rojnameyan re gotar-nivîsar dinivîsand, ji aliyekî din ve jî bi heycaneke mezin hewl dida kitêbên xwe yên nîvco bibe serî û temam bike.

Di nav civaka kurdan de mirovekî ci-hêreng e Mahmut Baksi. Bi taybetî di nava entelektuelên kurdan de, yek ji kesên ku herî zêde dibû hingava êrişan bû. Bi qasî hezkiriyên wî hebûn, kesên jê nefret dikirin jî hebûn. Yarmet û alîkarê bi sedan rewşenbîr û nivîskarên ku hatibûn Swêdê, bû. Bi karê gelekên re rabû, kir ku di warê burokrasiya Îskandinavyayê de neperçiqin û rojek berî rojekê, jiyana wan tekûz bibe. Mixabin ku gelek caran wan kesan jî êriş bir ser wî.

Di demên wî yên dawîn de, di rojên ku êdî gelek nexweş bû de, li ba wî bûm. Di destpêka zivistanê û di destpêka havînê de du caran Xalo Baksi ez kirim mêvan. Nexweşîya wî giran bû. 'Felat'a wî tune bû. Lê pênc pere bi qûna nexweşiyê nedida!.. Lewre ji jiyane gelek hez dikir, mirin nedanî bîra xwe. Sedema ku ji ji-

yanê hez dikir, nivîsandina wî bixwe bû. Bi gav û saet dinivîsand. Dema nivîsareke wî di derekê de dihate weşandin, radihişt telefonê û derdora xwe agahdar dikir, digot; 'bixwî-nin'. Paşê jî ji wan şîrove dixwest.

Li gorî baweriya min, di nav kurmançîaxêv-nivîsaran de yek ji nivîskarên serreke bû. Xwediyê zarbêjiyeke ku mirov jê têr nedibû bû. Piraniya kilamên dengêjiyê yên sereke dizanibû û bi dengê xwe yê xweş distra. Vê yekê mirov bi awayekî eşkere di berhemên wî de dibîne. Her dem behsa rola medreseyan di wêjeya kurdî de dikir û payeyeke mezin dida vê kevneşopiyê: 'Em gelê kurd ji çavkaniyeke gelek xurt tên û ji kaniyeke gelek bi ços avê vedixwin. Gava em li rabirdûya xwe dinihêrin, em dibînin ku piştî me gelekî xurt e. Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî û Melayê Cizîrî heye ku ji bo berdwama kar û xebatên wan bangî me dikin. Melayê Batê heye ku 400 sal berê Mewlûda Kurmancî nivîsiye ku hê jî di nav kurdan de tê xwendin. Tevahiya van navên pîroz, nîrxên me yên edebî temsîl dikin. Çavkaniyên me ew in, em ji wan feyzê werdigirin. Me ji wan kesan mîrateke wisa wergirtiye ku heger ji sedî yek jî bê bikaranîn, wê berhemên bêhempa derkevin holê. Ne tenê wêjeya kurdî, her wisa ji wêjeya tirkî jî bi dehan kes hene ku ji van çavkanî û mîrateyan sûde werdigirin...' (*Beşek ji gotûbêja ku min di Tîrmeha 2000'î de li Stockholmê pê re kiribû*)

Mahmut Baksi, di jiyana xwe ya 56 salan de 23 kitêb diyarî me kirin. Kitêbên wî li 10 ziman-zaravayan hatin wergerandin. Di nava van berheman de mirov dibîne ku Baksi, kedeke mezin daye zarokên kurd û perwerdehiya

wan. Hê di sala 1978'an de, kitêba wî ya bi navê Zarokên Îhsan, bi zimanê kurdî û bi piştgiriya Wezareta Çandê li Swêdê hate çapkirin. Paşê kitêb, li dibistanên Swêdê di nava şagirtên kurd de hate xwendin. Li gorî bilêvkirina Baksi, ev yekem kitêba kurdên Bakur bû ku ji bo zarokan bi zimanê kurdî û alfabeya latînî hatibû nivîsandin. Salek paşê ji hêla heman wezaretê û dîsa bi zimanê kurdî Keça Kurd Zozan hat weşandin. Paşê bi zimanê swêdî hate çapkirin, bi awayê xêzefilm di televizyona swêdî de, wekî sê beş hat weşandin. Ev yekemîn xêzefîlma kurdî ye. Di sala 1986'an de, bi zaravayên soranî û kurmançî, di televizyona swêdî de derket pêşberî zarokên kurd.

Serdanên min ji bo wî -ku du caran bi qasî meh û nivê dom kir- ji bo nivîsandina kitêba wî ya dawîn Serhildana Mala Eliyê Ünîs bû. Heyecaneke mezin xwe lê pêçabû. Diyar dikir ku dê û bavê wî jê re gotine heta ew serpêhatiya Şerê Sasonê û Serhildana Mala Eliyê Ünîs nenivîse, ew tu caran wî helal nakin. Şev û roj me kar dikir. Dema ku kitêb temam bû, rahiştibû destê xwe û ji min re wiha gotibû: 'Êdî bi-mirim jî çavên min vekirî namînin!' Belê kitêb temam bûbû, lê bi awayeke çapkirî



nedît mixabin. Piştî vegera Stenbolê bi çend mehan Baksi xatirê xwe ji me xwest. Kitêb piştî mirina wî bi kurtedemekê ji nav Weşanên Welat ronahî dît...

‘Mirin dayika te bimore’ gotina wî bû...

Li ser mirina Yilmaz Guney gotibû. Ev gotin çiqas lê hatibû.

Rojek hat, min pirsî, hunermendê qerase Şivan Perwer li ser hevalê xwe yê qedîm wiha gotibû: ‘Mahmut Baksi, Nexşeya jiyanê... Pir baş bû, pir xerab bû! Pir modern bû, pir klasîk bû... Her tiştê wî ketibû nav hev... Lê bi her awayî delal bû... Mirovekî wekî wî êdî tune ye, mixabin nabînim... Terka min kir û çû...! Dîsa min ji Şivan Perwer, pirsî ‘Stockholm’ê kiribû ka ji bo wî çi îfade dike. Ev bersiv jî bi Baksi ve girêdayî bû: ‘Cihê ku min piraniya jiyanê xwe lê derbas kir. Bajarê ku min piraniya xebatên xwe lê kirin. Û bajarê sar ê ku hevalê min ê herî nêzîk Mahmut Baksi tine bîra min!..’

Rast e terka me kir lê terkeseeriyêke fizîkî...


Bi Gundikê Dono, bi Hêlîn, bi Lawikê Xerzî her bi me re ye û her di dilê me de ye...

Têbînî :

(*) Pêşgotina çapa nû ya kitêba Mahmut Baksi ya bi navê ‘Hêlîn’ ku li Diyarbekirê ji hêla ‘Weşanên Lîs’ê ve hatiye weşandin (S.K.)...

Destpêk:

Min cara pêşîn navê Mahmut Baksi li ser pirtûka bi navê “Şivan’ın Sevdası⁽¹⁾” dît; û dema ku min ew pirtûk xwend min qet ew nas nedikir. Ya sala 1990, ya jî sala 1991’an bû. Bi tenê min dizanibû ku ew pirtûk ji aliyê Mahmut Baksi ve hatiye nivisandin û bi qasî ku tê bîra min; an min hindek ji kurtejiyana wî li ser pirtûkê xwendibû, yan jî min ji yekî pirsibû ku ew kî ye û bi wî awayî ez hîn bûbûm ku



nivîskarekî kurd e û li Swêdê dijî... Herî zêde jî Baksi di hişê min de mabû, wê demê ez gelek fikiribûm ku ev peyva ‘Baksi⁽²⁾’ tê çi wateyê, yan jî ev “paşnavê ecêb ku mirov tê dernaxe ka tê çi wateyê” jî ku tê. Bi rastî ez hê jî nizanim ka “Baksi” jî ku tê û tê çi wateyê?

Ez niha dikim nakim nayê bîra min ku agahiyên di derbarê jiyanê wî ya ku wê çaxê min xwendibû an jî hîn kiribû binivîsim. Ji ber wê jî divê ku min li hinek çavkaniyan mêze bikira û kurtejiyana wî bîaniya bîra xwe. Belê di çavkaniyan de wiha derbas dibe.

Kurtejiyana Mahmut Baksi:

Mahmut Baksi, di sala 1944’an de li gundê Siphîyê ku bi Hezoya navçeya Êlihê ve girêdayî ye hatiye dinê. Dibistana Mamostetiyê dixwîne û bêtir ku biqedîne dev jê ber dide û dest bi rojnamegeriyê dike. Di rojnameya bi navê ‘Batman

Mahmut Baksi û sê romanên cuda:

“Hêlîn”,

“Gundikê Dono”,

“Serhildana Mala Eliyê Ünîs”

Azad ZAL

Gazetesi’ de dixebite (1967). Demekê serokatîya TÎP’ê ya Êlihê dike. Di wan deman de romana wî ya bi navê ‘Mezra Botan⁽³⁾’ (bi tirkî ye) derdikeve (1969). Ev romana wî ya yekemîn e. Ew sendîkavaniyê jî dike. Hem ji ber ku kurdperwer e û hem jî ji ber ku bi nivîs û pirtûkên xwe fikr û ramanên wekhevî û welatperweriya kurdî tîne ziman doz lê tê vekirin û 15 sal cezayê hepsê lê tê birîn (1970). Ji ber ku ceza lê tê birîn berê xwe dide welatên xerîbiyê û êdî dibe penaber. Pêşiyê li Almanyayê dimîne şûnde jî derbasî Swêdê dibe (1971). Piştî ku li Swêdê bi cî dibe êdî bi awayekî profesyonelî karê nivîskariyê dike. Nivîs û berhemên ku afirandiye di çarçoveya bajeneke berfireh de ne. Wî bi 3 zimanan 23 pirtûk nivîsandiye. Ango bi kurdî, tirkî û swêdî roman, çîrok, nirxandinên siyasî û hunerî, lêkolînên dokumanterî nivîsandiye. Dema ku di 19’ê Berfanbara 2000’î de ji ber êş û elema penaberiye û derd û kulên hesreta welat û bindestiyê jiyana xwe ji dest dide li dû xwe kesayetiyeke siyasî, welatperwer û wêjeyî dihêle.

Berhemên Baksi yên wêjeyî:

Berhemên wî yên ku kesayetiya wî ya wêjeyî derînin holê romanên wî yên berbiçav in. Ew jî romana Mezra Botan, Zarokên Îhsan, Keça Kurd Zozan, Hêlîn û Gundikê Dono ne.

Nikolay Gavriloviç Çernîşevskî⁽⁴⁾ di romana xwe ya bi navê ‘Nasil Yapmalı?’ (Ji ber ku min ev pirtûk bi tirkî xwendiyê ez navê wê yê bi tirkî dibêjim) de dibêje ku (bi lehengê xwe dide gotin) “her nivîskarek



bi berhemeke xwe hebûna xwe ya wêjeyî, fikr û ramanên xwe yên bingeîn tîne ziman. Çend berhemên nivîskêr hebin jî di nava wan de yeka sereke heye ku ew jî fikr û ramanên nivîskêr îfade dike. Ango ku tu bixwazî Turgenyev⁽⁵⁾ fam bikî romana wî ya bi navê “Bav û Law” bixwînî bes e; ya jî tu bixwazî Tolstoy⁽⁶⁾ fam bikî “Şer û Aşiti” ya wî bixwînî û hwd. jî bi vî rengî tu dikarî nas bikî. Îcab nake ku tu dema xwe bi berhemên din derbas bikî.” Ango tiştê ku dixwaze bibêje her nivîskarek bi berhemeke xwe ya sereke heye. Ev çiqas rast e yan jî ne rast e ez nizanim lê ez ji gelek aliyan ve tev li vê dîtina Çernîşevskî dibim.

Nivîskarê me Mahmut Baksi jî bi ber-

hemên xwe yên ku hene (romanên wî) çiqas vê rastiyê îfade dike ez nizanim. Bi tenê di berhemeke xwe de fikr û ramanên xwe aniye ziman yan jî nêrîn û fikr û ramanên xwe li hemû berhemên xwe belav kiriye yan jî nekiriye ez nizanim. Lewre min hemû berhemên wî, bi taybetî romanên wî nexwendine. Lê ez ê ji aliyê kirde (*sûbje*), bûyer, cî, dem û ziman (zar, vegotin) ve sê romanên wî bidim ber hev û li gorî wê bigihîjim encamekê.

Hêlîn, Gundikê Dono û Serhildana Mala Eliyê Ünîs... Pêşiyê yek bi yek ka çawan in em li wan binêrin.

1- Hêlîn⁽⁷⁾: Ev roman ji 19 beşan pêk tê. Bi çavê keçeke kurd ji bûyînê heta penaberiyê (ango ji welat dûrketinê / yan jî mirinê) merhaleyên ku derbas kiriye yek bi yek tene ziman.

Naverok: Çîrok li gund di zikê dê de dest pê dike. Pêşiyê bi nakokiya zayendî, serdestiya mêran li ser jinan (*cudahiya keç û lawan*) dest pê dike. (*Di zikê dê de xurtiya Azad, lawaziya Hêlînê*). Piştî vê, nakokiya astî; xwenda û nexwenda, zanîn û nezani, feqîrî û dewlemendî xuya dikin. Şûnde nakokiya çînî dertê meydanê. Paşê jî nakokiya neteweyî/gelêrî û bindestiya gelê kurd aşkera dibe. Îşkence, girtin, zindan, firarî, rev, mayîn, sînoren li ser welatê kurdan, dîsa rev û penaberî... Di çavê lehenga romanê (*Hêlîn*) de penaberî mirin bi xwe ye. Her tişt di nêrînên leheng de li ber lêpirsinê ne.

Vegotin: Vegotina bûyeran, çîrok ji hundir ve tê gotin. Xwendevan di nava çîrokê û bûyeran de ye. Ê/a ku bûyeran dijî xwendevan bi xwe ye.


Navê lehenga romanê Hêlîn e. Ji devê Hêlînê ango ji devê kesa yekemîn bûyer

tene ziman û çîrok tê vegotin. Xwendevan her tim bi Hêlînê re ye û bûyeran beriya ku pêk bîn dibîne û hîs dike, ji gelek tiştan agahdar e. Xwendevan bi Hêlînê re di nava meraqê de ye, Hêlîn bi hişkî rihet û sakîn bûyeran tîne ziman.

Honandin bêtir bi awayekî yekaheng û bûyer li ser bûyerê tê. Bûyer ji hev birandî ne, lê li dû hev rêzkirî ne. Kronolojiya bûyeran bi kronolojiya jiyana Hêlînê re di ritmekê de ye. Hêlîn ji aliyekî de li her tiştî dipirse (*nakokiya Hêlîn û birayê wê Azad; şoreşgeriya bavê Hêlînê û nêzikahiya ne wekhev a wî ya li hember wê û birayê wê Azad û yd.*) ji aliyê din ve Hêlîn car caran di rastiya jiyane de di vê lêpirsinê de dixitime. Her tim di nava red û pejiirînê de diçe û tê û serkeftin tune ye. Lê bawerî û hêvî her tim di hiş û dilê leheng/Hêlînê de heye ku ew ê azadî bibe para wê û gelê wê jî.

Nêzikahiyên wêjeyî: Di vê romanê de ji aliyê honandinê ve humanîzm heye û hinek jî bêhna klasîzmê jê tê. Ji aliyê vegotinê ve natûra-lîzm, ji aliyê vekolandina pirsgerêkên zayendî, civakî û çareserîya wan ve tespîta bêencamiyê heye. Wekî ser-pêhatî hatiye ziman. Dişibe rojane yan jî serpêhatiyên keçeke darbezede ya ku bavê wê hem mamosteyê dewletê bûye û hem jî li hember dewletê di nava tevgerên veşarî decîgirtiye.

Ziman: Zimanê romanê pir zelal û sade ye. Gelek hêsan û rihet e. Vegotin bi çîrok û fablan hatiye dewlemendkirin. (*Çîroka Xwedê û tûtikê, ya kerê û dawetê...*) Di romanê de pergala ziman gelek durist e. Nivîskar di zimanê xwe de serkeftî ye û nermik û herikbar e. Bûyer gelek tund û dijwar in, lê di ziman de dijwarî û tundî tune ye. Di vegotinê û zi-



manê nivîskêr de tundî nerm dibe, dihele û hinek jî şîrînokî dibe. Ji ber ji devê ke-çikekê hatiye gotin vegotin û şeweyê vegotinê mê ye.

Cî: Di romanê de mekan guherbar e. Her tim li gorî kronolojiya bûyeran cî jî diguhere.

2- Gundikê Dono⁽⁸⁾: Ev roman ji 15 beşên bi hev ve girêdayî pêk tê û 107 rûpel e. (*Di çapa Lîsê de 94 rûpel e.*)

Beşa yekemîn: Teswîra xwezaya gund (li *Xerzan rewşa biharê*) û di nava wan teswîran de bûyerekê (*bi berhevdayîna du kûsiyên çolê*) dide ber bala xwendevan û bi wê bûyerê re her du serlehangên romanê (*Aso û Bedo*) derdikevin pêşiya xwendevan. Xwendevan ji devê her du serlehangên lehengên din û rewşa wan jî (*zora Hacî Zorav, qelendxwestina bavê Asoyê, Perîxanê û Salo*) hîn dibe. Di vê beşê de mîstîsîzma rojhilatî, amûr û bûyerên mîtolojîk (*dîtina mar û bêoxiriya marê reş*) jî tîrîşaretîkirin.

Em di vir de dibînin ku ev beş bi xwe çirokek e, di beşê de naverokeke bi ser û bin heye. Beş bi serê xwe temayekê îfade dike. Di çend rûpelên pêşîn de armanca nivîskar derdikeve meydana, xwendevan he-mû îşaretan dibîne. Nivîskar di serî de nava xwe û xwendevan xweş dike û jê re dibêje: ‘bi kin û kurtî mesele ev e lê tu min bişopîne!’


Beşa duduyan: Di vê beşê de gundî û jiyana gundewar a wan gundiyan (*Perîxanê û Aso dikevin rola jin û mîrê modern û bala keçên gund dikişînin ser xwe*) der tê pêşiya xwendevan. Di vir de leheng tevî kiryarên xwe û taybetmendiyên xwe dertên meydana. Jiyana bajêr û jiyana gund, nakokiya navbera her du alîyan de aşkera

dibe. Di vê beşê de teswîr di dawiyê de cî digire û bi teswîra gund re trajediya navbera gelan (*nakokiya navbera kurd û ermenîyan û bêbextiya Roma Reş*) dertê meydana.

Beşa sisê û çaran: Di beşa sisîyan de xwendevan bi tevahî dikeve nava jiyana gund. Êdî xwendevan bi gundiyan re li ber camîyan, li nava malan e, bi gotinên wan dizane. Hînî şewê û nêzikahiyên wan bûye. Kîjan jî wan di kîjan pozîsyonê de ye dertê meydana. Ango wêne dertên pêşiya xwendevan. Di beşa çaran de êdî kî jî ku hatiye divê bê zanîn û bi rengê berdevamiya beşa sisîyan xwendevan berê xwe dide dîroka lehengan. Bi danasîna qerekerê lehengan re analîza çînî ya serdestî û bindestiyê û xapandina serdestan, rê û rêçikên wan tê deşîfrekirin. (*Hacî Zorav û axatiya wî û kirinên bav û kalên wî*).

Beşa pênc, şeş, heft, heşt û heta ya sêzdeyan: Heta vîra nivîskar nakokiyan nîşan dide û dubendiyên di navbera çîn û qatan de bi tenê dixuyên. Nakokiyan çînî sor bûne li benda çirûskekê agir in. Di beşa pêncan de êdî fitîl bi bûyerekê çik dide û fitîla agir vedikeve. (*Her sê hewiyên hev, jinên Hacî Zorav diçin Asoyê ji Hacî Zorav re dixwazin.*) Bi pêketina agir şerê navbera çînan dest pê dike. Her kes xwe li gorî pozîsyona xwe bi cî dike. Nediya di rewşa tu lehengekî/ê de tune ye, namîne. Rastiya tund li ber çavan e. Her kes bi her kesî/ê hesiyaye. (*Hacî Zorav axa ye û zalim e, Filîto feqîr û bindest e û dijberê Hacî Zorav e...*) Şerê navbera wan li dar ketiye, lê hê di nava hev de ne.

Têkiliya navbera serdest û bindestan heta ciyekî didome. Di ciyekî de zirav dibe û diqete. Ji hev vediqetin û şerê navbera



wan gurtir dibe. (*Neqebûlkirina Asoyê, gu-nikobûna Hacî Zorav, zilma li ser gundi-yan, kuştina çend peyayan, reva Asoyê û hatina Bedo*) Her kes li sefên xwe ne û bi hev dişêwirin. Di vir de tiştekî balkêş heye, yên bindest (*gundî*) bi safibûna sefan bêtir hev digirin û yekîtiya wan çêdibe; lê yên serdest (*axa û beg û şêx*) bi hev re nikarin yekîtiyekê ava bikin û di navbera wan de nakokî dertên.

Beşên Çardeh û Pazdehan: Di beşên dawîn ên 14 û 15'an de êdî final e. Di ya 14'an de final bi devê lehengan tê gotin. (*Gotinên Cemilê Çeto: Bext ji qelsiyê tê, axatî birakuj e.... Dîsa ji devê Zibeyrê Ehmê gazin û lome tene ziman*). Lîstikek bi dawî dibe û ji bo lîstikeke din heta merc guncaw bibin ew ê çerxa dîrokê bigere. Her çiqas gazin hebin jî di finala finalê de hêviyeke xurt û mezin (*lê gelek dûr*) heye. Ev hêvî hêviya nivîskar bi xwe ye.

Naverok: Di romanê de em çerxa civakî dibînin. Dînamîzma civakî bi nakokî û şerê navbera çinan pêk tê. Di vê rastiye de qehremanên civakê hene. Ev qehremanên civakê di demên herî tund û dijwar de dertên. Sorbûna navbera çinan, agirê navbera çinan geş dikin û pê re dibin qurban. Qehremanên civakê yan dimirin, an tînin kuştin an jî wenda dibin. (*Di romanê de Filîto ye û tînin kuştin*.) Bi qurbanbûna qehreman re her tişt li ciyê xwe rûdinê, her kes vedikişê ciyê xwe, jiyana xwe ya normal didomîne, heta ku dîsa nakokî germ dibin.

Vegotin: Vegotina bûyeran, çîrok ji derve de tînin gotin. Xwendevan ne di nava çîrokê û bûyeran de ye. Xwendevan her tim ji derve her tiştî dibîne û ji her tiştî agahdar e. Ne di nava meraqê de ye, bi hişkî aram û sakîn bûyeran dişopîne, çîrokê dibîne.

Nêzikahiyên wêjeyî: Di vê romanê de ji aliyê honandinê ve klasîzm, ji aliyê vegotinê ve natûralîzm, ji aliyê vekolandinê ve pirs-girêkên civakî û çareserîya wan ve romantîzm, (*di vir de hinek dişibe romantîzma Viktor Hûgo⁽⁹⁾*), ji aliyê rewş û pozîsyona lehengan ve realîzm (*hinek dişibe realîzma Tolstoy⁽¹⁰⁾ û Dostoyevsky⁽¹¹⁾*) heye. Her wiha ji aliyekî ve mîstîsîzm xuya ye û hinek şopên epîkî jî hene.



Ziman: Zimanê romanê pir zelal û sade ye. Gelek hêsan û rihet e. Vegotin wek xeberoşkên civatan e, lê pergala ziman û lihevanîna amûr û yekeyên ziman bi serkeftinî hatiye bikaranîn. Nivîskar di zimanê xwe de serkeftî ye û nermik û herikbar e.

Cî: Di romanê de mekan diyar in û bûyer li gund derbas dibin. Gund, çiya, newal, çem, gol bi rewşa xwe ya xwezayî di çîrokê de cihê xwe digirin. Bajêr, mekanên bajêrî zêde berbiçav nînin, bi tenê di gotinên lehengan de derbas dibin.

3- Serhildana Mala Eliyê Ünîs⁽¹²⁾: Roman ji 19 beşan pêk tê. Di serî de Mehmed Uzun ji bo pirtûkê û li ser wefata Baksi û amadekirina pirtûkê nivîsek nivîsiye. Paşê jî pêşgotina Baksi heye. 19 beşên romanê jî li ser serhildanê ne. Di dawiyê de kurtedîroka serhildanê kurdan heye.

Naverok: Ev pirtûk ji romanê bêtir wekî xebateke dokumenterî ya dîroka nêzik e. Belê wekî roman hatiye binavkirin û honandin hinek bi rengê romanê hatiye kirin, lê ji dîroka Serhildana Mala Eliyê Ünîs wêdetir tiştek nînin e. Ku romana dîrokî bûya diviyabû ku hinek cudatir bûya. Ez di wê baweriyê de me ku nivîskar ji bo bidawîkirina pirtûkê bi lezgîni tevgeriyaye. Ji ber ku nexweş bûye û dizanibûye dema koçkirina wî nêz e;

lewma lez kiriye û ji aliyê romanê ve gelek kêr maye. Wek roman gelek qels xuya ye. Mirov di pêşgotina pirtûkê de û di nivîsa Mehmed Uzun de tê derdixe ku belge hatine berhevkirin û lêkolîn hatiye kirin; lê temenê nivîskar têr nekiriye ku bi rengê romanekê bêtir li ser hûr bibe û bihone. Û ji xwe bi qedandina romanê re nivîskar diçe ser dilovaniya xwe û piştî wefata wî pirtûk tê çapkirin.

Vegotin: Vegotina serhildanê û bûyerên ku pêk tên ji derve de tên gotin. Ji aliyê lihevanîne û honandinê ve qelsî hene, nexweşîn û lezgîniya nivîskar li vegotinê ji bandor kiriye. Ji vegotina romanê bêtir wekî vegotina pirtûkeke dîrokî ye.

Ziman: Zimanê pirtûkê zelal û sade ye. Lê nivîskar di zimanê xwe de wekî her du romanên din serkeftî xuya nake.

Cî: Navenda bûyeran dîsa Xerzan e. Ev jî wek aliyên din hinek qels xuya ye.

Encam:

Gava ku mirov her sê romanên bide ber hev wekî sê şaxên dakeşî xuya dikin. Yek jê hê şaxa teze û nû be; ya din mezin bûbe û hinek xweşik û baş bûbe; ya dawîn jî hê negihîştibe xemla xwe û ber bi hişkbûn û ziwabûnê ve biçe.

Pirtûk bi taybetî ji aliyê ziman û tesawirê ve nivîskarê xwe didin dest û serkeftinê heye. Di Hêlinê de trenda wêjeyî û romanûsiyê bilind e û li dû xwe îşaretên romaneke xurtir di xwe de dihevine. Hêlin li dû xwe Gundikê Dono tîne. Gundikê Dono jî hem reng hem jî dengê cuda û xweştir dide nivîsbariya Baksi. Li gorî baweriya min ev reng û dengê cuda û nû di nivîsbariya kurdî de jî

(li gorî dema xwe) merhaleyeke nû ye. Bi Gundikê Dono re hêviya romanûsiyek xurtir ji nivîskar tê kirin; lê ew hêvî di Serhildana Mala Eliyê Ünîs de tune ye. Serhildana Mala Eliyê Ünîs jî ber ku bi bînfrehî nayê nivisandin (*dibe qurbana nexweşînê û temenê derengmayî*) trenda bilind a romanûsiya Baksi di carekê de dadixe dereceyên jêr. Ji bêderfetî wekî pêşnûmaya romanekê maye. Baweriya min ew e ku Baksi bizanibûya ew ê salek an jî du salên din jî bijî ew ê ev pêşnûma bi rengê romaneke girseyî bihonanda û hêna biweşanda.

Wêjevaniya Baksi bi serê xwe hinek kêr û qels dimîne. Lê dema ku mirov wêjevaniya wî bi kesayetiya wî ya komple re dinirxîne xurtiya aliyê wî yê wêjevaniyê der tê meydanê. Ji aliyekî ve têkoşerî û siyasetmedarî, ji aliyê din ve wêjevanî, muzîk, sînema û aliyên wî yên din...

Dema ku aliyên rêxistinî, siyasî, hunerî, wêjeyî yên kesayetiya mirovekê/î hebin li gorî tevger û baldariya kes jî vana yek dertê pêş û dibe aliyê sereke. Kesên wekî Leonardo da Vinci⁽¹³⁾ (*gelek aliyên wî yên din hene lê di wêneçêkeriyê de li pêş e*); William Shakespeare⁽¹⁴⁾ (*bi gelek aliyên xwe berhem daye lê nivîsbariya wî ya şanoyan li pêş e*) her wiha gelek siyasetmedar hene ku ji aliyên dinê ve jî pêşketî ne lê di siyasetê de serkeftitir in. Gava ku aliyek derê pêş kesayetiya komple heta dawîya temenê xwe pêş de diçe. Lê gava ku ev aliyên hanê di kesayetiya komple de hevotr bihêlin û dem bi dem her carê yek derê pêş wê demê pêşdeçûyîn lawaz dibe. Ji min tirê kesayetiya Baksi jî bi taybetî aliyê wî yê wêjeyî ji ber wî awayî her çûye trenda pêşdeçûnê daketiye.

Romana Hêlinê romaneke romanûsiya



dema zarokatîyê, Gundikê Dono ya dema ciwaniyê, Serhildana Mala Eliyê ûnis ya dema demnemayînê ye. Li gorî min romana sereke ya Mahmut Baksi Gundikê Dono ye. Mirov dikare herî baş bi Gundikê Dono Mahmut Baksi nas bike...

Têbînî :

⁽¹⁾ Şivan'in Sevdası; Pirtûka Baksi ya li ser Şivan Perwer e. Bi Tirkî ye. Ji nav Weşanên Logosê derçûye.

⁽²⁾ Baksi, wekî peyv di wateya kam, an jî şaman de ye. Kesê ku bi kopuzê re îlahî û helbestan dibêje. Di wateya zana, hekîm de tê bikaranîn. Begşî, beşşî, baksi.

⁽³⁾ Mezra botan, roman e. Pirtûka Baksi ya pêşîn e. Weşanên Dost, 1969, 80 rûpel e.

⁽⁴⁾ Nikolay Gavriloviç Çernişevski (1828-1889) şoreşger û demokratê Rûs, filozof, kritisyen û sosyalistê utopist e navdar e. Di sala 1863'yan de sirgûnî Petropavlovskê dibe. Di zindana Petropavlovskê de di nava 4 mehan de (ji 4'ê Berfanbara 1862'yan heta 4'ê Avrêla 1863'yan) vî pirtûkê dinivîse. Çernişevski bi vî romana xwe li ser ciwanên Rûsyayê bandoreke mezin dihêle. Demeke dirêj wekî çavkaniya perwerdehiyê tê bikaranîn.

⁽⁵⁾ İvan Sergeyeviç Turgenyev (1819-1883), nivîskar û romanûsê navdar ê rûs e. Bi romana xwe ya bi navê Bav û Law navdar e û bi vî romanê bingeha Nihilîzmê datîne û di kesayetiya Bazarov de dertîne meydanê.

⁽⁶⁾ Lev Nikolayeviç Tolstoy (1828-1910) Yek ji nivîskarê herî mezin ê rûs e. Di qada ramangerî, perwerde û hunerê de navdar e. Bi romanên xwe yên wekî "Vejin, Şer û Aştî, Anna Karenina" tê nasîn.

⁽⁷⁾ Hêlin; Romana Mahmut Baksi; Weşanên Lîs (Amed - 2008)

⁽⁸⁾ Gundikê Dono; Romana Mahmut Baksi; Weşanên Orfeus (1988), Weşanên Lîs (Amed - 2008)

⁽⁹⁾ Victor-Marie Hugo (1802- 1885) Nivîskar, helbestvan û siyasîmedarê firansî. Bi romana xwe ya bi navê Ên Sefîl navdar e.

⁽¹⁰⁾ Bnr: Lev Nikolayeviç Tolstoy

⁽¹¹⁾ Fyodor Mihayloviç Dostoyevsky (1821-1881) Yek ji nivîskarê rûs ê herî mezin û navdar e. Romanûsê herî mezin tê hesibandin. Bi romana xwe ya bi navê Sûc û Ceza (1866) tê nasîn.

⁽¹²⁾ Serhildana Mala Eliyê ûnis; Weşanên Welat (Stenbol - 2001). Ev roman piştî ku Mahmut Baksi rehmet dike, ji aliyê Salihê Kevirbirî û Mehmed Uzun ve tê duristkirin û ji nav Weşanên Welat derdixe. Baksi romana xwe diqedîne lê nabîne ku tê weşandin.

⁽¹³⁾ Leonardo di ser Piero da Vinci (1452-1519), mîmar, endezyar, mûcid, matematikzan, anatomist, muzisyen, peykertirash, wêneçêkerê navdar yê îtalî ye. Bi tabloya xwe ya bi navê Mona Lisa navdar e. Hunermendê herî mezin ê dunyayê tê hesibandin.

⁽¹⁴⁾ William Shakespeare (1564-1616) Helbestvan û nivîskarê inglîz e. Bi listikên xwe yên şanoyê yên wekî Hamlet, Romeo û Juliet û yên din navdar e.

Bi gelemperî nivîskarên afirîner ew kes in ku li hemberî vegotinên kevneşopî radibin û vegotinên cihêreng di qada wêjeyê de ava dikin. Ango bi rengên xwe, bi dengên xwe tev li erdnîgariya nivîsînê dibin ku ew kes di heman katê de şoreşa xwe jî pêk tînin. Wê çaxê ku nivîskar bi pênuşa xwe li derveyî vegotina hikumkar, vehûnandina rasterast a bûyerî, şayesandina dengê hertiştzan derkeve rê û rê û dirbên heyî li dû xwe bihêle, mirov dikare wê pênuşê weke pênuşa afirîner bi nav bike. Ji lewre tiştêkî herî zor ew e ku mirov bikaribe xwendekaran ji hînbûnê wan ên berê dûr bixe. Çinku xwendekar demên dûdirêj li gora têgehên ezber û qalibên heyî diramin û di taqên pîvana çarçoveyên wan diyar re li dimenên derdora xwe dinihêrin. Îcar dema ku xwendekar li pêşanî ango li deqeke li derveyî van ezberan rast tê, di serî de yekser li dijî vî heyînê derdikeve; ji bilî kirasê li ser xwe tu kirasekî dîtir li xwe nake û dema ku ji bêgavî wî kirasî dikişîne ser bejna xwe jî, dixwaze li ser xwe biçirîne, çinku jê re teng tê ev kiras. Yanî kesên ku qaliban dişkênin, nikarin di cara pêşîn de ji hêla her kesî/ê ve werin pejirandin. Jixwe kesên afirîner tu xemeke wan a bi vî awayî tune ye jî, derdê wan ê yekemîn ew e ku xwe bi awayê herî baş bikaribe vebeşin e. Tûrikê xwe bi tîp, deng, beje, hevok û rûpelên nivîsbar dagirin û ji wan navgînan fêkiyên heftber diyarî xwendekaran bike.

Du xalên girîng:

Klasîk û nû û afirîneriyeke çawa?

Yaqob Tîlmermênî

Nivîskarê afirîner di serê pêşîn de ji tûrikê xwe lehengên nebextewar derdixe. Ji lewre çawa ku di wênesaziyê de wêneyê bextewariyê nayê nîgarkirin, di wêjeyê de jî mirovên bextewar bi ruh û can nabin. Ev xal di sedsala nozdemîn de ji hêla romanûsê ûris, Lev Tolstoy hatiye pesendkirin û weke jênageriyeke di her serdemên nivîsînê de cî girtiye. Berhema Tolstoy a klasîk û pirhêl, Anna Karenîna şahid e ji vê aşkerakirinê re ku roman li ser jiyana kîjan lehengan bilind dibe. Romana Anna Karenîna bi vê hevokê dest pê dike: “Hemû malbatên bextewar dişibin hevdu, lê her malbata bedbext xwedî taybetiyeke bedbext e.” Ji hevoka destpêkê ya romanê jî diyar e ku lehengên nebextewar û bedbext bi çîrokên xwe yên belengazî û serhildêriyê her yek bi awayekî derdikevin pêşberî xwendekêr. Romaneke ku bi hevokê wiha ronîker dest pê bike, ev roman di kîjan serdemê de hatibe nivîsandin jî dê di serê pêşîn de xwendekarên xwedîezber şaşwaz bike û bi wan bide hînkirin ku ew li ber deriyekî nûjen rawestiyane. Û divê xwendekarên xwedîezber hemû hînbûnên di daw û delingên xwe de li ber derî vala bikin û bi vî hawî derbasî hundir bibin; naxwe dê ji ber derî bi paş ve vegerin û tew dê ligel çend kesan werin wî deriyî bidin ber keviran.

Dema ku min romana Mahmut Baksî ya bi navê Gundikê Dono berî salên 2000î ji çapa wê ya li Ewropayê xwend, wê çaxê min yekser fam kiribû ku ez li ber deriyekî nû –ne nûjen- rawestiyame. Çinku romanê bi qasî du rûpelan bi şayesandina Gundikê Dono xwendekar mijûl dikirin. Û jixwe ev şêwe vegotina bi şayesî ji bo min ne destpêkeke nû bû, lê xweş bû. Min berê ji romanên li ser jiyana

gundewariyê ji romanên nivîskarên tirk xwendibûn. Û jixwe ew romanûs jî bi wan romanên xwe weke nivîskarên serdemekê dihatin binavkirin. Belê di kurdî de û di romana kurdî de herikbariyeke bi vî şêweyî ez anîbûm ber deriyekî nû. Ez dudilî bûbûm; an min ê hînbûnên xwe yên berê ji daw û delingên xwe li ber derî vala bikira ango min ê bi ezberên xwe yên berê gaveke nû bavêta hundir. Û jixwe min gav avêtibû hundir bêtî ku barê ser xwe sivik bikim; lê hundir tarî bû û zilûmatê fersenda pêşveçûyînê nedabû min. Çinku şaşwaziya ku divê ez li ber derî bi jiyama, di rûpela sisêyan a romanê de derketibû pêşiya min û ez sergêj kiribûm: “Li ser rê, çavên Asoyê li du kîsoyan ketin. Kîsoyê nêr xwe dabû pişt kîsoya mê û ew daf dida. Lê kîsoya mê bi neynûkên xwe erdê diquncirand û nediçû. Kîsoyê nêr lê hêrs dibû û êriş dibir serê. Teqereq ji qalikên wan bilind dibû. Kîsoya mê çeka xwe evînê baş bi kar dianî...” (Rûp:11). Destpêka ku ez lê digeriyam ev bû. Çongên min jixweber difisiyan û dawa min jixweber valayî erdê dibû. Hevokên ku li dû hev dimena ku lehenga romanê, Aso lê dibû şahid rêz dibûn û xwezî bi mirov re çêdikir ku ew der serê romanê bûya. Ji lewre dê ev der bi xwendekar (min) bida famkirin ku ew li ber deriyê nûjen e. Çinku romana nûjen û cihêreng û li derveyî regezên heyî hîna di serî de bi vegotina xwe, bi min dida ferzkirin ku ew ê li gora honakeke resen biherike cihaneke dîtir.

Ger mirov berdewamiya dimena bannandina kîsoyan bixwîne dê bibîne ku kakil û nişaya romanê di vê dimenê de hatiye bicihkirin. Jixwe di herikîna romanê de cî bi cî nivîskar vê dimenê tîne bîra xwendekar û pê dide hîskirin ku ew

romaneke çawa dixwîne. Dema ku hewiya Asoyê, Xanima Boşatî li dû şeva zîfafê ligel hewiyên din li ser serê wê rawestiyan û halê Asoyê yê têdeyî tawanbar kirin, heman dîmen li ber çavên Asoyê saz dibe: “Asoyê bersiva Xanima Boşatî neda. Ji nişka ve kîso ketin bîra wê... Xasma ew kîsoyê piştqelibandî. Ê roja Hacı Zorav jî bihata. Felek bavê kesî nîn bû...” (Rûp: 61-62). Dema ku yek ji lehengê romanê Hacı Zorav bistika ji nav tirafa agir radihêlê û dixwaze berzika Asoyê dax bike, “...Asoyê wekî kîsoya mê xwe kişandibû nav qalikê xwe û dilerizî.” (Rûp:64). Rewşa ku Asoyê tê de ye û Hacı Zorav weke rewşa kîsoya mê û kîsoya nêr e. Û jixwe rewşa her sê hewiyan jî weke temaşekarên bûyerê dişibin rewşa Asoyê ya li hemberî kîsoyan: “Hacı Zorav kirasê Asoyê rakir, destê xwe avêt derpiyê wê û jê şeqitand. Serê bistikê nêzî navrana wê kir. Asoyê jî hewla canê xwe bi gunikê Hacı Zorav girt û bada. Qorînî jî Hacı Zorav çû. Qoreqora wî Gundikê Dono hejand. Asoyê bi her du destên xwe bi gunikên wî girtibû û bernedida. Di bîstekê de Hacı Zorav bi wî gewdeyê qirase, serqûnkî li erdê ket û bêhiş ma...” (Rûp: 65). Ligel ku ev bûyer di nava romanê de derbas dibe jî, peyama di vê dîmenê de serencama dawîya romanê jî bi mirov dide hînkirin...

“Hemû malbatên bextewar dişibin hevdu, lê her malbata bedbext xwedî taybetiyeke bedbext e.” Weku Tolstoy gotiye, romanûs Mahmut Baksi jî di vê baweriyê de lehengên xwe afirandine û ew di nava gundekî Xerzanê de bi cî kirine. Çinku leheng niştecihên Gundikê Dono ne û ji ber zilma axayê gund, Hacı Zorav ne di tu halî de ne û jixwe ne bextewar in jî. Li rêya çareseriyê digerin. Li yekî zalim, li aqilmendekî û li çend qehremanan digerin. Baksi, Zibeyrê Ahmê weke Hesê (aqilmendê axa) Hacı Zorav; Bedo, Filîto û Aso jî weke qehremanên romanê derdixe pêşiya me. Ev her penc kesên nebextewar ku xwedî çîrokên cihêreng in,

rengîniyekê didin romanê û xwendekar jî bi xwe re kaş dikin heta dawîya romanê.

Xala dîtir ku min di navbera nû û nûjen de dibe û tîne, bîrxistina romanûs e ku piştî xwe bi zexmî spartiyê vegotina kevneşop a klasîkî. Bi vî hawî nikarim bibêjim, ev roman bi giştî romanûsiya Mahmut Baksi nûjen e. Dîmenên dîtir ên di romanê de nîşaneyên bi giştî yên romanûsiya Baksi ne. Ev nîşane di romanên wî yên dinê, Hêlin, Mezra Botan, Serhildana Mala Eliyê Ūnis de aşkera dibin. Dema mirov Gundikê Dono dixwîne her carê li van nîşaneyan rast tê: “Şer ketibû sala duduyan. Cebilxanê Mala Eliyê Ūnis li ber xelasbûnê bû. Hîv hê neketibû pişt ewran... Wê şevê çardeh mîrxasên Mala Eliyê Ūnis, di nav kon û kozikên xwe de bi destê ordiya bêbext hatin kuştin...” (Rûp: 70). Ev bîrxistina ji dîroka kurdan sînyalê dide ku dê Baksi li ser kîjan xeta nivîsîna romanê bimeşe. Û her carê Mala Eliyê Ūnis di cihekî de şewq dide: “Te got etar û çerçiyên Sêrtê? Pa bi serê bavê min, nivê wan xefiyên hikûmatê ne Hesên. Bila haya te ji wan hebe kuro. Hikûmeta Tirkiyeyê di vî warî de jêhatî ye. Piştî şerê Mala Eliyê Ūnis jî ev helawfiroşên Sêrtê, bi barê hêstiran ketibûn gundên çiya û xefiyetî dikirin.” Ev agahiyên ku ji nişkê ve derdikevin pêşberî xwendekar, mirov jî nava vegotineke nûjen dibuhurîne demeke dîrokî. Jixwe nivîskar di dawîya jiyana xwe de romaneke klasîk-dîrokî, romana Serhildana Mala Eliyê Ūnis diyarî xwendekaran kir. Û bi vê diyariya xwe pesend kir ku şew-evegota wî di navbera nû û klasîkbûnê de ye. Çinku nivîskarên afirîner derdê wan ê yekemîn ew e ku xwe bi awayê herî baş bikaribin vebêjin. Tûrikê xwe bi tîp, deng, bêje, hevok û rûpelên nivîsbar dagirin û ji wan navgînan fêkiyên heftber diyarî xwendekaran bikin. Dema ku romana xwe li ser bingeha xembariyê ava kirin, wê çaxê nûjenî ji dahatûyê re dimîne.

Romana Gundikê Dono ku ji bo

Mahmut Baksi gaveke nû bû di romanûsiya wî de, bi çavdêriyeke xurt hêvî û dîtînên wî radixist ber çavan: "...Hacî Zorav çû, kurê wî ket cihê wî. Kurê Filîto û Ezedîn, dê şopa bavên xwe biajon. Ez dizanim, warê Xerzan ê rojek biguhere, lê ez ê nebînim." (Rûp: 94). Ev bîr û boçûnên di dawiyê de jiyan û berxwedêriya kurdan a ji wê çaxê û heta îro bi awayekî rasteqînî hîna jî didome û weke Baksi gotiye, dê 'warê Xerzan [Kurdistan] rojekê biguhere' reng e em jî nebînin.

(04. 09. 2008)

Min û wî cara pêşîn bi rêya telefonê qise kiribû. Di xeta telefonê de bixêrhatina min kiribû û deriyê mala xwe ji min re vekiribû.

Roja hevdîtînê, heyecaneke bi wate cendek û ruhê min rapêçabû. Dîtina nivîskarê navdar Mahmut Baksi ji xwe cihê kêfxweşiyê bû. Lê heyecana hevpeyvîna bi rojnamevanekî profesyonel re rengê xwe guhertî ye.

Rojnamevaniya min li welêt bi salan domand. Li derveyî welêt jî çend sal in bi xurtî didomiya. Baksi ji weke rojnamevan



bi gelek kesên nasdar re hevpeyvîn pêk anîbû. Lê vê carê rol hatibûn guhertin. Ez mêvanî wî bûm û wî dê bersiva pirsên min bida.

Dema wê hatibû ku mutewazîbûn, rêzgirtin, hîlbijartina peyv û pirsan û bersivên bijarte û hizirkirina kûr, rolîstin û hunera rojnamevaniyê xwe bide der...

Min ji taxa Odenplanê, ji kolana Dalayê xwe berda ber bi Sveayê. Berê min li kolana Surbrunê bû. Rê, bi meşê, 20 deqîqeyî dikişîne...

Ji erd û ezmanan berf dibariya. Bayê hênîk, bi kuliyên berfê re mîna ku di ber kilameke klasîk de, bi nazî dîlanê bikîşînin, bi rîtmeke nerm li ezmên dizivîrin, beşek dibûn ramûsan û li ser hina-rikan datanîn û yên din jî dibûn kulîlkên spî û şaxên daran şînsîpî dikirin. Kolanên

Sohbetên dostaniyê û Mahmut Baksi

Gabar Çiyan

Stockholmê bi xeliçe-yên spî dihatin raxis-tin, rengê xweş didane xwezayê.

Li Surbrunê nêzî bînahiyekê çend tebeqe dibûm û bi derenceyan ve hildikişim. Kumê xwe ji serê xwe dikim, hewa sermayê ji ser xwe davêjim û derketina min ber bi jor ve xurtir dibe. Ez nêzikî mala wî dibim. Kilameke kurdî bixêrhatina min dike:

"Ax... heywax li min, heywax li min... lê mala min ê Heyfa dilê min mehkûmê, min rebenê lê dilketinê Ehmedê Mala Mûsa çawa mi dixwazî lê mi nadinê Hûn ê çawa bikujîn xweşmêra ji bo xatirê mi rebenê xweşikjinê Heywax li min heywax li min mala min ê Heyfa çavên reş û belek hûn dibînin îro ax ketinê..."

Baksi derî vedike. Bixêrhatina germ, kilama klasîk, bêhna xwarinên kurdî mirov bi xwe re dibe Kurdistanê...

Em derbazî eywanê dibin. Ew, berê xwe dide mutbexê ku dengê kilamê kêm bike. Heta ku digihîjê wir û vedigere, pê re distirîne. Dengbêjiya Baksi têra xwe bala min dikişîne.

Min zanibû ku ew nexweş e. Ji nêz ve bala xwe didimê, çavên wî çûne xwarê. Kîloyên wî kêm bûne. Derket holê ku, nexweşiyên giran jî rê li ber evîndariya rojnamevaniyê negirtiye. Wî nivîsên min ji nêz ve dişopand û haya wî ji medya kurdî û nivîsên belav dibin têra xwe hebû.

Me biryar da ku bi bêhna fireh hevpeyvînê bikin. Bersivên wî, bi ken û helwesta wî ya germ dest pê kir. Nêzîkbûna wî, cemedaya heyî heland û resmîyet

li derve ma. Hevpeyvîna me cihê xwe dida sohbetên dostane...

Qehwe ji me re hat. Xanim Elin, anku hevala wî bixêrhatina min dike. Ew jî rûdinê û sohbeta germ berdewam dike.

Elin Clason nivîskar û rojnamevaneke nasdar e. Wê hejmarek pirtûk li ser kurdan nivîsiye. Wisa dibêje Elin:

Ku min Mahmut Baksi nas nekiribûya, doza kurdan dê çi caran nebûna mijar ji xebatên min re. Enerjiya Baksi, hezkirin û girêdana wî bi welatê wî ve, min zindîtir dike. Mahmut bû sedem ku em bi hev re xebatên film û muzîkê bikin. Herin serdana Kurdistanê, bibin mêvanê şervanên kurdan, serokên kurdan Talebanî û Qasimlo bibînin, xebatên xwe bigihîjin hetanî Qamişlo. Belê, 23 salên min ê rojnamevaniyê bi giştî doza kurd hemêz dike...

Sohbet û hevpeyvîn têkilav bûbû. Min carna kaseta teybê dida rawestandî. Mijara sohbetê bûbû dengbêjên kurdan.



Kûrbûna wî li ser çanda kurdî, evîna wî li hemberî kilamên klasîk û dengbêjên Kurdistanê xwe dida der. Ji her kilamekê rêzek digot. Dengbêj Baksi bala çi kesa nekişandibû. Qet qala aliyê wî yê dengbêjiyê nehatibû kirin. Haya min jê çênebûbû...

Berê hevpeyvînê dikeve ser pirsgerêkên medyayê. Pivanên etikî. Û pirsgerêkên rojnamevaniya kurdî. Gazinên wî li ser mijara “sansûra rêvebirên organên medyayê li hemberî xebatkarên xwe û li ser navê rexnegiriyê nêzîkbûnên bi neyartî”, bi rêz dibûn. Agir ji awirên wî dibariyan û wisa digot: “Pêwîst e em berê rexneyê bidin rojnamevaniya xwe û paşê pênuşên xwe bikin tiving û bixine singa mirovan!”

Paşê ‘dostên roja teng’ bû mijara sohbeta me. Gazin ji xwe kir. Ji dost û nasên nêz kir. Dirêj bûn gazinên wî. Tev bi keser, hêvî û carna jî bi nifirên ne eşkere barkirî bûn. Diyar bû ku, hêviyên wî ji wan pir hebûn. Di dema şerê wî yê li hemberî nexweşiyên xwe de hejmarek kesên bi sînor li nik xwe didît...

Hevpeyvîna dirêj, bûbû sê beş. Beşek jê belav bû yên din di arşîva taybetî de man.

Me gelek caran hev dît. Hevpeyvînên rojnamevaniyê cihê xwe dabûn serdan û sohbetên kesên nêz.

Cara dawîn, hevdîtina me li mala wî ya nû li Gotgatanê pêk hat. Wî qala surprîzekê ji min re kiribû. Dema ez çûm mala wî, bi Ehmed Kaya re bixêrhatina min kir. Li mala nû Elin xuyanî nedikir. Lê dengê heman kilamê ya li kolana Surbrunê, ji metbexê belav dibû. Min baş fêhm kir ku Baksi, pir hez ji vê kilamê dike:

*Ax.. dayê Ehmedê Mala Mûsa çi xweşmêr e,
hunermend e lê, tembûrvan e
Tesbîhê di destê wî de ji kevrê şadî, lê ji kehreban e
Ew mîrxasê xweşmêra nekuje bi Xwedê ez ê bêjim:
Ew e mîrê bi sed mîran e
Ew nemerdê Ehmedê min bîkuje
hawar ew ji bera gur û rovî lê xayinan e*

*Ax.. dayê pêre hatî cejn û îda vê qurbanê
Keçik û kurikê me derketin govend, şahî lê vê dilanê...*

*Salihê pismamê min bang kir got:
Te porkurê Ehmedê Mala Mûsa birîndar e li aliyê lê...
di eywanê...*

Êşa sirgûnê giran e. Hesreta welat û dûrmayîna ji evînê, dost û xizman, weke agir e, di dilê mirovî de ye, dişewitîne, agir û bêhna şewatê ji dev, çav û mêjiyê mirovî difûrîne. Mirov di binê bîreke kûr û nîvçikiyayî de ye. Bi bîrê re diçike. Her car bi hêviyên mezin bi dîwêr ve hildikişe. Di nîvê rê de, dest diweste, mêjî naxebite û tempoya dil qels dibe. Mirov ji ezmanan bi ser dev dikeve erdê. Cendek perçe perçe dibe. Êşa bêhêvîtiyê mirovî kor dike...

Mahmut Baksi û Ehmed Kaya du teyrên xerîb û evîndarê welatê xwe bûn. Evîna welatperweriyê jiyana li sirgûnê dabû wan. Jiyana sirgûnê bi nexweşiyên barkirî ye, û mirin her dem dikare bibe mêvanê mirovî...

Min li Baksi û Kaya nihêrî. Bi dilekî şikestî, nifirên min bi rêz dibûn: Çend dem in ez nifiran dikim xêr nake û dua dikim nagihîje cî. Cihê nifir lê dihatin pejirandin, çima ji me re bédeng e?! Çima dengê me nabe xwe?! Çima em, zarokên Nûh, neviyên Ûnis, Zerdest û Brehîm pêxember, her dem dibine qurban?! Çima hêstirên me nayêne dîtin, ji qêrînên bav û dayikên kurdan re guh tê girtin!?

Em bi hev re derbasî odeya xebatê dibin. Makîneya kevnare ya nivîsînê li ser masê ye. Li wir, li ser dîwan û ber pacê tev nivîs, tîbînî, rojname, pirtûk û dokument in. Nivîs û dokumentên li odê şahidiya gelek bûyerên li Kurdistanê dikin...

Baksi ji me re qala eşqa xwe ya pêşîn dike. Evîndariya wî didomiya. Yara şêrîn ji bîra wî nediçû. Porê dirêj, çavên xezal, bejna zirav, lêva sêvesor ji hiş û xeyala wî dervediket. Ji me re qala yara şêrîn dikir: Ne bi dilekî lê bi heft dilan dil ketibû keçeke xwînsêrîn. Awirên wê, ew serxweş dikirin. Baksi biryara xwe dabû ku pê re bizewice. Wî zeriya di xeyala xwe de peyde

kiribû. Yadîgarî diçûn û dihatin. Nîvsozek hatibû birîn.

Hêrsbûna wê rojê, biryara şaş û çend peyv bûbûn sedema têkçûyîna wê zewacê. Çû û nebû yar jê re. Çend sal di ser bûyerê re derbas bûbûn. Keçik bi kesekî din re zewicibû. Zarokên wê çêbûbûn. Lê dilê Baksi hê jî bi wê ve bû. Agirê dilê wî gur dibû û şewata wê didomiya...

Dema Baksi derketibû Ewropayê, nivîskarên kurdan li Ewropayê zêde tune bûn. Wî jî bo parastina çand û zimanê kurdî gelek berhem afirandin. Bi rêya pirtûkên wî, çîrokên kurdî li dinyayê belav bûn.

Rojnamevan bû, derd û xwestinên gelê kurd anî zimên. Carna jî bi rola dîplomasiyê radibû, welatê me dida nasîn.

Îro jî aliyê wî yê film û muzîkê li benda lêkolînê ye, zêde nehatiye qalkirin. Baksi di gelek alîyan de çalak bû, zîrek bû.

Ew, rojnamevanekî dûrbîn, zûbîn û kûrbîn bû. Bûyerên rojane ku ji xelkê re normal dihatin dîtin, li bêjîngê dixist û jê re dibû mijara nivîsînê. Rengekî pir profesyonel dida nivîsan. Bi peyvên hîlbijartî û kurdewariyê nivîsên xwe ava dikir û bi regekî balkêş pêşkêşî mirovan dikir. Têkiliyên wî xurt û piralî bûn. Diwestiya, lê enerjîya rojnamevaniyê jê re dibû hêzeke nû...

Nexweşiya evîndarê ziman û çanda kurdî Mahmut Baksi giran bûbû. Paşê xebera ne xweş belav bû. Mahmut Baksi çûbû rehmetê...

Ji bo cara dawîn xatir jê dihate xwestin. Kurdên li sirgûnê yek bi yek; Mîrhem Yîgît, Mehmed Uzun û yên din, paşê hevala wî Elîn. Silav didanê. "Min li Amedê bi cî bikin", gotibû Baksi. Û ew, (.....) Cihê ku ji kurdan re bûbû Kabe. Bi beşdarbûna bi hezaran kesan li Amedê dihate bicîkirin. Ew niha jî

navenda kurdewariyê li me temaşe dike. Êdî ne êşa sirgûnê dikişîne û ne jî ya nexweşiyê. (.....) Bi wan re silavê dide me. Û dengê kilama li ber dilê wî şêrîn pêl bi pêl tê. Ji bedena Amedê bilind dibe û digihîje dost û kesên nêz.

"...

Gava ez çûm mi bi çavê serê xwe di, hawar e dayê...

Dilê min şewitî lê agir danê

Heywax li min heywax li min mala min ê

Heyfa çavê reş û belek dibînin hawar, ax ketinê..."

■ *Min dixwest ku hûn qala zaroktiya Mahmut Baksi bikin: Qala malbata te, aliyê dê û bav û jiyana te ya wê demê...*

Mahmut Baksi: Ez di sala 1944'an de li aliyê Xerzan, li gundekî biçûk hatime dinyê. Aliyê bavê min zane û şêx, ê dayikê xwediyê gund û axa bûn. Ez di navbera her du çandên ne mîna hev de mezin bûm.

Dema li aliyê bavê xwe bûm, bêhtir bi edebiyat, helbest û felsefê dadiketim, wê xwezayê reng dida min. Li Hezoyê (Kozluk) medreseyeke me ya toreyî ku naven-deke zaniyariyê bû û rêvebirina wê, bi şeweyekî toreyî ji kesên zana derbasî yên din dibû, hebû. rêvebirina wê ji aliyê bapîrê min ve dihate kirin. Bi qasî 50 feqeyên wî hebûn. Weke gelek herêmên Kurdistanê, bapîrê min jî beşek mezin ji pirtûkên olî wergerandibû kurdî û li wir perwerde bi kurdî dibû. Bi vê rêyê rêbazên ola Îslamê dihatin fêrkirin. Bi vê yekê, zimanê kurdî jî li wir zindî dima û bi pêş diket. Mixabin e ku Komara Tirkîyeyê di salên 1950'yî de derê van medreseyan girt û perwerdeya li medreseyan qedexa kir. Qedexeya li ser zimanê kurdî zêdetir bû û vê yekê micala perwerdeya bi zimanê kurdî ji holê rakir û jiyana medreseyan ku bi qasî 300 salan domand, bi dawî hat.

Wextê diçûme serdana aliyê dayika xwe, jiyana ku di bin rêvebiriya axatiyê de bû bêhtir xuyanî dikir. Aliyê zilmê dihate

Mahmut Baksi:

“Evîna welat di dilê min de ye”

Hevpeyvîn: Gabar Çiyan

Di sala 1998'an de, xebata min a rojnamevanîyê li ser pirsên çandî û edebî piralî didomiya. Wê demê kovara “Cihana Weşanan” û “Şano û Sînema” di bin rêvebirîya min de derdike. Ez gelek caran bi Nivîskarê navdar Mahmut Baksi re rûniştim. Li ser gelek mijaran hevpeyvîn û sohbetên me çêbûn. Lê hejmara 5'an ya “Cihana Weşanan” hejmarek taybet bû. Giraniya wê jiyan û berhemên Mahmut Baksi hemêz dikir. Wê demê me hevpeyvînek rengîn derêxist holê. Em beşek jê pêşkêşî xwendevanan dikin.

dîtin. Lê aliyê wê yên erênî jî pir bûn. Ez di şevên dirêj de, bi çirokbêj û dengbêjên kurdan re bûm. Min jî kaniya wan, ku ji rengê ziman û çanda kurdî pêk dihat, av vedixwar. Ji wan, li ser dîroka gelê xwe, adet û toreyan fêrî gelek tiştan bûm. Di dema xwendina bilind de û nivîskariya min de jî derket holê ku, bandora wan li berhemên min piralî bûye, li kûrahiya ruhê min bûye. Wan zindîbûna kurdbûyîna min xurtir kir û jiyanêke kurdewarî dan min.

■ *Ji me re qala du qonaxan, destpêka nivîskariyê û sedemên derketina xwe ya derveyî welat bike...*

M.B.: Piştî xwendina bilind a mamostetiyê (1956-1963) evîna min ya ji bo nivîsînê û edebiyatê berê min da destpêka karê nivîsînê. Ez li Êlihê (Batman) di rojnameya herêmî “Batman Gazetesi” de bûm xwedî quncik. Nivîsên min li dijî neheqiyê bûn. Paşê sîstema axatî û şêxîtiyê kete ber êrîşa min. Ji aliyekî ve, nivîsên min li dijî malbata min bûn. Bi vê yekê, berê dewletê û malbata min dikete min.

Li Kurdistanê gelek oldarên me, li ser bingeha çanda kurdî û bi zimanê kurdî feqe perwerde dikirin. Me bi çavê kesên paşverû li wan dinîhêrî. Axayên ku ji bo rizgariya welêt, li gelek herêmê kurdan xizmet dikirin, fedakarî dikirin, ji ber pirsên çînî ji aliyê me ve weke kesên gunehkar dihatin nîşandan. Ev xeletî bû. Ez jî di nav de, gelek ji xortên me yên pêşverû,

wê demê di bin bandora çepgiriya tirkan de mabûn û bêtî ku aliyên wan ên erênî bibînin, me peyvên xelet gotin, dilê wan jî me ma. Divê em helwesta xwe ya demê rexne bikin, kêmasiyên xwe bipejirînin.

Helwestên çepgirî û şoreşgeriyê piştî demekê berê min da pirsê netewî. Min zilm û hovîtiya li ser gelê kurd jî nêz ve şopand. Paşê, min xebata ji bo berjewendiyên gelê xwe ji xwe re kir karekî binge-hîn. Di 1969'an de li Stenbolê pirtûka min “Mezra Botan” jî çapê derket. Giraniya wê li ser Doza Kurdan bû, naveroka xwe zilma li ser kurdan, asîmîleya li ser me û paşverûtiya civakî pêk dihat. Pirtûk jî aliyê weşanxaneyê Dost ve hatibû çapkirin. Wê demê hêza DDKO xurt bû. Ew jî bo belavkirinê bûne alîkar. Pirtûk jî aliyê dewletê ve hate qedexekirin. Têr nekir, ez jî girtim. Piştî îşkence û îfadedayînê bi “kurtçîtiyê” hatime fişkirin.

Belê ez ji aliyê Komara Tirkîyeyê ve hatibûm fişkirin. Lê min her dem li mohra wan a sebîqeya kurdîtiyê weke madalyoneke şerefê ji xwe re pejirand. Ez pê serbilind bûm ku, paya min “kurtçîti” ket. Paşê li ser daweya Şadî Dalkılıç ku komînistekî tirkan bû, xebateke min derket. Ew jî hate qedexekirin.

Dewletê dixwest dengê min qut bike, rê li ber min bigire û bi 15 sal heps ceza bike. Çûn û hatina dadgehê zêdetir dibû. Di sala 1970'yî de ez mecbûr mam ku

derkevim derveyî welêt. Pêşî Berlînê û di sala 1971'ê de derbasî Swêdê bûm.

■ *Hetanî niha çend pirtûkên te derketine û bi kîjan zimanan?*

M.B.: Hejmara pirtûkên hatine nivîsîn zêdeyî 20'an in. Bi zimanê kurdî, swêdî û tirkî hatine nivîsîn. Beşek ji wan bûne danîmarkî, almanî, îngilîzî, holandî, norvêcî û erebî.

■ *Navê pirtûka te ya pêşîn ku li derveyî welêt hate nivîsîn tê bîra te?*

M.B.: Rewşa azadiya li Swêdê mecal dabû min ku, ez pirtûka "Türkiyede Kürt Sorunu" binivîsim. Min di wê xebatê de dîtina xwe bi giranî li ser dagirkirina Kurdistanê, zilma tê kirin û rêya serxwebûnê anîbû zimên. Xebat têra xwe balkêş bû.

■ *Li ser pirsên biyaniyan jî xebatên te çêbûn. Nivîs û pirtûkên te li Swêdê deng dabûn. Ji kerema xwe re qala wê demê bike...*

M.B.: Pirtûkeke min bi navê "Koleyên Biçûk" derketibû. Min tê de qal kir, pêwîst e zarokên xerîban pêşî zimanên xwe baş fêr bibin. Paşê giraniyê bidin Swêdî.

Kesên ku peyva "Koleyên Biçûk" û ne-bûna koletiyê li Swêdê nedipejirandin pir hêrs dibûn. Paşê li ser pirsê lêkolîn hatin kirin. Dîtinên min rast derketin. Ji ber ku zarok çiqasî zimanê dayika xwe baş zanibe, ew qasî fêrbûna zimanên din jê re hêsanîr e. Li gorî wan ez "pedagog" bûm. Lê ne wisa bû. Asîmîleya ku tirkan li Kurdistanê pêk dihanî ji min re bûbû bîngeha vê dîtinê. Ev pirs û gelek pirsên din bûne sedem ku, Doza Kurdistan li Swêdê bê nasîn. Weke mîsal, tavyên nivîsên ku di rojnameya "Afton Bladet" de belav dibûn, wisa bû. "Mahmut Baksi – Nivîskarê Kurd".

Min ji xwe re kiribû armanc ku navê kurdan û doza wan li Swêdê û Ewropayê belav bikim. Bicîanîna armancê ne hêsan bû. Lê ez bi sebir bûm û ji bo vê çi pêwîst bûya, min dikir.

■ *We di xebateke xwe de sistema*

Swêdê jî rexne kiribû. Ji kerema xwe re qala wê bikin...

M.B.: Xebata min a bi navê "İsveç İsveç dedikleri" bi tirkî û swêdî derketibû. Min tê de qala rûwê sergirtî yê demokrasiya Swêdê dikir. Piştî belavkirina wê, gelek dezgeh û kesan xwestin ku min bê kar bi-hêlin û ji civatê îzole bikin. Lê ronakbîrên swêdî li min xwedî derketin, kar dîtin û alîkariya min kirin.

■ *We pirtûkeke zarokan bi navê "Zarokên İhsan" nivîsî. Paşê aliyê tirkan îdiayek belav kir ku, kurdî ne zimanê xwendinê ye. Helwesta te ya wê demê çawa bû?*

M.B.: Divê mirov xebatên xwe di dema pêwîst be pêk bîne. Min ji zû ve dixwest pirtûkan ji bo zarokên kurdan binivîsim. Bibim tercûmanê kul û keserên wan. "Zarokên İhsan" li ser vê fikrê di 1977'an de bi kurdî û swêdî hate nivîsîn. Ev pirtûk, li Ewropayê ji bo zarokan a yekem e. Tê de qala jiyana zarokekî kurd li Swêdê dihate kirin.

Pirtûk bi kurdî bû, lê tiştê ecêb ew e ku, îdiayek belav bûbû. Li gorî wan, kurdî ne zimanê xwendinê ye. Li ser van îdiayan, TV'ya Swêdê programek amade kir. Di studyoyê de zarokên kurdan beşdar bûn. Zarokan pirtûk dixwend û yekser werdigerandin kurdî. Me îdiayên wisa xirab û neteweperest pûç kirin.

Paşê pirtûka min a bi navê 'Zozan' ji çapê derket. TV'ya Swêdî Zozan kir rêzefilm. Bi wêneyan weke çirokên zarokan xwendin. Bû lîstika şanoyî. Swêdê bi wê lîstikê beşdarî musabeqeya Îtalyayê bû. Paşê bû filmekî kurdî. Mirov dikare bêje ku, ew filmê yekem ê kurdî ye ku li derveyî welêt hate kişandin.

■ *Di hevdîtinên me de, gelek caran te qal kir ku, tu di bin bandora çanda suryaniyan de jî mayî. Bi taybetî li ser wan xebatên we çêbûn an na?*

M.B.: Bi taybetî piştî salên 1981'ê rexne li min dihate kirin ku, çima ez qala

wan nakim. Suryanî li herêma me, gelekî bi qasî kurdan kevnare ye. Ew jî mîna kurdan li ber man û nemanê ne. Wezîfeya ronakbîriyê jî ew e ku mirov pîrsgirêkên wisa bibîne û qal bike. Kurdistan çiqasî welatê kurdan be, ewqasî welatê wan e jî.

Di rojnameya “Dagens Nyheter” de, di navbera 1975-76’an li ser pîrsê hejmarek nivîsên min belav bûn. Paşê ez çûm bajarê wan Södertäljeyê. Ez bi gelek kesan re axivîm. Ji ber kurdiya wan a zelal ez matmayî mam. Pirtûka min ‘Hanna’ wan deman bi swêdî û tirkî derket.

Piştî 12’ê îlonê hat. Ez mecbûr mam ku giraniyê bidim rewşa welêt. Min pîr dixwest ku li ser wan xebatên din jî bikim. Lê kesên li ser pîrsê pîspor in dest avêtin meselê. Valabûna hebû bi rêya wan dihate dagirtin.

■ *Qirkirina li Qamişlokê demekê ji te re bûbû mijareke giring. Ew bûyer çawa bûbû û te çi kir?*

M.B.: Di 12’ê çîleya pêşîn a 1980’yî de, hêzên taybetî yê Komara Tirkîyeyê li derveyî sînorên xwe, li bajarê Qamişlo bi êrîşekê qirkirinek pêk anîbû. 16 kes ku di nav wan de xuşka min Necla Baksi jî hebû, hatibûn kuştin. Piştî bûyerê ez çûm Sûriyeyê. Li wir bi qasî 3 mehan mam. Min li wir lêkolînek pîralî pêk anî. Min wêneyên bûyerê bi dest xist. Paşê ez hatim Swêdê. Wêne di gelek rojnameyên cîhanê de belav bûn. Cûntaya leşkerî ya 12’ê îlonê bi saya wan wêneyan darbeyek mezin xwar. Min, li ser bingeha lêkolîn û hevpeyvînên hatine kirin û wêneyên di dest min de “Kamişli Katlîami” nivîsî. Pirtûkê li gelek deveran deng da.

■ *We ji bo pirtûka ‘Hêlînê’ xelat girt. Hûn dikarin qala wê bikin...*

M.B.: Hêlîn bêhtir berê xwe li ciwanan e. Naveroka wê li ser zilma 12’ê îlonê ya li dijî kurdan e. Pêşî bi kurdi hate nivîsin. Paşê wergerandin, danîmarkî, almanî û swêdî. Roman, kirin şanoya radyoyî û 5 hefteyan di radyoyê da hate weşandin.

Romana Hêlîn, di 1998’an de li Avustur-yayê xelata herî baş a pirtûkên ciwanan girt.

■ *Tu her dem devliken xuya dikî. Qet rojên te yên ne xweş çênebûne?*

M.B.: Di sala 1983’yan de Şivan Perwer û xanima wî Gulistan hatin Swêdê. Dema hatin, me hev dît. Hinek bûyerên wê demê bandora xwe ji aliyê ruhî ve li min kiribûn. Dema mirov demek dirêj, ji welat, ji xelkê xwe, ji xwezaya xwe dûr bimîne diçike. Min navgînên di destê xwe de baş bi kar anîbûn. Ji min re hilmek nû, gavek teze pêwîst bû. Min biryar da ku, bi Şivan re beşdarî konserên wî bibim û bi vê yekê gelê xwe bibînim. Min dixwest bi vê tîkiliya nû, xwe nû bikim û gavên bihêztir bavêjim. Divê ez êşkere bî-nime zimên ku, hinekî ji ber kêf û hinekî ji ber vexwarinê, planên min neçûn serî.

1984’an de pirtûka min “Şivanin Sevdası” belav bû. Min dixwest bi rêya wê, bi xelkê bêhtir bidime nasîn. Di navbera 1983 û 1988’an de ji malbata min hinek kes çûn rehmetê û hinek nexweş ketin. Vexwarin û êşa ruhî rê li ber min digirt. Li gelek deveran geriyam. Ez ji rastiya jiyanê direvîyam. Ji bo xebatên nû gelek mecalên nû hatibûn bidestxistin. Lê min nikaribû tevan bi cî binim. Hinekan xwest, Şivan an jî kesên din ji bo problemên min sûcdar nîşan bidin. Ev şaş e. Ji ber ku çi eleqeya çi kesan pê tune bû. Weke ku min qal kir, pîrsgirêkên min ên şexsî hebûn. Wan rê li ber min digirtin.

Ez dixwazim bî-nime zimên ku, divê nî-vîskarên kurd hetanî azadiyê, bê rawestan xebata xwe bidomînin. Divê di meseleya kêfê jî, çarçoveyeke xwe hebe. Divê mirov, jiyanê li gorî normê wê bijî. Ez xwe ji bo wan salan, kirinên xwe rexne dikim.

■ *Tu dixwazî em hinekî qala Yilmaz Guney bikin. We çima Yilmaz Guney weke mijar ji xwe re hilbijart?*

M.B.: Yilmaz Guney li derveyî welêt ji

aliyê gelek kesan ve weke rejîsor û lîstikvanekî tirk dihate nasîn. Belavkirina agahiyên wisa şaş bû. Min, di sala 1982'yan de ji bo berevajîkirina vê qonaxê dest bi xebatê kir û çûme Parîsê. Min bi Yilmaz re hejmarek hevpeyvîn pêk anî. Li ser pirsê analîzên min çêbûn. Kendal Nezan jî ji bo vê xebatê alikariya min kir. Xebata me serkeftî bû. Min li hemberî sînemavanê kurd Yilmaz Guney wezîfeya xwe bi cî anî. Ji bo vê yekê jî ez pir kêfxweş im.

■ *Dema mirov hinek ji Fîlmên Yilmaz Guney û fîlmên din yên kurdî bihejmêre, dikare qala hebûna Sînemaya kurdî bike, an na?*

M.B.: Mixabin e ku li ser fîlmên başûrê welêt zaniyariya heye kêma e. Lewma ez ê nikaribim bersîveke berfireh bidime we. Lê dema mirov li fîlmên hene binêre, dikare bi hêsanî bibêje ku, Sînemaya kurdî jî zû ve heye. Anku hebûna Sînemaya kurdî bi fîlmê Seyîdxan dest pê dike. Yilmaz bi xwe jî weke min hizir dike û dibêje: Fîlmê min ê kurdî û destpêkê Seyîdxan e.

Kişandina filman bi kurdî wê demê ne mimkun bû. Qedexekirina kurdî encamek wisa dianî hole: Ziman tirkî bû lê temaya filman li ser jiyana kurdan bû. Anku sînemaya kurdî hebû, lê rê li ber zimanê wê dihate girtin, ne bi kurdî bû. Nimûneyek wisa ecêb li tu welatan nikare bê dîtin. Lê ev yek li Tirkîyeyê pêk hatin, li wir çêbûn.

Ziman girîng e. Lê divê mirov bi awîreke din jî filman binirxîne: Mesaja fîlm û kesên wan mesajan distînin, jî pîrsek girîng e. Naveroka mesajê û nasnameya kesê ew mesaj nivîsiye jî girîng e û divê bê dîtin. Dema mirov bi vê awîrê nêzî pîrsê bibe, bi hêsanî dê bê dîtin ku Yilmaz kurd e û hîsên netewî li cem wî berz in.

Di van demên dawîn de, fîlmên bi kurdî zêde dibin. Gavên heja tene avêtin. Dema mirov li wan binêre, dikare bi hêsanî bibêje ku, sînemaya kurdî heye.

Îro mirov dikare sînema kurdî xurtir bike. Hebûna kanalên tv'yên kurdî şansekî mezin e, kanalên me yên tv'yê dikarin ji bo nîşandan û pêşxistina fîlmên kurdî roleke mezin bilîzin. Berê mecalên wisa tune bûn. Weke mîsal, di sala 1984'an de, mecala nîşandana fîlmekî kurdî tune bû. Di tv'ya swêdî de, bi swêdî hate nîşandan. Di bin fîlm de bi rêya tekstê hatibû qalkirin ku fîlm, kurdî ye.

■ *Pirsgirêkên li pêşîya sînema kurdî çi ne?*

M.B.: Fîlm bi rêya xebatên kolektîf tene afirandin. Lewma divê kesên li paş û pêşîya kamerayê bi baştirîn şêwe xebata xwe bikin. Divê sînemakar jî bo afirandina fîlmên baş û bi qalîte xwe organîze bikin.

Fîlmekî baş bê mecalên aborî nikare bê afirandin, kişandin. Mesref û lêçûn pir e. Dewleta me kurdan tune ye ku em karibin vê pîrsê çareser bikin. Kesên ku dewlemend in û partiyên politîk dikarin bibin alîkar. Pêwîst e ji bo alikariya filman mercên politîk daneynin. Ji pêşketina hunera sînemayê reb bibin alîkar da ku sînemaya kurdî were cihekî bilind û cihê xwe di nava sînemaya welatên din de bigire.

Hetanî ev pîrsgirêk çareser nebin, diwar e ku mirov fîlmên bi qalîte biafirîne.

■ *Yilmaz Guney bi çavê fîlmên kurdî li fîlmên xwe dinêrî an na, dîtina wî çi bû?*

M.B.: Qonaxa ku bi Seyîdxan re dest pê kiribû û fîlmên piştî wê, malê gelê kurd in. Li gorî Yilmaz jî ew fîlmên wî malê sînemaya kurdî ne.

Li Parîsê heftêya sînemaya kurdî hatibû amadekirin. Wî li wir êşkere anîbû zimên ku fîlmên wî malê sînema Kurdî ne. Wî plan kiriye ku tevayê fîlmên xwe bi rêya dublajê bike kurdî.

■ *Xebatên Yilmaz li ser kişandina fîlmên kurdî hebûn, an na?*

M.B.: Fîlmek li ser serhildana kurdan

hatibû plankirin. Projeya wê amade bûbû. Dr. Qasimlo ji bo pirsê aboriyê piştgirî amade kiribû. Navê filmê nû jî Çiya bû. Cihê kişandina filmê nû Rojhilat bû. Her wisa li ser qetlîama Qamişloyê û serpehatiyên din jî 6 projeyên wî hebûn.

Yilmaz dest bi xebatê kiribû. Lê berî çûna Kurdistanê jî mîdeya xwe nerihet bûbû. Nexweşiya kanserê rê li ber projeyan girt...

■ *Nexweşiya te çi demê dest pê kir?*

M.B.: 1989'an de pirtûka 'Gundikê Dono' belav bû. Mîrhem Yîgît jî di nav de gelek ronakbîr bi awireke erênî nêzî wê berhemê bûn. Piştî ez li projeyên din vegeriyan. Lê nexweşiyan rê li ber min girt. Min, di 1990'î de şerê kansera kezêba reş kir. Min zora wê bir. Lê êşa gurçikan dest pê kir. Gurçik bi tevayî fonkîsyonên xwe kêmbûn û nema bi wezîfeyê xwe radi-bûn. Ji awira teknîkî ve alîkariya min dîkirin. Paşê derket holê ku, ne tenê gurçik, lê dilê min jî problema xwe heye. Ji ber van nexweşiyan jiyana û planên min tev têkilav bûn.

■ *Hinekî qala evîna Mahmut Baksi bike, nêzîkbûna wî li xwezayê bike...*

M.B.: Li gorî min, kurdbûyîn girêdana bi xaka welêt ve girêdayî ye. Hez kirina wê ye. Ez bi hez kirina welatê xwe, welatperweriyê mezin bûm. Ev aliyekî evîna min ya xwezayî ye.

Gelê kurd evîndarê xwezaya xwe ye. Di kilamên kurdî de ev evîndarî pîralî derdikeve pêş. Ev girêdana me, bandorê li ruhê mirovî dike. Dema li welatekî xweşik û dîlber pir bin, pir normal e ku qala xweşikbûnê bê kirin. Ez jî endamê vê civatê me. Bi wan kilamên heja mezin bûm. Girêdana min a bi xwezayê pir mezin e. Lewma, eşq û xweza bedena min dihejîne û bandorê li ruhê min dike. Tesîra wan her dem li berhemên min bûye û dê bibe. (.....)

Baksi û roman

Di pêvajoya romana kurdî de ku, bi berhemên Erebe Şemo dest pê dike, mirov li çend qonaxên sereke rast tê. Her weha romana 'pêşmerge' ya Rehîmê Qazî û 'jana gel' ya Îbrahîm Ehmed weke du mînakên berbiçav, di qonaxa duyem a romana kurdî de, dikarin bîne dest-nîşankirin. Hêjayî gotinê ye ku ev her du roman jî bi zaravayê Soranî ne. Piştî van her du qonaxan, careke din serboreyên çend nivîskarên kurd ên ku li Siwêdê bi cî bûbûn, tîn bîra mirov. Di nav wan de Mahmut Baksi yek ji mînakên sereke ye ku hem bi karê xwe yê rojnamevanîyê û hem jî bi roman û nivîsên xwe yên cuda, di vê çarçoveyê de, xwedî cihekî taybet e.

Di qada romanê de Hêlîn-1984, Gundikê Dono-1988, du berhemên wî yên di salên heştêyî de derketin, vê dawiyê jî - piştî 2000'î - bi derketina Lawikê Xerzî û Serhildana Mala Eliyê Ünîs re, hejmara berhemên wî gihîşt çaran.

Di bawerîya min de, giringiya van berheman xwe dispêre du alîyan, yek jê rewşa kurmanciyê ku ev berhem, weke roman, pê hatine nivîsandin. Ya din jî dema derketina van berheman ku romana kurdî ya nû, piştî navberê e dirêj, di hate vejandin.

Ev berhemên ku me hejmartin hinek ji berhemên Baksi bûn, wisa diyar e ku Baksi gelek cureyên nivîsandinê ceribandine û bi zêdeyî zîmanekî berhem li pey xwe hiştine.

Mêvanê yekem

Di sala 2000'î de, ez jî welêt derketim û li Belçîkayê min dest bi karê televizyonê kir. Bi navê Gava Sêyemîn, min dest bi amadekirina bernameyekê li ser wêje û edebiyata kurdî kiribû. Sal ber bi dawiyê ve diçû, wisa jî roja jiyana Mahmut Baksi diçû ava û li ser kursiyekî bi teker hatibû

Jiyana bi teqereq, mirineke bêdeng

Helîm Yûsiv

cihê televizyonê. Biryara min jî ew bû ku ez bi wî û berhemên wî dest bi vî karî bikim û wisa bûn. Nexweşiyê zora Baksi biribû û ew jar û perîşan kiribû. Di bernamê de hem qala berhemên xwe û hem jî qala xebata xwe ya demdirêj dikir. Gotinên wî yên xortekî bi hêvî ku nû cira xwe li jiyane xweş dike dianîn bîra mirov, lê xwêdanê û westandina beden û laşê wî tiştekî din digot. Bername di 11.11.2000î de hate weşandin û piştî çend rojan Mahmut Baksi ji nav me bar kir.

Mirin û bibîranîn

Yek ji xalên xemgîn ku bala mirov dikişîne ev e, di jiyana Mahmut Baksi de her dem li ber çavan bû. Geh bi berhemên xwe yên wêjeyî û geh bi kirin û helwestên xwe yên siyasî cihê danûstendin û guftûgoyan bû. Bi koçkirina wî re vê qelebalixê cihê xwe bi temamî da bêdengiyeke ecêb. Weke ku ev nivîskar, rojekê ji rojan ne li nav me bû. Li gor agahdariyên min, ev cara yekê ye, bi dosyeya kovara Wyê re, wê ev nivîskarê kurdî çalak bê bibîranîn.

Ev gaveke dereng be jî, lê cihê pesindan û rêzê ye.

Mahmut Baksi nivîskarekî vî zimanê me yê şêrîn e ku di zehmetirîn dem de ked û hezkirineke mezin da me û ziman û wêjeya me ya berxwedêr.

Mahmut Baksi (1944 gundê Siphî Hezo Êlih, 19. 12. 2000 Stockholm). Sala 2000'an ji bo me bi hemû wateya xwe saleke pir xemgîn bû. Yanî ew du, sê salên hanê, ji qedera neteweya me, salên reş, nexweş û tîjî derd û xem bûn. Xeberên dilşewat yek li pey yekê canê me şewitandin û hestên me hatin birîndarkirin.

Me ji ber derd û kovana ji destdayîna hunermendê mêrxas Ehmed Kaya hê hêsirên çavên xwe ziwa nekiribûn, xemên dilê me hê venereviyabûn ku xemeke din hat ser barê xemên me yên giran!! Mamoste Mahmut Baksi bi wî ruhê xwe yê mezin, piştî demêke dûr û dirêj, li cîhaneke bi hesret û daxwazên neditî xatir ji me xwest û di êvarîyeke xemnak de, li welatê biyanîyê, ew jî gihîşt nava karwanê nemir û evîndarên hesret neditî. Dilê Baksi di çax û demekê de ji lêdanê sekinî, ku hêviyên nû hatibûn afirandin. Elbet mamosteyê me bi xwe jî di vî warî de xwedî ked û zehmeteke mezin e. Ji ber ku di dem û çaxên herî girîng û hesas de, her çend ew bi giranî nexweş bû jî, lê bi wê vîna xwe ya hesinîn û bi pênuşa xwe şerê dijwar li hemberî dagirker û sextekarên xwefiroş domand.

Pênuşa wî çeka wî bû û bi rastî jî ji bo parastina maf û berje-wendiyên neteweya xwe pênuşa xwe baş bi kar anî.

Gelek caran em bi hev re diaxivîn. Bi taybetî bi rêya telefonê min gelek pirs jê dipirsîn. Baksi di salên dawîya jiyana xwe de bi tenê mabû. Wî dixwest her tim derdê dilê xwe ji kesekî re beyan bike. Behsa êş û elemên xwe yên salên berê bike. Bi hesreteke mezin li ser xwişka xwe ya şehîd Neclayê diaxivî. Carna dema dihat Med TV'yê neçar bi şev kesek pê re dima û carna ez jî pê re bûm. Heta sibê xew tune bû, ew jî êşa canê xwe dinaliya, lê dizanibû ku êdî çareserî jî nîn e. Weke ji şaşiyan xwe yên

Me bi kûraniya evîna te zanibû

Kakşar Oremar

salên berê poşman be, her tim wiha digot: **“bavo... qedrê ciwaniya xwe bizanibin. Di dinê de dewlemendiya herî mezin tenduristî û cansaxiya mirov e...”**.

Xuya bû ku mamoste Baksi dixwest ji min re bêje ku wî di ciwaniyê de hinek şaşî kirine ku êdî zîrar û ziyana wan bi çi buhayî nayê tijîkirin. Ji ber wê jî zû gulçîskên xwe ji dest dan û dilê wî jî toşî nexweşiyê bû. Lê tevahiya vana tiştêkî ji şexsiyeta M. Baksi kêr nake. Ew evîndarê kurd û Kurdistanê bû. Ez baş dizanim ku wî di rojên dawiya jiyana xwe de jî bi hemû rengan hevkarîya ciwanên kurd dikir. Ciwan teşwîq dikirin ku bikevin pey ziman û naskirina hemû taybetmendiyên xwe yên netewî. Me li Akademiya Kurdî kovarek bi navê **Huner** diweşand û ez êdîtorê wê kovarê bûm. Min hejmara yekê ji mamoste Baksi re şand. Piştî hefteyekê bi rêya Gulistan Perwer mesajek li ser kasêta teypê tomar kir û ji min re şand. Wî bi dilekî germ razîbûna xwe ya ji naveroka kovarê û kurdiya wê dida diyarkirin û li cihekî digot: **“Kurmanciya we weke ava Dîc-leyê diherike, sihet û qeweta we xweş be...”**. Ew kasê hê jî li ba min e. Dema min mamoste Baksi didît hêzeke mezin ya karkirinê li ba min peyda dibû û ruhekî nû diket laşê min.

Baksi ji dîrokê gelek hez dikir û bi hesreteke kûr û dûr li ser jiyana serok û qehremanên kurd diaxivî. Behsa xiyaneta kurdan a li dijî

hev dikir. Û elbet derfetên jidestçûyî çavên wî yên tijî hêvî, tijî hêsir dikirin. Dema Gulistan Perwer didît, weke ku ezîztirîn kesa xwe yan jî hevala xwe ya herî nêz dibe. Hingî bû ku eşqa axaftinê li ba wî zêdetir dibû. Gelek caran wiha digot: **“Yaw... birastî dema ku ez nû hatim Ewropayê belkî hejmara kesên ku bi kurdî dinivîsîn ji hejmara tiliyên destê te jî kêmtir bûn. Lê maşelah niha li sîteyên kurdî binihêre, mirov nizane çi bixwîne û çi nexwîne. Ev nîşana pêşketineke mezin e...”**.

Baksi gelek bi paşeroja kurdan hêvîdar bû. Wî carna bi hesreteke mezin wiha digot: **“Rojek wê bê ku kurd jî wê bigihên hemû mafên xwe, lê ez wê rojê nabînim...”** Li vira bû ku me di çavên wî yên biçûk û kêmhêz de şiliyek didît.

M. Baksi di mehên dawiya jiyana xwe de gelek westiyayî bû. Cara dawiyê min ew li festîvala sala 2000'an de li bajarê



Dortmundê dît, lê êdî weke berê nedikarî li ser piyan biweste, ew li ser çerxa xwe rûniştî bû. Bi evîneke mezin pirtûka xwe ji xwendevanan re îmze dikir û li ser naveroka kîtaba xwe jî bi ciwanan re di-axivî. Min ji dûr ve li wî dinêrî ka çawa bi wan hemû nexweşiyên xwe dişa ji şerê jîyanê dikir. Wî hezar hêvî hebûn ku her hezar hêviyên wî jî di rizgarkirina neteweya wî de bi dawî dibûn.

Nemir Baksi, ku bi eslê xwe ji Bedlîsê ye, sala 1944'an li gundê Siphîyê yê girêdayî bajarê Batmanê, di malbeteke xanedan de hatiye dinê. Wî zaroktiya xwe di gund de derbas kir û xwendina xwe ya lîseyê jî li bajarê Batmanê bi dawî anî. Ji bona wê jî ew evîndarê jiyana nava gundan bû. Behsa bêhna gund û samîmîyeta gundiyên kurd dikir. Carna diçû nava xeyalan û wiha diaxivî: **“Tu zanî... li Ewropa jî gundî ji bajariyan merdtir û paktir in. Ruhê wan pak e, dema ji te re dibêjin were çayekê vexwe, ji dil dibêjin. Mîna bajariya durû nîn in. Li Kurdistanê gundiyên kurd baştir ji me wateya jîyanê fam dikin. Çimkî ew di nava cewherê jiyanê rast û durist de mezin bûne, çi dibêjin ji nava dilê wan tê...”**

Mahmut Baksi di çaxê xortaniyê de bi siyaseta çewt û ji exlaqê mirovayetiye dût a Komarê, hesiya. Wî didît ku dewlet bi zordariyeke bêeman li ser serê kurdan siyaseta tunekirinê dimeşîne. Ji ber wê jî piştî, bi kar û xebata xwe bêrawestan, helwesta xwe ya kurdperweriyê da diyarkirin.

Nemir Baksi, ji çaxê ku di sala 1964'an de di artêşa Tirkîyeyê de bû leşker, bêtir pê hesiya ka kemalist û şovenîst çawa û bi çi terhî hemû taybetmendiyên kurdan ên ziman, çand û dirokê înkâr dikin. Wî di wan salan de ferqeke mezin di navbera xwe û tirkekî de didît: sivkatî, lêdan, bi çavê biyaniyan li ciwanekî kurd nêrîn û hesibandina neteweya wî weke wehş û hov... Baksi ber bi cîhaneke din ve bir.

Vana tevan tevna evîna kurdayetiye di dil û mêjiyê Mahmutê xort de raçandin. Lê çi evîn? Belê... Evîneke bê sînor û hisab, ku serokaniya raçandina wê vedigeriya dirokeke sê, çar hezar salî û Baksi ji wir meşa xwe da destpêkirin.

Baksi li ser bingehe evîneke wiha dest bi gera nava gund û bajarên welat kir. Hestên wî yên neteweyî şiyar bûbûn û ji bona xweîspatkirinê, di demeke kêma de, wî di gelek kar û barên civakî û siyasî de şiyar û hêza xwe ji her kesî re da xuyakirin. Di sala 1966'an de PDK û PKT (Partiya Karkerên Tirkîyeyê) nas kirin û di sala 1968'an de, di Şaxê Batmanê de, wek serokê PKT'yê yê herêmê hat hilbijartin. Di heman salê de jî bi zimanê tirkî dest bi nivîsandinê kir. Ji bo debara jîyanê di tesîsên petrolê de li Batmanê wek karmend dest bi kar kir û di nava karkerên kurd de karê xwe yê organîzasiyonî jî bi rengekî çalaktir domand. Lê di etmofereke tijî stem û zordarî de, Baksi nekarî xebata xwe ya şiyarkirinê bidomîne. Berî her kesî berpirsiyarên komarê bi hez û armancên Baksi hesiyan. Ji bona wê jî ew ji karê petrola Batmanê derxistin. Êdî rûpelekî din di jiyana wî de vebûbû. Ji wir û pê de jiyana Baksi ya dûrî welat dest pê kir. Her çend Baksi hat girtin, îşkence û tehdîd kirin, lê ew hat Stenbolê û li wir jî di Konfederasyona Karkerên Şoreşger (DİSK) de dest bi kar û xebata xwe ya ji bo gelê xwe kir. Gelek caran li ser çepgirên tirk wiha diaxivî: **“Bi Xwedê çep û rastê wan me qebûl nakin. Hema tev weke hev in. Te dîtiye qet çepgirekî tirk ji dil bibêje Kurdistan. Em gere bi hêza xwe bawer bin. Ma Şêx Seîd û Qazî Mihemed ji bo çepgiriye hatin şehîdkirin. Ew ji bo kurd û Kurdistanê çûn bin sêdara îdamê law!...”**

Nemir Baksi li Stenbolê bi rastiyeke din a gelê xwe û pîlanên faşîstan dihesa: Wî dît ku hinek nivîskar û stranbêjên bi eslê xwe kurd bi tirkî dibêjin û dinivîsin û kemalist jî kurdî wek ziman napejirînin û kurdan jî di rêza neteweyan de nahej-

mêrin. Ev karê wan dilê Baksi pir diêşîne û ji bo yekemîn car romana xwe ya bi navê 'Mezra Botan' li Stenbolê dide weşandin. Ev karê wî mîna bombeyekê deng vedide, çimkî siyaseta reş a asîmîlasyonê bi giranî li hemû deverên welat dimeşe û siyasatmedarên pergalê vî karê Baksi ji sedî sed berevajî siyasat û berjewendiyên xwe didîtin. Di romana 'Mezra Botan' de derd û bextreşiyên gelê kurd bi şeweyekî eşkere hatibûn diyarkirin û siyaseta Komarê ya hovane hatibû rexnekirin. Baksi ji bona vî karê xwe careke din jî hat girtin, ew îşkence û tehdîd kirin; lê êdî wî rêya xwe ya xizmetê ji bo mirovayetiye peyda kiribû. Qet jî ji hîlbijartina vê rêya pîroz poşman nebû. Heta mirinê digot: **"Oxweş ku me zû eslê xwe peyda kir, em jî weke hinek sex-tekaran neketin pey pere û jiyana xwe ya şexsî..."**

Di nava çepgiran de mamoste Baksi kesekî weke Mahir Çayan jî ji nêz ve nas dike û li ser pîrsgirêka kurd û Kurdistanê bi Mihri Belli re -yek ji pêşdehatiyên çep-girên Tirkîyeyê ye- gotûbejeke berfireh di rojnameyeke çepgir de dide weşandin. Dîsan ew girtin û bi giranî îşkence kirin. Lê îcar ew bi mirinê jî tehdîd kirin. Heval û dostên wî jê re pêşniyar kirin ku ji Tirkîyeyê derkeve, ji ber ku dibe ku bi rengekî veşarî bê wendakirin. Wê demê gelek kes bi awayekî veşarî dihatin kuştin. Ji rûyê neçariyê, Baksi sala 1970'yî bi perîşanî xwe gihand Almaniyayê û piştî nêzî salekê bi yek carî çû Swêdê, wî her tim li ser wan rojan wiha digot: **"Dema ez gihîştim Almaniyayê pêxwas û birçî bûm. Di piyê min de sol tune bûn. Min tenê canê xwe hildabû û ji destê tirkî reviyabûm welatê xerîbiyê..."**

Lê li jiyana xerîbiyê jî Baksi bê çalakî nesekî û dest bi nivîsandina roman û nivîsên xwe di kovar û rojnameyên kurdî û ewropî de kir. Ji xwe armanca wî jî ew bû, ku li derve bêtir dengê xwe bide bi-hîstin. Dengê wî hingî dengê kurdan ê

fetisandî bû ku dikaribû li xerîbiyê hinekî bi azadî biaxive. Wî bi nivîsên xwe yên li ser pîrsgirêka kurdan li welatê biyaniyê dengê xwe bilindtir kir û bi rêya pênûsa wî ya bihêz biyaniyan hîn bêtir kurd û Kurdistan nas kirin.

Di dirêjahiya 30 salên jiyana li Swêdê de, Baksi gelek pirtûk û romanên bi ce-wherê xwe dewlemend nivîsandin; **wek Hêlîn, Gundikê dono, Bûka vîdeoyê, Teyrê baz, Bi çavê kurdan Yilmaz Guney, Her teyrek bi refê xwe re difire, Meşa Romayê, Evîna Şivan, Lawikê xerzî, Doza Şadî Alqiliç** û bi dehan pirtûkên din jî wan berhemên bi nîrx in ku ji bo dewlemendkirina pirtûkxaneya kurdî xelatên herî baş in.

Baksi di hemû jiyana xwe de pir xebitî, ku rêxistin û partiyên kurdan nêzî hev bike, da ku li hemberî dagirkeran yek bin. Ji bona wê jî, bi hemû serokên kurdan re hevdiştin pêk anîn. Tevan ji nêz ve Baksi nas dikirin û hurmeta wî li cem wan tevan pir zêde bû.

Ew ji doza kurdên perçeyên din jî bêxê-ber nebû. Sala 1978'an çû rojhilatê Kurdistanê û ji nêz ve guhdarî eş û elemên kurdan kir. Ji wira jî çû çiyayên Kurdistanê û demeke dirêj di nava pêşmergeyan de ma.

Baksi gelek serokwezîr û parlementerên Ewropî jî nas dikirin. Ew dostê nêzîk ê **Olof Palme** bû û piştî kuştina wî bi nivîs û roportajên xwe ji raya giştî re da îspatkirin, ku Olof Palme ne bi destê kurdan hatiye kuştin û kurd ne terorîst in.

Mamoste Baksi di tevahiya temenê xwe de xwedî jiyanêke rengîn bû: xweşî û nexweşî, ken û girî, ger, siyasat û kar, nivîsîn û rojnamevanî, îşkence û zîndan tev di jiyana xwe de dîtin û bi her tiştî jî razî bû, lê mixabin tenê tiştê ku herî mereqdarê dîtina wê bû, azadiya welat bû ku nedît. Wî dixwest mizgîniya azadiya axa bav û kalên xwe ji hemû şehîdên

welat re bibe. Sala 1999'an li Hollandayê carekê ji me çend kesan re wiha got: **"Hevalno ez ê bimirim, lê min dixwest dema diçim bin axê ji şehîdên dozê re mizgîniyeke xweş bibim."**

Belê... mixabin û sed hefy, Baksi jî çû û azadiya Mem û Zînê ji destê Beko û Ewanan nedît.

Belê Baksîyê xweşxeber, Mamoste can! Soz be, ku em ê tev rêya evîna te ya tijî dilsozî û bêdawî bidomînin. Ji ber ku evîna te evîna azadî, wekhevî û eşqa mirovayetiye ye. Qet xembar mebe, em ê li ser rêya bin. Oxira te ya xêrê be ey lawikê Xerzan... belê mamoste **Me bi kûraniya evîna re zanibû...**

Çi zor e ku mirov der barê kesayetiyeke nivîskar, siyasetmedar, rojnameger, rewşenbîr, şoreşger de binivîse. Dema ku mirov bixwaze behsa Mahmut Baksi bike, gelo divê mirov li ser wêjevaniya wî an jî li ser siyasetmedariya wî raweste? An jî li ser rewşenbîrî û têkoşeriya wî? Bêguman ji bo ku mirov heqê wî bidê, divê mirov bêyî ku hêleke wî piştguh bike, qala hemû hêlên wî bike... Ji ber ku wî jiyanekê tîr û tije, bi axîn û keser, bi girtin û sirgûn jiya, bêguman xwendevan bêyî ku li dirêjahiya nivîsên der barê wî de binêre, dê bi yekbêhnî nivîsê daqurtîne. Lê... Gelo

kaxiz têra gotinên der barê wî de dikin?

Çi seyr e ku piraniya nivîskarên navdar ku berhemên giranbuha li dû xwe dihêlin xwedî pênaseya "rojnameger" in. Dibe ku sedema vê yekê ew be ku rojnameger di nava gel de ne û dibin şahid ji bûyerên ku di nava gel de diqewimin. Bêguman bi bûyerên ku gel pê şad dibe ew jî pê şad dibin û bûyerên ku gel xemgîn dike ew jî pê xemgîn dibin. Nebe ku sedema ku xemxurê Doza Kurdî Mahmut Baksi jî bo şahidi li êşên gel bike di 23 saliya xwe de bû rojnameger?

Mahmut Baksi piştî rojnamegeriyê, ji bo demekê karê sendikavaniyê jî kiriye. Lê di wê serdema ku dagirkeriya li welat du qat giran bûye de, ne karekî hêsan e rojnamegerî (ya rasteqînî) û sendikavani. Mahmut Baksi yekemîn romana xwe Mezra Botan (ku mixabin niha di refên pirtûkfiroşand e nîn e) nivîsî. Piştî vê romanê gelek pirtûkên din nivîsîn. Di nav pirtûkên Baksi de yên herî navdar bêguman "Hêlin" û "Gundikê Dono" ne ku di çarçoveya klasîkên kurdî de di nav Pirtûkxaneyê Ehmedê Xanî de ji hêla Weşanên Lîsê ve hatin weşandin.


Gelek caran dema ku di civatan de mijar dibe romana kurdî, min ji gelek kesan bihistiye ku yekemîn romana kurdî

Ji Weşanên Lîsê 4 Pirtûkên Nû



Heciyê Cindî
Hewarî

Heciyê Cindî
Roman / Pirtûkxaneyê Ehmedê Xanî
480 rûpel



Heciyê Cindî
Jiyana Kar

Heciyê Cindî
Roman / Pirtûkxaneyê Ehmedê Xanî
360 rûpel



Gava ku Maîl Ti Dînim
Helin Yûz

GAVA KU MAÎL TI DÎNIM
Roman
160 rûpel



Bûnîvîsîya Mîrîna
Saray Çarwan

BÛNÎVÎSÎYA MÎRÎNA
Roman
100 rûpel



Weşanên Lîsê
Kaxizxaneya Weşanên Lîsê
Kaxizxaneya Weşanên Lîsê
Kaxizxaneya Weşanên Lîsê
Kaxizxaneya Weşanên Lîsê
Kaxizxaneya Weşanên Lîsê

Têkoşer, dildar û xebatkarekî azadiyê:

Mahmut Baksi

Amed Çeko Jiyan

ku wan xwendiyê an Hêlîn an jî Gundikê Dono ye. Ji bo min jî heman tişt pêk hatibû. Yekemîn romana kurdî ku min xwend, Hêlîn bû. Piştî ku ez bi pirtûka Celadet Bedirxan û Roger Lescot xwendin û gramera kurdî fêr bûbûm, yekemîn romana kurdî ku ez leqayî wê hatibûm Hêlîn bû. Ji bo kesekî ku hê nû dest bi xwendina kurdî dike -her wiha jî bo kesên ku bi qasî pirtûkxaneyên qerasese tije bike pirtûk xwendine- Hêlîn bi zimanekî hêsan hatiye nivîsandin. Hêsanîya zimanê wê, xwe wekî xurtî an jî dewlemendiyekê radixe erdê. Di nivîsa Mahmut Baksi de bi awayekî berbiçav diyar e ku wî stran û klamên herêma xwe û herêmên din ên Kurdistanê di meji û dilê xwe de digel bîr û boçûnên têkoşer pêşdebir li hev anîne û di nav hev de honandine. Ez gelek caran leqayî "nêçîrvanên peyvên" hatime ku di pirtûkên Mahmut Baksi de ketine nêçîra peyvên resen ku ji vegotina herikbar a çî-rokbêjiya kurdî tî.

Mahmut Baksi di destpêka Hêlînê de bi beşa "Hêlînê"ê çîroka ku dê di romanê de bê vegotin bi zimanê çîrokbêjên rojên berê vedibêje. Beriya ku dest bi romanê bike, dibe ku xwestibe hêla xwe ya di nav kilam û stranên kurdî de dijî radestî pêş çavan bike. Roman der barê jiyana keçeke kurd de hatiye nivîsandin û civaka kurdan a di bin bandora çanda erebî ku "pênc pere" bi jinan nade de maye, di nav rastiya bindestiyê ango di bin siya çekên dagirkeran de, vedibêje. Di romanê de -wekî rastiye- civak bindest e û jin (Hêlîn) bindesta bindestan e. Lê Hêlîn tu caran bindestiyê qebûl nake. Her tim bi lêdan û biçûkxistinê tê "terbiyekirin" lê dîsa jî ew dema ku birayê wê Azad sinet dibe, jî ber ku her kes jî Azad hez dike, jî hesûdiyê,

xwe dadike ser doşekê û dibêje "min jî sinet bikin!" Û lê zêde dike, "Ma ku keç tune bin ew ê kî kuran bîne?" Divêtiya wekheviya mêr û jinan jî -hê di salên 80'yî de- jî civakê re rave dike, "Şûştina cil û firqaqan, pehtina xwarinê, karûbarên malê ew ê tim li min be. Halbûkî ez û birayê xwe jî yek zikî derketin."

Dema ku Hêlînê li dijî serdestiya mêran têkoşînê dide, di navberê de jî şîretên ku divê bav jê sîdê wergirin wekî si-leyan li nav çavên bavên -qaşo-demokrat dikeve. "Li gorî peyvên bavo di navbera keç û kuran de tu ferq tune ye. Her du jî wek hev in. Lê bavo van şîretan tenê li gundiyan dike. Ev tiştên ku bavo dibêje, bavo pê ne bawer e." Ma rewşa civaka me hê jî ne bi vê kambaxiyê ye? Belê hê jî jin "xerîbên mala xwe" ne di nav civakê de.

Tê de tu şik tune ku Mahmut Baksi rewşa kurdan a di salên 80'yî de bi zimanekî wêjeyî jî devê keçeke biçûk bi awayekî serkeftî kiriye roman. Dema ku mirov beşa ku qala serdagirtina leşkeran dixwîne, serdagirtinên mala mirov li ber çavan zindî dibe," Savar, dan, rûn, dims, pîvaz, penîr û tiştên din ketibûn nav hev. Leşkeran bi potînên xwe ew di nav hev de perçiqandibûn. Wek conegayên dîn mala me wêran kiribûn."

Ji bo pesindana romanê -û nivîskariya Mahmut Baksi- gelek tişt dikarin bînin gotin, lê jî bo ku mirov rastiye bê hêlên neyînî jî diyar bike, divê qala kêmasiyan jî bike. Digel ku roman jî devê keçeke biçûk hatiye nivîsandin, car caran tiştên bîra wan nabe tê vegotin. Mahmut Baksi di vê romanê de û di romanên xwe yên din de, bi awayekî serkeftî qala xwezayê dike her



wekî mirov di pacê re li derve binêre. Lê tiştê balkêş ew e ku heta rûpela çilemîn haya me ne ji demê, ne ji demsalê heye. Li gorî min di romana Hêlîn de kêmasiya herî berbiçav ew e ku dereng qala Ferho û Baran dike. Dibe ku ev her du bira piştire lê hatibin zêdekirin. Lê xuya ye ku lê nehatiye.

Dema ku em romana Baksi bidin ber romanên din ên serkeftî -çi bi kurdî çi bi zimanên biyanî- romana Baksi li paş wan dimîne. Lê heke em bi awayekî adil nêzî rewşê bibin, em ê bibin şahidên serkeftî-bûna Baksi. Ji lew re hejmara romanên kurdî ku di dema wî de hatibûn nivîsandin ji tiliyên destekî derbas nedibûn. Li hêla din jî, çalakbûna Baksi di mjara siyaset û têkoşeriyê de hebû ku çalakbûneke wisa gelek caran rê li ber hûrbûna li ser deqên wêjeyî digire.

Digel her tiştî, Mahmut Baksi bi qasî ku lehengekî siyaseta kurdî ye, lehengekî wêje û romana kurdî ye.

Di çarçoveya vê dosyayê de kesên ku binivîsin bê guman wê li ser gelek aliyên Baksi bisekinin û jiyan, berhem û nêzikahiyên wî deynin holê. Heta ku ji destê wan bê wê portreyeke wî deynin berçavan. Ji ber vê yekê ez ê zêde li ser jiyan û nirxandina berhemên wî nesekinim. Ez dixwazim qala axîna wî, hesreta nav dilê wî û hinek helwestên wî bikim. Lewre em dizanin ku ew bi hesreta axa welat çû gorê. Wek gelek sirgûniyan cenazeyê wî li axa bav û kalan vegeriya. Axînen wî yên ji bo 'ax'ê hîna jî li asîmanên welatên biyanî olan didin. Mîna Cegerxwîn, Sebrî Botanî, Hesên Hîşyar û gelekên beriya wan û piştî wan. Mixabin ev rewşa kambax hîna jî didome.

Ji aliyê binyadê ve tu têkilî di navbera peyvên 'ax' û 'axîn'ê de hene yan na ez nizanîm. Dibe ku hebe û dibe ku tune be. Lê ev her du peyv di jiyana me de heta tu bixwazî bi hev ve hatine girêdan. Ji wê jî zêdetir bûne yek. 'Ax'a me 'axîn' e û 'axîn'a me 'ax' e. Li welatê me ev her du leheng hevaltiya xwe qet xera nakin. Bi hev re tîm mîvaniya me. Bi hev re hêlîna xwe di hinavên me de çêdikin. Lê di dawiyê de tenê 'axîn' di destê me de dimîne. Heta niha jî me ji xwe re **hêlînek** çêneki-riye. 'Ax' pê çî dibe ku ve diçe nizanîm. Qet nebe em dizanin ku heta niha nebûye para me û 'axîn'ên kûr bi me dide kişandin.

Mahmut Baksiyê ku min xwendîye û min şopandiye, bi ya min ji van her du peyvên pêk tê. Ji 'ax' û 'axîn'ê. Ji axa xwe dûr ketibû û her tim axîna vê yekê dikişand. Bingeha liv û tevgerên wî jî ev axîn bû. Her tim di nav hewldanekê de ye. Dixwaze bigihîje axa xwe, axa xwe xwedî bike ber û berhemên xwe jê re bike diyarî. Ji ber vê yekê weke hinekan nabêje; ez ê tenê çirokên xwe binivîsim, guh nadim tiştêkî din. An jî ji bo xwe bi hinekan bide qebûlîkirin û reklama xwe bide kirin hezar çiv û qewsan nade xwe. Xwe li ber dilê hinekan nade şîrînkirin û nabe qemçik û dûçika çanda serdestên welatê xwe.

Axx! Axîn û ax û ax


Serwet DENÎZ

Bi gelek karan radibe. Bi xîret e. Ji bo wê axînê ji nav dil û hinavên xwe biqewirîne çi ji destê wî bê dike. Bi van hewldanên xwe bavê romana kurdî Erebe Şemo tîne bîra mirov. Piştî gelek kar û barên siyasî wî ji dest avêtibû karên çandî, hunerî û ziman. Lewre ew ji gelek bi xîret bû. Serkeftina wî ji ber vê xîretkêşiyê bû. Vê xîretkêşiya mînak mirov di romana wî ya bi navê Jiyana Bextewar de wiha dixwîne; *“Adirbêcana, tatara, uzbeki û miletêd mayîn bi saya partiya komunîsta û diwana sovêtê elifbayê latînî seva zimanê xwe çekirine. Mekteb vekirine, zarêd wan bi zimanê xwe dixwînin; gazete û kitêban neşir dikin, çima kul li me ketiye, em jî nikarin wisa çekin!”* Mirov dibêje qey dengê Erebe Şemo di guhên wî de olan daye û Baksi jî gotiye; *“na wele kul li me neketiye û em jî dikarin ji bo zarokên xwe gelek tiştan bikin”*. Û ji ber vê yekê jî bi dehan berhem afirandiye çi lêkolînî û çi jî edebî. Rojnamevanî jî li aliyekî...

Tespîteke wî ya ku teqez divê li ser bê sekinandin û bê vekolandin heye. Di hevpeyvîna ku Gabar Çiyan pê re kiriye de ji bo medreseyan wiha dibêje; *“Ez jî di nav de, gelek ji xortên me yên pêşverû, wê demê di bin bandora çepgiriya tirkî de mabûn û bêtî ku aliyên wan ên erênî bibînin, me peyvên xelet gotin, dilê wan ji me ma. Divê em helwesta xwe ya demê rexne bikin, kêmasiyên xwe bipejirînin.”* Wî tenê ji bo medreseyan gotiye lê ya rast tenê ne medrese ji bo gelek tiştan ev derbasdar e. Tenê wê demê na niha jî helwestên bi vî awayî hene û li ber xwe didin. Nêzikahiyên li hember dengbêjiyê û gelek kevneşopiyên me bi vî awayî bûn. Hişmendiya ku dibistanên tirkî û çepgiriya tirkî dabûn me ev helwest derdixistin holê. Vê hişmendiye hem çanda me dikuşt û hem jî

zimanê me. Lê wek dewletê bi zor û qedexeyan na bi ‘pêşverû’tiyê. Ez nizanim ev çi çepgirî û pêşverûti bû ku kirinên wê û dewletê derdiketin heman deriyî. Ev yek jî axîneke kûr bi mirov dide kişandin lê di çarçoveya vê nivîsê de mirov dikare ev qasî binivîse. Ev mijar divê bi her awayî bê vekolandin û kûrkirin û bibe mijara dosyeyên taybet. Lê bi gotin û nêzikahiyên rojane na. Bi rastî jî bi awayekî zanistî.

Kul û keser, hesret û evînên ku di nav dilê her sirgûniyekî/e kurd de ne di nav dilê wî de bûn jî. Pêknehatina hêviyan an jî derengmayîn û bendewariya vegera axê axîn pê didan kişandin. Ew berê vê axa bû û axa ku ji bo wê axîn dikişand niha malovaniya wî dike. Ez bawer im niha birînên wî hatine kewandin û şûna axînan



axê girtiye.

Baksî [Baksi], Mahmut. Türkiye'de Kürt Sorunu. Turkish, Politic, Sweden, Stockholm, 1971, 49 s.

Baksî [Baksi], Mahmut. Kısaca Kürt Tarihi. Turkish, History, Sweden, Stockholm, 1972, 149 s.

Baksî, Mahmut. Keça Kurd Zozan. Sê film ji bo zarokan (mindalan) kurmançî, soranî, Kurdish, Kurmançî & Soranî, Fîlm û video Kurdistan, Childrens' book, Sweden, Stockholm, 25 + 32 s.

Baksî, Mahmut. Den kurdiska frågan i Turkiet. Swedish, Oktober, Politic, Sweden, Stockholm, 1974, 84 s., ISBN 91-7242-034-0

Baksî, Mahmut. Hörru' du.... Swedish, Translated from english by Elin Clason, Immigrant Institutet, Politic, Sweden, Borås, 1976, 128 s., ISBN 91-7328-063-1

Baksî, Mahmut. Små slavar. Swedish, Författares Bokmaskin, Politic, Sweden, Stockholm, 2, 1976, 128 s., ISBN 91-7328-013-5

Baksî, Mahmut. İsveç İsveç Dedikleri.... Turkish, Sorun Yayınları, Politic, Turkey, İstanbul, 1976, 83 s.

Baksi, Mahmut. Ihsans barn. Invandrarbarn i Sverige, Swedish, Translation by Clason, Elin, Verdandi, Childrens' book, Sweden, Stockholm, 1977, 30 s., ISBN 91-29-49443-5

Baksi, Mahmut. Små Slaver. Norwegian, Translation by Eli Sletten, Förlaget Forum Barn, General, Norway, Oslo, 1977, 84 + 10 s., ISBN 82-90236-01-8

Baksi, Mahmut. Hasan Aga. Swedish, Raben & Sjögren, Short story, Sweden, Malmö, 1979, 131 s., ISBN 91-29537-38-X

Baksi, Mahmut. Keça Kurd Zozan. Kurdish, Kurmançî, Invandrarförlaget, Childrens' book, Sweden, Borås, 1979, 32 s., ISBN 91-85242-28-4

Baksi, Mahmut, Clason, Elin. Zozan. En kurdisk flicka, Swedish, Kurmançî, Verdandi, Childrens' book, Sweden, Borås, 2. upplaga (Första upplaga:), 1979, 32 s., ISBN 91-29-53537-9

Baksi, Mahmut, Clason, Elin. Hana. En syriansk flicka, Swedish, Raben & Sjögren, Childrens' book, Sweden, Stockholm, 1981, 30 s., ISBN 91-29-54765-2

Baksi, Mahmut. Kamışlı katliamı. Turkish, Författares bokmaskin, Document, Sweden, Stockholm, 1981, 104 s., ISBN 91-7328-288-X




Pirtûkên Mahmut Baksi

yên ku di Kitêbxaneyê Kurdî de ne

Kitêbxaneyê Kurdî

- Baksi, Mahmut. Kürdistan Tarihinde Kamışlı Katliamı. Turkish, Förfat-tares Bokmaskin, Document, Sweden, Stockholm, 2, 1981, 102 s., ISBN 91-7328-288-X
- Baksi, Mahmut. İsveç İsveç Dedikleri. Turkish, Invandrarförlaget, Re-portage, Sweden, Borås, 1982, 84 s., ISBN 91-85242-59-4
- Baksi, Mahmut & Clason, Elin. Helin. Swedish, Arbetarkultur, Repor-tage, Sweden, Vernamo, 1983, 128 s., ISBN 91-7014-175-4
- Baksi, Mahmut. Hêlîn. roman, Kurdish, Kurmancî, Invandrarförlaget, Childrens' book, Sweden, Borås, 1984, 118 s., ISBN 91-85242-86-1
- Baksi, Mahmut. Şivan'ın Sevdası. Turkish, Yekitiya Hunermendên Kur-distanê, Biography, Sweden, Stockholm, 1984, 114 s.
- Baksi, Mahmut. Gundikê Dono. Kurdish, Kurmancî, Orfeus, Novel, Swe-den, Stockholm, 1988, 107 s., ISBN 91-87074-06-0
- Baksi, Mahmut. Şivan'ın Sevdası. Turkish, Analiz Yayınları, Biography, Turkey, İstanbul, 2, 1990, 127 s.
- Baksi, Mahmut. Gundikê Dono. Kurdish, Kurmancî, Gökyüzü, Novel, Turkey, İstanbul, 1992, 107 s.
- Baksi, Mahmut. Kürdistan Tarihinde Kamışlı Katliamı (12 Aralık 1980). Turkish, Med Yayınları, Politic, Turkey, İstanbul, 2. upplaga (Första upplaga:), 1993, 94 s.
- Baksi, Mahmut. Kürt Gözüyle Yılmaz Güney. Turkish, Zêl Yayınları, Re-portage, Turkey, İstanbul, 1994, 126 s.
- Baksi, Mahmut. Pojken från Garzan-slätten. Swedish, Natur och Kultur, Childrens' book, Sweden, Stockholm, 1995, 75 s., ISBN 91-27-05593-0
- Baksi, Mahmut. Videobruden. Swedish, Svartvitts förlag, Novel, Sweden, Stockholm, 1995, 135 s., ISBN 91-972204-0-1
- Baksi, Mahmut . Ich war ein Kind in Kurdistan. German, Translation by Missfeldt, Dagmar, Carlsen, Childrens' book, Germany, Hamburg, 1996, 78 s., ISBN 3-551-55265-7
- Baksi, Mahmut. Videogelin. Turkish, Translation by Aymergen, Yasemin, DOZ Basın-yayın Ltd.Şti., Novel, Turkey, İstanbul, 1996, 193 s.
- Baksi, Mahmut & Clason, Elin. Lille Mahmut's syster. Swedish, Natur och kultur, Childrens' book, Sweden, Stockholm, 1997, 23 s., ISBN 91-27-06611-8
- Baksi, Mahmut. Hêlîn. Kurdish, Kurmancî, Weşanên Pêrî, Novel, Tur-key, İstanbul, 1998, 114 s., ISBN 975-8245-14 -7
- Baksi, Mahmut. Ik Was een Kind in Koerdistan. Flamish, Translation by Van Bael, Koen Van, Enstituya Kurdi ya Brukselê, Politic, Belgium, Brussel, 2. upplaga (Första upplaga:), 1998, 78 s.
- Baksi, Mahmut. Dono'nun köyü. Edited by Onal, Ahmet, Turkish, Weşanên Pêrî, Novel, Turkey, İstanbul, 1999, 100 s., ISBN 975-8245-16-3
- Baksi, Mahmut. Her Kuş Kendi Sürüsüyle Uçar. Turkish, Aram Yayın-ları, Politic, Turkey, İstanbul, 1999, 200 s.
- Baksi, Mahmut. Teyrê Baz . Ya da Bir Kürt İşadamı Hüseyin Baybaşın, Edited by Sezgin, Olcay, Turkish, Aram Yayınları, Politic, Turkey, İstanbul, 1999, 296 s.
- Baksi, Mahmut. Lawkê Xerzî. Kurdish, Kurmancî, Translation by



Cewerî-Baksi, Firat-Mahmut, Nûdem, Novel, Sweden, Stocholm, 2000, 106 s., ISBN 91-88592-44-8

Baksi, Mahmut. Roma Yürüyüşü. Turkish, Aram Yayınları, Politic, Turkey, İstanbul, 2000, 176 s.

Baksi, Mahmut. Trial by silence: at war with the state. The Huseyin Baybasin story, English, Translation by Laizer, Sheri, Apec, Sweden, Spånga, 2002, 334 s., ISBN 91-89675-00-2

Baksi, Mahmut. Roma Yürüyüşü. Turkish, Mezopotamya Yayınları, Politic, Sweden, Stockholm, 2003, 135 s., ISBN 3-931885-20-8

Baksi, Mahmut. Minnen i exil. I urval, redigering och svensk bearbetning av Elin Clason, Edited by Clason, Elin, Swedish, Translation by Clason, Elin, Elin C Förlag, Memoary, Sweden, Stockholm, 2006, 296 s., ISBN 91-631-9278-0

Clason, Elin & Baksi, Mahmut. Kurdistan. Om förtryck och befrielsekamp, Swedish, Arbetarkultur, Reportage, Sweden, Stockholm, 1979, 263 s., ISBN 91 7014-10-61

Ma maqûl e?

Ma maqûl e

Mirov bi koreweriyê qayîl be

Kilamekê bavêje ser kewgirînê

Taceguleke axînan raçîne

Yekcar terkehêvî be?

Na, ne maqûl e.

Ma maqûl e

Mirov ji Mirinoyîtiyê hez bike

Kilamekê bavêje ser Bêbaviyê

Virran bi hev re girêde

Çarpînetiyê bincil bike?

Na, ne maqûl e.

Ma maqûl e

Hewîna mirov bê

Gazî Zezeba Kevin bike

Û li ber cihêzê pakrewanekî bikeve

Gava ku Mirin xelatek be

Ku bi hêsanî tê hilgirtin?

Na, ne maqûl e?

Min dest li ba nedikir

Kesî dengê wî mêrikê mirî nekir,

Lê hê li erdê veleziyayî dinale:

We tê dernexist,

ez gelekî bi dûr ketibûm

Û min dest li ba nedikir, dixeniqîm.

Rebeno ji henek û yariyan hez dikir

Lê niha mirî ye

Yeqîn ji wî re gelekî sar e

hat ku dilê wî got bes,

Gotin.

Axx na na na, her tim gelekî sar bû

(Yê mirî hê jî li erdê veleziyayî dinale)



(1937)

Stevie Smith (1902 – 1971)

Amadekar: Kawwa NEMIR

Helbestkar û romanûsa îngilîz Stevie Smith di Rezbera 1902'yan de, li Ingilistanê, li Hullê ji dayik bûye. Navê wê yê ku piştî jidayikbûna wê lê kirine Florence Margaret e, lê di nava malbatê de tim jê re gotine, Peggy. Navê Stevie paşê, piştî cokey Steve Donaghue wê ji xwe re hilbijartîye.

Stevie dema ku sê salî bû, bavê wê Charles Smith di karê xwe yê şîrikatiya hinardekariyê de li ber topavêtinê bû, lewma jî, wî zewaca xwe û zarokatiya Stevieyê da bin lingên xwe, berê xwe da deryayê, bû xezînedarê keştiyekê. Stevieyê, ji ber reva bavê xwe ya ji malbatê, hîç jî bavê xwe hez nekir. Di rewşeke wiha de, xaltika wê, Madge hate ba wan, ji bo ku êdî bi wan re bimîne. Her wiha yek ji wan metên wê, ku ew jî bi bû, hat tevî wan bû, van her sê jinan û du keçên biçûk mal bar kirin Palmers Greena ku wê hingê li perê Londonê bû. Malbata Stevieyê bi rêk û pêkî diçû dêrê, kêfa wê ji lawîj û dua û dirozgehên dînî re dihat. Lê paşê têkiliya wê ya bi dîn re xumamî bû.

Di pênc saliya xwe de, bi nexweşiya jana zirav ket, bo çend salan di senatoryûma nêzîkî Broadstairsê de ma, tîrsa wê ya ji mirinê di heft saliya wê, di wan çaxan de dest pê kir, paşê di gelek helbestên xwe de mirin ji xwe re kire yek ji babetên sereke.

Stevieyê di dibistaneke keçan a herêmî de dest bi xwendinê kir, lê neçû zankoyê; wê bi xwe gotiye, “mamosteyên min ez hêjayî zankoyê nediditim.” Lê tê heye, ku wê bi xwe nedixwest bibe mamoste, ji ber ku wê hingê sereketirîn karê ku jinekê bikaribûya bikira û bikaribûya pê di nava civakê de derbas bikira, mamostetî bû. Stevie şanzdeh salî bû, diya wê ji ber sekteyî dil mir, vê yekê Stevie gelekî êşand. Lê dîsa jî, hebûna xaltika wê, Madgeê, jê re bû dilmînî, Madge heya ku li dinyayê xweş bû, jê re dîtî kir. Madge jîneke ecêb bû, xurt û dilsoz bû, Stevieyê jê re digot, “Şepala Hullê”, an jî “Xaltika Şepal”. Xwendin û nivîsandina Madgeê tune bû, lewma jî, wê ji bo helbestên Stevieyê yên pêşîn gotibû, “qirş û qal”.

Stevieyê piştî berdana dibistanê xwest bibe gerd, lê di şîrikatiyeke weşangeriyê de karê sekreteriyê ji xwe re peyda kir, bû sekretera Sir Neville Pearson. Ev kar ne hêjayî zerengiya wê bû, lê rê dida wê, ku ji bo nivîsandinê dem û delîveyê peyda bike. Romana wê ya pêşîn, *Novel on Yellow Paper* (Romana Li Ser Rûpelên Zer) e. Wê di çaxê bîstsalîya xwe de xwe da xwendinê berfireh, kîsikê xwe bi gelek têbîniyan tijî kir, ku bi maweya hemû jiyana xwe ya nivîskariyê ev hêdî hêdî, bi rêk û pêk bi kar anîn. Di navbera 1919 û 1932'yan de, du têkiliyên wê bi mêran re çêbûn, lê di dawiyê de wê dev ji hizra mêrkirinê berda, bi ya wê, ew ê çu carî nikaribûya bibûya kebanî û dayikeke baş, lew careke din çu carî mêrkirin neanî bîra xwe. Ji ber ku bi xaltika xwe re dima, karekî wê û bi qewlê Virginia Woolfê, “odeyeke wê” hebû.

Tevî ku heya 1934'an bi rêk û pêkî li romanên û helbestan germ bûbû, wê tiştekî xwe nedabû çapkirin. Wê salê, helbestên xwe da weşanxaneyekê, lê şîret lê kirin, ku romanên binivîse, wê jî bi ya wan kir, romana xwe, *Romana Li Ser Rûpelên Zer* da wan, piştî du salan ev roman hate weşandin. Ev roman li ser jiyana Stevieyê bi xwe ye, ku bi rêbaza stream of consciousnessê hatiye nivîsandin. Romanê jî nişkê ve gelekî deng veda, li dora wê civateke fireh î wêjeyî pêk hat. Di 1937'an de, diwana wê ya yekem, *A Good Time Was Had By All* (Xwezî Bi Heyna Berê) hate çapkirin, piştî salekê, romana wê ya duyem, *Over the Frontier* (Ber Bi Tixûb) û diwana wê ya duyem, *Tender only to One* (Bi Tenê Bo Yekî Dilpiyar) hate weşandin û di 1942'yan de jî, helbestine wê yên din bi navê *Mother, What is Man?* (Dayê, Mirov Çi ye?) derçûn. Stevieyê di Şerê Cihanê yê Duyemîn de, li Londonê karê nêrevaniya êrişan kir.

Di 1949'an de, bavê wê yê ku malbat ci bi ci hiştibû, paşê piştî salan careke din zewicibû, mir, Stevie tevî cinyazeyê bavê xwe nebû, wê rojê di BBC'yê de diwançeya wê ya helbestan hebû. Heman salê, romana Stevieyê ya sêyemîn û dawîn, *the Holiday* (Betlane) weşiya. Ji ber ku di romanên xwe de qala jiyana xwe ya xwemalî dikir, pê re jî qala kesên li derdora xwe dikir, bi her romaneke wê re kesên ku bi riya pêlwanên romanên wê xwe nas dikirin (mîna pêlwananê kurteçîrokine Helîm Yûsiv, bi qasî ku hatiye ber guhê me, ev camêr li Başûrê Rojava derketine ser riya Helîm Yûsiv jî) ji wê re serêşî derdixistin. Smithê bi xwe gotiye, ku du pêlwanên

wê yên mêr di rastiya xwe de George Orwell bi xwe ne, ku ew û Orwell gelekî nêzîkî hev bûn. Her wiha, hevaleke wê jî, di jînenîgariya xwe de behsa têkiliya xwe ya lezbiyeniyê ya bi Stevie Smithê re kiriye. Civata lezbiyenana Stevie Smithê ji xwe dihesibînin, lê çespandina vê yekê heya niha pêkan nebûye.

Salên 50'yî ji bo Smithê zehmet bûn; wê hingê dîwaneke wê ya nû bi navê Harold's Leap (Lotika Harold) hate weşandin, lê wê nekarî kovarine ku dîwana wê biçibînin peyda bike, her wiha, ji karê xwe yê sekreteriyê yê di weşanxaneyê de jî dilsar bûbû. Di 1953'yan de, ji ber çî bû hê jî nayê zanîn, wê zendên xwe birrî, xwest ku xwe bikuje. Rakirine nexxweşxaneyekê, paşê jî birine mala hevaleke wê. Ji karê weşanxaneyê bi heftaniya 5 sterlîn û 10 şîlîngan mal-nişîn bû, ji bo ku debara xwe bike, di ber re karine wekî danasîna pirtûkan kir û nivîsine li ser teolojiyê nivîsand. Di 1957'an de, dîwana wê ya navdar, *Not Waving But Drowning* (Min Dest Li Ba Nedikir, Dixeniqîm) hate weşandin. Di 1968'an de, xaltîka wê, Madge, di nod û şeş saliya xwe de mir. (Di 1963'yan de jî, xwişka wê ya mamoste û mênnekirî ji ber sekteyî dil miribû.) Di 1969'an de, dîwaneke wê ya din, *Best Beast* (Baştirîn Cinawir) derçû. Di 1970'yan de, xer-abtîrîn tiştê ku were serê helbestkarekê hate serê wê; Stevieyê êdî mîna Iris Murdochê peyv ji bîr dikirin. Nexweşiya ûra mêmî pê re derket, Stevie Smith di Adara 1971'ê de, li Devonê mir. Meytê wê hate şewitandin. Piştî mirina wê bi salekê, dîwana wê ya bi navê *Scorpion and Other Poems* (Dûvpişk û Helbestên Din) hate weşandin.

Helbestên Stevie Smithê, bi kêliya pêşîn re wekî helbestine hêsan î bi zimanekî hêsan hati-bin hûnandin xuya dikin, lê bi hevoksaziya xwe ya têrzeynet, adan û bi kûranyên xwe ve dorgeyeke helbestî ya gelekî xweser afirandine. Lewma me wiha bi hûrgilî behsa vê canîkê kir!



Ez di jiyana xwe gişî de
pir gelekî dûr bûm
Û min dest li ba nedikir, dixeniqîm.
(1957)

Dûr here, melankolî

Dûr here, melankolî,
Ji wî dûr here, bihêle bila here.

Qey dar ne hêşîn in,
Ji ber ku hêşîn e rûbarê dinyayê?
Qey ba heye,
Agir napeke, çem nakişîn qey?
Dûr here, melankolî.

Gêrik xerikî kar e
Barê wî ji xwe re goşt e,
Hemû tişt dilezînin
Da ku werin xwarin, an jî bixwin,
Dûr here, melankolî.

Mirov jî dilezîne,
Dixwe, fer e dibe zo, binax dibe
Lawirek e ew jî
Melankolî, bi heyloyekê
Dûr here ji wî, berde bila here.

Mirov e zalê
Hemû zindiyan
(Dûr here melankolî)
Ew e bi tenê di nava zindiyan gişan de
Ku kevirekî bilind dike
(Dûr here melankolî)
Bi hundirê kêvir de dirijîne, xweda,
Tiştê ku dizane der barê pakiyê de
Wekî pak bi nav dike Xwedê.
Dûr here, melankolî, bihêle bila here.

Behsa hêsiyan meke ji min re,
Behsa zordestiyê, frengiyê, şeran meke
Bi gotina, Qey Xwedayê
Ku kevîrê ramana mirov e
dikare bibe pak?

Çêtir e bibêjî bes e
Kevîrê mirov ê pakiyê, ku mezin dibe,
Yê tepisandî bi Xwedayê mirov ê bi nav û nişan.
Dûr here, melankolî, berde bila here.

Armanca mirov
pakî ye,
hezkirin e
Axîne dikişîne:
Zorbîrî be, bê esl û fesil be, miribe,
Di nava xwîna xwe de veketibe
Dîsa jî çavek heye zoq li jorê
Digirî, hezkirin, hezkirin,
Ew bêhn-pakiya wî ye şirovekirin divê,
Ne ketina wî.

Dûr here, melankolî,
Ji wî dûr here, bihêle bila here.

Exeat¹

Şahînsahê Romayê² tê bîra min, yekî ji wanên
herî dilhişk,
Ku diçû serdana girtiyên xwe yên belengaz î di
binê zindanan de,
Vêca paşê girtî ji bo mirinê li ber wî digeriyan, wî
jî digot:
Naxêr na, em hê bi tîra xwe nebûne hevalên hev.
Mebesta wî jê ew bû, hê bi tîra ku ew mirinê
bide wan nebûbûn heval.
Wiha, dema ku dil bikim bimirim, divê Besta
min bibêje:
Naxêr na, em hê bi tîra xwe nebûne hevalên hev

Û Dîlpakî jî bibêje:
Em hê bi tîra xwe nebûne hevalên hev.

Dema ku hê ji bi sererastî li Besta xwe guhdarî
neke,
Helbestkarek çawa dikare xwe bikuje,

An jî dema ku wê yekê her dem gîroyî sibehrojê bike,
Evîndarekî Dîlpakiyê çawa dikare xwe bikuje?

Dîsa jî reng e demek bê, dema ku helbestkarekî, an jî kesekî
Jiyaneke dirêj, xweşî û jan li dû xwe hiştibe,
Lê êdî bûbe pepûk û cila şil, ketibe stûyê welatê xwe
Û hew bikaribe biryarekê bigire,
Reng e Jiyana bimirê bi hezkirin bê ba wî, bibêje:
Bi ya min em êdî bi têra xwe heval in, ku ez mirinê bidime te;
Paşê ew dikare xwe bikuje, paşê
Dikare derkeve here.

(1966)

1-Bi Latîni, Bila derkeve here.

2-Heye ku Caligula be.

Ponijanên der heqê Kesê ji Porlockê de

Coleridge Kes ji Porlockê wergirt
Û piştî wê yekê nîfir li wî kir
Baş e, ê çima lezelez rê da wî bikeve hundir?
Tê hebû dikaribû xwe di malê de veşarta.

A rast ne rast bû kiryara Coleridge, şaş bû
(Lê em giş gelek caran dîkin şaşîyan)
Wekî rastî jî ew e, bi ya min, jî mêj ve bû
Ketibû kêferata Kûbîlay Xan.

Digiriya, dilûband, reda min hat, digot,
Ez ê çu carî nikaribim peyveke din lê zêde bikim,
Lê Kesê ji Porlockê derkeve bê
Û sûcê wê yekê bike stûyê min?!

Ne rast bû, şaş bû,
Lê em giş gelek caran şaşîyan dîkin.

*

Gelo em li navê Kesê ji Porlockê bipirsîn?
Çima Porson, we nizanibû qey?
Mala wî li biniya Girê Porlockê bû,
Lewma jî, riya wî dûr bû.

Tevî ku dapîra wî Pîrebokek bû,
Yek ji ruthlandshireiyên li ber dilê min ezîz
Û çu tîkiliya wê bi Porlockê re tune bû,
Lê ew bi xwe ne gula cimaetan bû ew qas.

Lê, çawa ku min got, mala wî li biniya girekî bû
Û pisikekî wî hebû bi navê xwe Flo
Û pisikekî wî hebû bi navê xwe Flo.

*

Kurmên Kesê ji Porlockê tene min
Ji bo ku dawiyê li ponijanên xwe binim
Min sebr û semax nema, divê wî bibinîm,
Wî heval dihesibînim.

Tê me diçim di pencereyê re li derve dinihêrim

Têm diçim direvime ber dêrî
Ji min we ye, Ew ê vê êvarê bê
Ji min we ye, lap bi derengiyê ket.

Wer birçî bûme gotina min bê birîn
Heta hetayê, heta hetayê bila wisa bibe
Lo Kesê ji Porlockê, bi lez were,
Were dawiyê li ponijanên min bîne.

*

Pîroz dikim kesên ku Kesekî wan ê ji Porlockê hebe
Her tiştî li bin guhê erdê bixim û bavêjim
Ji ber ku jê pê de çu tiştê hêjayî hîlanînê nemîne,
Pêwîst nake bimîn.

*

Axx ew Kesê ji Porlockê gotinbirekî mezin e
Gotinên me heta hetayê dibire
Xelk dibêje, ew peyayekî çepel e
Lê bi rastî jî hêjayî viyanê ye.

Bo çî ew qas gilî û gazinan jê bikin?
Ew wekî pîroziyekê derdikeve tê
Divê şa bibin wî ew jî bîr nekirine
Tê hebû dikaribûn bidomandana.

*

Ev ponijan canzerî ne, pê dizanim. Can zer dikin.
Xwezî bibûma şengezeriyeke temam, xweştir e ev yek
Her wiha peywîr e, me divê bikenin bi qasî ku em radestî
Mebesta Yê Li Jorê dibin, ku diceribîne

Bi celeb bi celeb têkiliyên rewîştî mirovî, kîjan herî baş lê bê
Giş ji wî re serinckêş e, çiyê coş û peroşê, lê ne ji me re.
Wa dîsa diçim. Bikene bikene û karekî bibîne
Esas tu yê wê hingê ji ser xwe herî, bêtî ku bi rastî jî çûbî.

Ray (I)

Îsa ji bo Xwedê mir û ez
Li ser darexaçê
Ji Xwedê re, Kelameke kelimandî
Ji min re, Şûrek
Ji Xwedê re, lawijeke şukrê
Ji min re, rojên bêdawî
Ji Xwedê re, eşkerekirinek
Ji min re, rizgarî.

Ray (II)

Min li Seyrangeha Hêkesorkê kir ger û geryan,
Min bihîst ewtîniya kûçikê har, dihat ji dûr ve,
Min nas kir, Xwedayê min hişyar bûbû cardin, -
Kûçikê har, kûçikê har, tu bêçine diewtî.

Ray (III)

Sî ew qas reş bû,
Min got qey pisîkek e,
Lê gava ku bi navê de çûm,

Min pê derxist
Ne reştir bû
Ji piştî siyekê.

Sawîr sosretiya
Bîra mirov e;
Pisîk ê lê bigere.

Ray (IV)

Hez dikim li hev bim bi mirovan re bê qeza û bela,
Hez dikim di hembêzên wan de razê,
Hez dikim bêm girtin, bi hêdî bêm ramûsandin,
Dûr ji hemû tirs û sawan.

Hez dikim bikenim û bextewar bim
Bi ramûsaneke bedew,
Bo we bibêjim, li darê dinyayê
Nîn e çu bextewariyeke mezin wekî vê.

(Werger û Amadekirin ji Îngilîzî: Kawa Nemir)

Sibe.....

Arjen Arî

bi guvîn diwere ba, pel bi zerirîn diweşin
berê demê ketiye welatê payîzê.
payîz, her payîz koçberiyekê dixê bîra te.

her ku tîreke qulingan dibînî li perê ezman

û refeke qazan, ber bi germiyanan de qefleke ordekan...
heman dilin dinûqute dilê te:
nêz e weke eskerê romê dê bigire bi ser me de zivistan!

keserek rûdine di hinavên te de pê re, pê re
çeng bi çeng dipinge ava l' herik li pişt bendavan.
û tu goma kulan vedihewînî newala dilê xwe.

ji dev derdibin kul, lê dil sivik dibe bi her gotinê
tu yê bibêjî bibêje, sivik bike barê xwe
û dilê xwe hênik hênik, derbik bi her gotinê...

- tu yê vebêjî eseh ji hinekan re çîroka xwe ya hatinê. kengî be; niha, kêlî-
kek din an jî sibe... her hatin çîrokek e, her çûyîn çîrokek... di tevna
zeman de her temen çîrokek e l' ber qedandinê... nehêle sibe, sibe tune
be: di îro de veşartî be ya çû, rabirdû û niha... û sibe ? -

û sibe...
bi navê sibe ku rojek tune be?

01/10/08

Bilbil divê gulê

Selahattîn ÇAM

Ey!bilbilê şeyda û dîwane
Tu dixwazî bigihîjî gulê
Gula sor, gula spî, gula zer
Gula xweşik, gula bedew, gula şewab
Gul jîn e
Gul jiyan e
Gul eşq û evîn e
Gul can e
Gul canan e
Gul mal û xan e
Gul yar û war e

Ey bilbilol! Qey tu nizanî
Gul bi eş e
Gul bi jan e
Gul bi eza ye
Gul bi keser e
Gul bi kovan e
Gul bi stirî ye

Gul bi dirî ye
Gul bi derd û kul e
Bi hesreta gulê bûn
Mela, Feqî û Xanî!
Evîndarê gulê bûn
Celadet û Cegerxwîn

Bilbilê dîn û har!
Ma tu nizanî
Gul divê kedê
Gul divê canfêdê
Gul divê can û mal
Gul divê kar û xebatê
Li ser gulê hat kuştinê
Leheng û mêrxas

Bilbilê dîwane
Qey tu nizanî
Hezkirina gulê, kirasê ji ar e
Bo gihîştina gulê
Gere tu jîr û qehreman bî
Ma qey te nebihîst
Bo xatirê gulê, bi hezaran man bê xwedî kum

Mêrsîn
18 Tebax 2008

Nizanim çima

Îlhamî Ozer

bi tilî û destan
ji guhanên raman û hestan
çirok û helbestan
didoşim
ku
bergîdana kenekî şêrîn de
bifiroşim
zarokekî bavpakrewan

lê belê di wê şerê bê çek de
bijangê min dibin tîr
çavê min kevan
nizanim çima

bi neynûk û diranan
ax û keviran

dikim av û nan
ku diyarî bikim

sêwiyên
di binê pir û dîwaran de
ji çavên maran
hêsiran dibarînin

lê belê di vê têkîliya dijwar de
çavê min dibin du bîr
hesirê min qîm û qîr
nizanim çima

bi tevr û bêran
li bajar û deweran
ezperestiya mêran dikolim
ku jinên mirî bibihîzin

lê belê di wê lêgerîna nûjen de
hêsirên min dibin belavok
çavê min sûk û kolan
nizanim çima

12 gulan 2000

Kêmbêr

Gulîzer

Terzî bû

Dêya min
Wê ruhê min bifesilanda
Wê qîzeke qîzane bidrûta ji civatê re
Carek
Ne mexsûs
Bi xeletî
Ruhê min da ber meqesan
Ji wê rojê ve
Dil bidim kîjan jiyanê
Kêm derdikeve ruhê min
Kêmbere
Ji vî parçeyî kirasek dernayê
ji jiyanekê re
Bi ruhekî pînekirî digirim ez jî

Dibistana herî bilind
Her malbat e bizanin em
Mamoste ên herî zanyar
Bê şik ew in daykên delal

Rengên şalûl û bilbilan
Her dixwînin li malbatan
Hîndar dikin zarê şerîn
Li Kurdistan daykên delal

Ji hesret rondikên çavan
Li ser dêmên sor û spî
Bo wan diflên xwe ên şerîn
Dibarinin daykên delal

Wan rondikên herî navdar
Bo min biba bade carek
Binûşandan bo rewşa wan
Mamostetîya daykên delal

Dayik her xwedî rûmet in
Bi navdarî li dirokan
Payebilind li Kurdistan
Bê şik ew in daykên delal

Bi zarên xwe lebşeker in

Dayikên delal

Sîpan Xizan

Her mamoste û rêber in
Zanyar bo wan pesindar in
Bi şanazî daykên delal

Zanyariya wan nayê pîvan
Mamostetî li malbatan
Reng-kulilkên biharê ne
Li Kurdistan daykên delal

Bo wan hindik pesindar î
Mamostetî bi navdar î
Lew ji lêvan qend dibarî
Şêrîn-kelam daykên delal

Xwendekar bam li nik we ez
Hindar bikira we min bi lez
Mamostetîya leşkerî
Herî hûn in daykên delal

Pesindar im ji bo we re
Pîrozbayî ji bo we re
Kurdistana xweş û şêrîn
Mamoste ne daykên delal

Mamostetîya we nûjen e
Her bi wezn û bi wêjen e
Bi zanyarî berpirsiyarên
Malbatê ne daykên delal

Sonda'm bi Dersim Botanê
Rengîn xaka Kurdistanê

Amed Cizîr û Sîpanê
Mamostetîya daykên delal

15.10.2008

Hebû; roviyek, gurek û ker û hirçek. Rovî dibêje;

- Werin em bibin xwişk û bira.

Gur dibêje;

Bila be em bibin xwişk û bira.

Weke ku rovî dibêje, dibin xwişk û bira.

Rojekê, rovî dibêje;

- Birakê gur; pêşiya me zivistan e ka em ji xwe re qeliyê çêbikin.

Gur dibêje;

Bila be birakê rovî. Bila pêşiya keriyê pez li min be. Ez ê herim pêşiya wan û çar, pênc heban bixeniqînim.

Kerê jî got;

Barkirina wan jî li min. Ez ê bar bikim bînim malê.

Hirçê jî got;

Çêkirina qeliyê jî li min.

Rovî jî got;

Veşartina qeliyê jî li min.

Bi hev re qeliya xwe çêkirin û çend roj derbas dibin, rovî diqilqile. Nebî dilê rovî diçe qeliyê. Dibêje ka ez ê çawa bikim. Hema ji nişka ve

Dibêje;

Ha, haaaa!

Gur dibê;

Çi bû birakê rovî?

Çîroka gur û roví

Berhevkar: Zozan BUDAK

Xwişka min a mezin zarok jê re çêbûye,
dibê were nav lê deyne.

Tev bi hev re dibêjin;

Here birakê roví.

Rovî ber bi qeliyê ve diçe û devê kûpê qeliyê
vedike û hinekî jê dixwe û tê.

Gur dibêje;

Te çi nav lê kir birakê roví?

Min navê wî Vekirok danî.

Sê, çar rojên din derbas dibin dîsa dilê roví
diçe qeliyê û ji nişka ve dibêje;

- Ha, haaaa!

Gur dibêje;

Îcar çi bû?

Ooo! de qe ne bi xêr be! Îcar jî ji xwişka min
a navîn re zarok çêbûye. Gazî

dike dibêje were tu nav deyne .

Here birakê roví.

Rovî bi lez û bez diçe. Devê qeliyê vedike û
bi nîvî dike û tê.

Gur dibêje;

Îcar te çi nav lê kir?

Min nav danî Nîvok.

Dîsa çend roj derbas dibin dilê roví diçe
qeliyê û bi dengê bilind dibêje;

Ha, haaa!

Dîsa çi bû birakê roví?

- Qet nepirsin, îcar jî ji xwişka min a biçûk
re zarok çêbûye. Dibêje were nav deyne.

Gur dibêje; de hema here deyne çi bûye.

- Rovî diçe ser qeliyê, dixwe û paqij dike,
diqedîne û tê malê.

Gur dibêje te îcar çi nav lê kir?

Rovî dibêje; min nav danî Alistok.

Çend roj şûnde gur dibêje;

Birakê roví ka em êdî dest bi xwarina
qeliya xwe bikin. Wele dilê me diçe qeliyê.

- Bila be birakê gur.

Tev bi hev re bi ser qeliyê de diçin û devê
qeliyê vedikin. Xwedê qeliyê bide! Kûpê vala,
qeliya çi, halê çil! Tev bi hev dikevin. Ew dibêje
te xwariye, ew dibêje te xwariye. Gur dibêje;

Wiha nabe. Em ê îro tev li ber tavê razên,
kê qelî xwaribe wê qûna wî don bigire. Rovî
xwediyê xwarina qeliyê ye. Dizane wê qûna wî
don bigire. Hema çaxê razana li ber tavê bi
dizî qûna xwe bi tevekiya dihesikîne û radibe
ser xwe û dibêje;

Ca binêrin we tevan xwariye qûna we don
girtiye, a min paqij e.

Dîsa li hev nakin dibêjin;

Bi vî awayî nabe.

Rovî dibêje;

Ka em herin ziyaretê heye. Tev qebûl
dikin û diçin. Rovî beriya ku wê herin
ziyaretê, diçe ba kûçikê û dibêje;

- Tenê tîrsa min ji gur heye. Ez ê potekî bi
ser te werbikim û ez ê pêşiyê ji gur re bêjim
gere sê caran tu sond bixwî. Gava cara
sisêyan ku sond xwar, hema tu yê devê xwe
bavêjî her du çavên wî û tu yê wî kor bikî.

Wek ku roví dibê tev de diçin ser ziyaretê.

Rovî dibêje;

Ka sond bixwe birakê gur!

Gur diçe ber bi ziyaretê ve û carekê, du
caran sond dixwe û cara sisêyan kûçik xwe
davêje her du çavên wî û gur kor dike. Gur
dibêje;

De îcar tu sond bixwe roví!

Rovî devê xwe beş dike û dibêje;

- Çi ziyaretêke bi rûmet e, wele roví sond
naxwe, roví bavê kulfet e...

Mehme Eliyê Bedlîsî di sala 1945'an
de li bajarê Bedlîsê li navçeya Hîzanê li
gundê Arûsê ji diya xwe bûye. Dibistan
nexwendiyê. Bi eslê xwe ji Navçeya Cizîrê
ne. Ji eşîra Milan in. Bi qasî 150 sal berê
ji Cizîrê hatine navçeya Hîzanê gundê
Arûsê. Kurdê kurmanç in. Bi kurmançî
dipeyivin. Stranên ku dibêje ji diya xwe
hîn bûye, ji birê xwe û ji xalê xwe hîn
bûye. Ji deh dozdeh saliya xwe ve stranan
dibêje. Heta 17 saliya xwe li gund maye.
Li gund karê rênçberiyê kiriye. Şivantî
kiriye. Di sala 1970'î de mala xwe dibin
bajarê Amedê. Li bajarê Amedê dikana
kapekfiroşiyê vedikin. Di avahiyan de
karê hesin dike. Li Amedê malnişîn dibe.
Niha jî li Amedê dijî. Di sala 1974 'an de
li bajarê Amedê dizewice. Hevala wî ji
Hîzanê ye. Sê keçên wî hene.


GUNDÊ ARÛSÊ

Gundê Arûsê li ser bajarê Bedlîsî,
navçeya Hîzanê ye. Pazdeh malbat di

Dengbêjek û stranek

Mehme Eliyê Bedlîsî^(*)

Berhevkar: Hîlmî AKYOL



gund de hebûn. Niha pir bûne. Gund 90 km dûrî Hîzanê ye. gund di navbera Miks û Hîzanê de ye. Dan û standina gundiyan bi Hîzanê re ye. Gundê çiya ye. Gundî çar bav in. Tev kurmanc in. Bi kurmancî dipeyivin. Erdê gund 6, 7 hezar elb e. Erdê herî pir 200, 250 elb di destê gundiyan de ye. Erdê herî hindik 100, 120 elb erd di destê gundiyan de ye. Gundî cotkariyê dikin. Pez û dewaran xwedî dikin. Riya gund sêlak û xîçik e. Keyatiya gund li gund e. Ava gund hebûye. Mizgefta gund hebûye. Elektrîk û dibistan tune bûne.

Li rojhilatê gund, gundê Talerzê heye.

Li rojavayê gund, Nizarê Azê heye.

Li bakurê gund, Zozanê Ava Berxan heye.

Li başûrê gund, Gundê Êhsan Begê heye

GULÊ MARÛMÊ^(**)

Lêlê gulê marûmê malxirabê mi go îro ji kula dilê min û te ra bihar e,
Lêlê gulê marûmê malxirabê wez ê bala xwe didimê çîqa xelqê gund û cînara le hemî ketine kar û barî vî biharê
Le wez û sêwî evdalê Xwedê le tinê mame li ber bejna bilind çav û biryê belekdanê pîr û kal bîm,
Le min ê tişteki ji hal û wextê xwe nizanî haylê gulê haylê gulê le haylê gulê

Lêlê gulê marûmê malxirabê wez ê bala xwe didimê ji kula dilê min û te ra îro bihar e,

Le pelekê ewr û asîmana li ser kambaxa gundê me da peyda bî haylê haylê haylê
Le wez ê bala xwe didimê wî beleka ewr û asîmana ne bi diherikî, ne gurikî,
Hê Xwedê dizane baranekî li me barî, baranekî pir bi hûr e,
le çîqa kuçik û kevirê vî welatî li ber xwe tanî,

Le Xwedê dizane vê sibekê, kula mi sêwî evdalê Xwedê ne tu kul e,
Kula mi sêwî evdalê xwedê ne kuştina mêra ye, ne girtina mêran e,
De tu bala xwe bidê bîka ser bi xêlî dest bi hene le li binê berîka jêrî di mala bavê da maye

gulê

Haylê gulê haylê gulê le haylê gulê, le sebra ber dilê,

Lêlê gulê marûmê malxirabê wez ê bala xwe didimê îro payîz e,
Ji talih û bextê min û te ra le malê me bar kirin danîne li çiyakê bilind, li zozana li binê belekê di berfê ne,

Le qîza kurmalê nedê, bavê le hingî malê li zozanê xwarê te deyn nekir,
Xwedê dizane le îro payîz e malê me dageryane zozanê jêrî,
De bala xwe bidê ji kula dilê min û te ra berf û baranê li me lê kir,
Le çîqa dar û bera pelê xwe weşandin, ji kula dilê mi sêwî evdalê Xwedê darikê mazi mane rût û tazî,

Ay le gulê le îro te yê digota ji kula dilê mi sêwî evdalê Xwedê ra fayde nekir,
Haylê gulê tu sebra ber vî dilî.

Têbinî _____:

(**)Ev stran a dengbêj M. Eliyê Bedlîsî ye

(*)Ev hevdiîtin rû bi rû bi dengbêj re hatiye çekirin û ev agahî ji devê dengbêj hatiye nivisandin. 22 05 2008